lêkolîn

ROHAT ALAKOM

Folklor û jinên kurd

NEFEL

www.nefel.com
info@nefel.com

Folklor û jinên kurd

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Folklor û jinên kurd

ROHAT ALAKOM

NEFEL
Stockholm
2002

www.nefel.com
info@nefel.com

Rohat Alakom: Folklor û jinên kurd

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Rohat Alakom û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-973195-5-4

Çapa kevin: Nûdem

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

Nêverok

Pêşgotin **7**

— BEŞ I —

Çîrokbêjiya kurdî û xelasiya jinan **13**

Welatê hat û nehatê 13

Keçên padişahan 14

Çembera dora jinan teng dibe 16

Motîva »keça aqil« 17

Komên jinên xirab 19

Jinên destgiran 25

Çend çîrokên jiyana rastî 25

Jinên wekî rawiran 27

Jinên çîrokî 31

Tekoşîna jinan 33

Serkanî 36

— BEŞ II —

Di gotinên pêşiyan de zihniyetên jinparêz **43**

Jin kaniya jiyînê ye 43

Jin wekî avakara malê 44

Cihê dayikan tijî nabe 45

Wekheviya jin û mêran 46

Motîva jina baş û jina xirab 48

Salên keçîniyê 49

Şerê bûk û xwesûyê 51

Neçariya jinebiyan 52

Protestoke dijî pirjiniyê 53

Jin û namûs 54

Serkanî 57

— BEŞ III —

Di destanên kurdî de serdestîke jinan 67
Di destanên kurdî de struktura bingehî – dijayetiya sêserî 67
Dijminên du dilan û çar çavan 72
Çend keçperî û pîrejin 73
Jin di rêke rast de dimeşin 74
Ji bo mêran danîna çend merc û hoyan 77
Çima mêr dikevin rola şivanan 78
Sînorên namûs û bênamûsiyê 79
Nefreta kontra-mîlîter 82
Welatê şahiyê 85
Serkanî 88

— BEŞ IV —

Di stranên kurdî de navçeke erotîk: memik 95
Peyveke erotîk: memik 95
Pêşkêşkirina memikan 97
Barîkatên edebî û memik 101
Fonksiyonên memikan yên din 102
Motîva »mêrên ji heqê memikan dernakevin« 107
Formên memikan 109
Gihiştina memikan û serhildana wan 114
Guhastina formê memikan 117
Dizên memikan û micizeya vebûna bişkokan 117
Cenga li ser memikan 121
Çend motîfên dînî û memik 122
Peydabûna temaya »jinên memikfiroş« 124
Serkanî 127

Bîbliyografiyaya folklora kurdî 131

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Kesê orta du dila û çar çavan xeber dide;
bila xêrê-wayê qet nebîne!
nifireke kurdî

Pêşgotin

Rengînî û dewlemendiya folklora kurdî ji zû da bala rohilatnas, kurdnas, folklorîstan û gelek kesên mayî kişandiye ser xwe. Mirov nikare folklorê tenê wek çend berhemên hinerî bihesibîne. Folklor serboriya civatekê ya dîrokî, civakî û hinerî ye. Folklor pêşketina zimanê wê civatê nîşan dide. Ev yek hemû di nav folklorê de gihiştine hev, di nav hev de hatine honandin, di dawiyê de defîneke çandî pêk anîne û bûne serkaniyên xurt. Akademîsyen û pisporê folklorê yê ermenî A. T. Ganalanyan vê dewlemendî û rengîniya folklora kurdî wek »ansîklopediya civata kurd ya jîyînê« bi nav dike. Ji ber vê yekê mirov nikare peyva folklor û jîyînê ji hev bide cida kirin. Mirov dikare bibêje ko folklor bi xwe jîyîn e, lê belê jîyîneke ko hiner û edebiyat ji xwe re kiriye pêlekan. Ew jîyîna rojane ko em di nav de ne, dem-dem rûsar e, carcar bîna mirovan teng dike, rijî, bêtam û bêlezet e, bi saya folklorê jixwe ev jîyan xweşiktir û bedewtir bûye. Ev sînorên jîyîn, folklor û bedewiyê bi alîkariya imkanên hinerî çawa em dibînîn her diçin tenik, zirav, barîk dibin, ji nû ve tên honandin û ristin.

Folklor wek neynika civatekê ye. Mirov dikare bi saya vê neynikê, civatekê baştir nas bike û bi hêsanî dikare xwe bigihîne kûraya sedsalan. Ji aliyê din, folklor him ji bo ziman, him jî, ji bo edebiyateke nûjen, bingeh û defîneke mezin e. Lê mixabin di nav kurdan de ev defîne, heta niha veşartî û sergirtî maye. Mimkin e ko rojekê ji rojan ev defîna giranbiha û hêja ji holê rabe, winda bibe û di ro de here. Hêz û hin dorberên polîtîk yên zordest jî li Tirkiyê xwe vê yekê dixwazin û hewl didin ko hemû hebûnên çanda kurdî ji nav rakin, bihelînin. Li

Kurdistana Tirkiyê ji ber rewşa siyasî, ji ber zordestî, qedexekirin û tunebûna imkanan, nimûneyên folklora kurdî him ne hatine berev kirin, him jî li ser van berheman kar, xebat û lêkolînên zanistî nehatine pêk anîn. Ji ber van dijwariyan folkora kurdî îro baş nayê nasîn. Ronakbîr, nivîskar û folklorîstên kurd divê li pêşiya vê sefera wêrankirinê, kambaxkirin û xizankirinê bisekinin. Çi dibe bira bibe, pêwist e ew her nimûneyeke folklora kurdî derbasî ser kaxiz bikin. Ev kar dîsa dikeve li ser milên kurdan.

Folklor, carina wek *edebiyata devkî*, carina jî wek bi *zargotin* jî tê bi nav kirin. Folklor mirov dikare bibêje ko edebiyateke kollektîf e, xelkê bi xwe ev edebiyata afirandiye. Nivîskarên vê edebiyatê tune ne. Ev edebiyata bi salan li ser zar û ziman maye, xwe parastiye, xwe nû kiriye, dewlemend kiriye û bûye malê xelkê kurd. Folklora kurdî, çawa em dibînin ji van hemû qonaxan re derbas bûye, hatiye gihiştiye van rojên îro û beşeke çanda mirovahiyê pêk aniye.

Ev lêkolîna me, tenê li ser beşeke folklora kurdî hatiye pêk anîn. Mirov dikare bibêje ko xebateke bi sînorkirî ye, tenê di nav folklora kurdî de cihê jinan û motîvên ser tema jinan nîşan pêşkêş dike. Vê lêkolînê hemû nimûneyên folklora kurdî, ji xwe re nekiriye materiyal, nedaye li ber çavan. Tenê me nimûneyên xwe, ji nav çîrok, gotinên pêşiya, destan û stran wek ji nav çar beşên bingehî hilbijartiye.

Giringiya vê xebata piçûk ew e ko li ser folklora kurdî lêkolîneke bi zimanê kurdî tê çêkirin. Ji aliyê din, xebat bi xwe jî li ser babet û tema jinan e, bi vî tehrî mirov dikare bibêje du rûçikên vê pirtûkê hene: *folklor* û *jin*. Ev herdu babet di vê pirtûkê de ketine zikê hev, hev dewlemend kirine. Xwendevan ji alîkî de dikare nasiya xwe bide folklora kurdî, nimûneyên vê folklorê tam bike, ji aliyê din bi saya hin berhemên folklorîk derbarê cihê jinan û rewşa jinan de dikare zêdetir agahdar bibe û zaniyariyên xwe pêş da bibe. Ji aliyê din dema ev pirtûk hate berçav kirin, xwendevanê bibîne ko, jinan di nav folklora kurdî de ji xwe re textek ava kirine û serdestîke (hakimiyet) wan heye. Bi kurtî mirov dikare bibêje ko gotin »gotina jina« ye. Ev lêkolîna, ji aliyê din dikare bibe cesaret û referanseke piçûk ji bo lêkolînên mayî.

Di dawiya vê pirtûkê de lîsteke ko ji xebatên li ser folklora kurdî pêkhatî jî cih girtiye. Xwendevan û kesên ko dixwazin zêdetir li ser folklora kurdî agahdar bin, ev bîblîyografya piçek be jî dikare ji wan re bibe alîkar, kêrî wan bê. Her çiqas vê lîstê hemû materiyalên (wek

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

pirtûk) li ser folklora kurdî nehilçandiye jî, lê belê em dikarin bêjin ko navên piraniya pirtûkên ko heta niha li ser folklora kurdî çap bûne, di vê bîblîyografiyê de cih girtine.

Wek her xebateke nû, sedî sed kêmasiyên vê lêkolîna me jî hene, babetên ko ji ber çavên me reviyane hene. Eger xwendevanên me yên ezîz, li ser van kêmasî û valahiyan me agahdar bikin, bêguman em ê gelekê kêfxweş û dilşa bibin. Çawa tê zanîn nivîskar û xwendevan gelekê hewcedarî hev in. Bê hev nikarin bijîn.

Stockholm, 1993

Rohat Alakom

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

— BEŞ I —

Çîrokbêjiya kurdî û xelasiya jinan

Di nav folklora kurdî ya devkî de dewlemendîke here mezin bêguman çîrok in. Çîrok beşeke folklorê ye, nivîskarên wan ne kivş in, gel bi xwe ev berhem afirandine. Carcar di weşanên perîyodîk de, peyva çîrok li şûna serpêhatiyan (kurteçîrok) jî tê bi kar anîn, lê belê ev yeka ne rast e. Ji ber ko nivîskarên serpêhatiyan kivş in. Serpêhatî berhemên nûjen in, bi tehr û naveroka xwe ve ji çîrokan gelekê cida dibin. Ev yeka di warê navkirinê de tevlihevîke mezin di zimanê kurdî de peyda dike. Carcar van herdu berheman re jî *çîrok* tê gotin. Pêwist e ev pirsa terminolojiyê bê çareser kirin û divê her tişt di cihê xwe de rûnê.

Her çiqas heta niha çend berevokên çîrokên kurdî hatine weşandin jî, mirov îro nikare bibêje ko piraniya çîrokên kurdî îro derbasî ser kaxizê bûne. Bedewiya çîrokên kurdî çawa em dibînin bala gelek rohilatnas û kurdnasan kişandiye ser xwe û ji van çîrokan beşek bi zimanê biyanî der çûne, hatine wergerandin.[1] Dema mirov bi çavekî zanistî, rexnevanî û lêkolînî li çîrokên kurdî mêze dike û babetên wan analîz dike, mirov wê çaxê dibîne ko, ev berhem, efrandinên gelî, wek destanên kurdî, gotinên pêşiya û stran ji me re dewlemendîke jîyîna folklorîk pêşkêş dikin. Ev berhem li me şîretan dikin, rê nîşanî me didin û me di nav fantaziyên rengîn de dihêlin. Fantazî, xewn, xewnerojên sedsalan di nav van çîrokan de her çûne dewlemend bûne. Beşek ji wan bi rastiyên jîyînê ve gihiştine hev, ji aliyê mirovan de têgihiştina jîyînê zêdetir hêsantir kirine. Di vî warî de çîrokên kurdî gelekê hînkar û şîretkar in. Di van çîrokan de li dijî bêgavî, neçarî, tunebûn û xizaniyê, çawa em dibînin imkan û mecalên nedîtî, nebîhistî ji aliyê mêrxasên çîrokî de tên afirandin. Di nav van berheman de ew şerê pakî û nepakiyê, qencî û xirabiyê, xweşî û nexweşiyê her diçe tûj dibe. Her çiqas dilsar û rûsar be jî, dawiya beşek van çîrokan carcar bi mirin û kuştinê diqedin. Ew şer û dew, teqereq, serpêhatî, bûyer û qew-

mandinên mezin yên ko di çîrokên kurdî de tên pêşkêş kirin, ji alîkî de jî wek neynikekê, janên civatê, serêşiyên civatê û rewşa civatê nîşan didin. Pêwendî û hevgirêdanên mirovî radixin ber çavan. Di çîrokên kurdî de gelek erf û edet, rêvaçûn, karekter, nêrîn û dîtinên ser jîyînê hene. Civatê bi rêke hinerî, artîstîk, bi alîkariya zimanê çîrokan daxwazî û hêviyên xwe yên sedsale ji nû ve ji civatê re pêşkêş kiriye. Civatê bi dirêjahiya salan, bi hezaran çîrok afirandiye, angorî sal û zemanan hewcedariyên me yên hinerî bi cih aniye, di vî warî de em têr kirine. Hinera çîrokbêjiya kurdî di jîyîna rastî de nîn be jî, qet nebe ji me re cihaneke çîrokî wek xelat û mîrate hiştiye, pêşkêş kiriye.

Dema em naveroka çîrokbêjiya kurdî raçav dikin, em dibînin ko gelek babet û motîvên ji hev cida di nav van berheman de hene. Dewlemendiya motîvan nîşanî me dide ko civat ji her aliyî ve bûye babeta çîrokan. Mirov nikare peyvên çîrok û civatê ji hev cida bike.

Di nav çîrokên kurdî de motîveke zêdetir hatiye bi kar anîn, bêguman rewşa jinan e. Di nav van berheman de babeta jinan motîveke here rengîn e, bi taybetî xelasiya jinan. Ev çîrokên kurdî, ji salên kevnare vir de derbarê rewşa jinan, cihê wan, berpirsiyarî û erkên wan de me gelekî ronî dikin. Çîrokbêjiya kurdî di vî warî de serkanîke gelekê bi kêrhatî ye. Ji bo lêkolîn û xebatên ko li ser jinên kurd tên kirin, ev çîrok wek sermayeke mezin di vî warî de dikarin bên hesibîn.

Dema em naveroka van çîrokan bi kûrahî hûr-hûr dikolînin, em di dibînin ko civata kurdî, timê rûmet û cihekî mezin daye jinan. Jinan di pêwendiyên jin û mêran de, di warê mêrkirin û zewacê de timê roleke mezin lîstine. Ji aliyê din civatê hemû jin nexistiye tayekî teraziyê, jinên baş û jinên nebaş angorî normên wan sal û zemanan ji hev cida kirine. Bi nêrîn û çavên mayî li van herdu komên jinan mêze kiriye. Jinên baş rûspî kiriye, jinên nebaş rûreş û rûtenî kiriye. Civatê pîvanên başî û nebaşiyê, angorî xêra civatê, malbatê, angorî xêra zarokan û angorî xêra xelasî, azadiya jinan kivş kiriye. Jinên baş, çawa em di dawiya çîrokan de dibînin, xêr û xweşî li ser wan de dibare, ew ji ber destê zordestan xelas dibin û difilitin. Pirsa xelasiya jinan di nav çîrokên kurdî de babeteke here berbiçav e. Di dawiya her çîrokekê de ew bi dilketiyên xwe ve dibin yek, diçin digihêjin mirazê xwe û bi hev şa dibin. Jinên nebaş jî, di dawiya çîrokê de gelek caran cezayên xwe dibînin û tên kuştin. Di vê babetê de her çîrokeke kurdî mirov dikare bibêje heqî û adaletê belav dike.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Welatê hat û nehatê

Dema em avahî û hevsaziya çîrokên kurdî mêze dikin, gelek caran mêr dema dixwazin bizewicin, ji xwe re keçekê bînin, ew xwe davêjin nav agirên mezin. Ji bo jinan canê xwe didin, tirs û xofê davêjin alîkî. Dema mirov li ser vê yekê hûr û kûr difikire, mirov dibîne ko civatê jin ji ser her tiştî re girtine. Angorî dilketiyê mêrîn, tu dibêjî ji jinê şirîntir tu tiştekî şirîn li rûbarê dinê tune ye, timê dibeze... Bi saya van berheman mirov fêr dibe ko civatê qîmetekî çawa mezin daye jinê. Ji bo ko xwe bighînin dilketiyên xwe an jî »hisnil cemal« û »hisnil delal« ên xwe, ew diçine seferên dûr û dirêj. Ew berê xwe didin oxirê û dinê, pişta xwe didin felekê, terkeserî, terkeselatî dinê dibin, çol û çolistan, berî û beristan... Bi dinyayê dikevin. Ev beza, di dawiya her çîrokekê de dibe xelasiya jineke dîlgirtî, perîşan û neheqîke mezin lêbûyî. Di çîrokên kurdî de ev keçên şeng û şepal bi îfadeyên gelekê hêja ve tên pesinandin. Ev »hisnil cemal« û »hisnil delal« bi taybetî keçên gelekê ciwan û bedew in, wek horiyan in... Dema çavên mirovan li wan dikeve, heft rojan nan û av nayê bîra mirovan, ne bike, ne bixwe, ne bide ne bistîne, bedewiya wan mêze bike. Ji royê re dibêjin dernekeve, emê derên, bil dilekî na, hezar dilî mirov dibe evîndarê wan. Ew car-car wek hîvên çardeşevî ne, wek lempan dişuxilin... Angorî çîrokên kurdî, mêrên bengîn ji bo van canikan, zeriyan dikevine riya *welatê hat û nehatê, welatê çûn û nehatê.* Menzila ko van kesan dane pêş xwe, bi tengasî, dijwarî û bi derd û kulan ve tijî ye, vegera wan ewqas ne hêsa ye. Ji bo vê yekê jî navê vî welatî, danîne »welatê hat û nehatê«. Ew kesan diçin derdikevine welatê dêwan, cinan, canpolatan, telûkeyên mezin li pêşberî wan hene. Mirov gavên xwe bi pîvan û bi fesal nevêje, mirov dikare bibe kevir jî... Gelekê caran ev rê, wek riya mirinê tê hesibîn. Gelek kes diçin derdikevine li paş çiyayê Qaf, diçin welatê Çîn û Maçînê, li gelek welatên çîrokî digerin. Ew diçin li dinyayê digerin, ji vê rêwîtiyê re dibêjin »seyranga dinê« û »dewra dinê«. Ew rûbarê dinê serobino dikin. Di vê rêwîtiya dûr û dirêj de, ew carina rastî »destebirakan« tên, aqil û cesaret didine hev, diçin, dighêjine menzila xwe. Di destpêkê de mirov dikare bibêje ko ew kerên şeytîn siyar dibin. Dê û bavên wan jî gelek caran naxwazin lawên wan derkevin, herin ji bo »porserekê« terkeserî dinê bin. Dema em dawiya çîrokan dinêrin, qet jî wisan dernakeve. Her çiqas ew gelek

çetnayan, dijwariyan dibînin jî, di dawiya çîrokan de, ew wek bûk û zava, bi serfirazî cot vedigerin malên xwe û bi mirazê xwe şa dibin.

Ew mêrên ko diçin vê sefera zewacê, çawa em ji çîrokan fam dikin gelek felaket û bela tên serê wan. Ew gelek cefayên giran dibînin. Hin caran mecbûr dibin dikevin gelek dilqan û hin »kincên« cida xwe dikin. Ev beşa teqereqê, di çîrokan de beşa here bingehî dikare bê hesibîn. Lê belê ew ji heqê hemû van dijwariyan derdikevin, dibin xweşmêr û cengawerên bi nav û deng. Ew nayên kuştin. Wek misal di çîroka *Herzemê Qolan* de, Herzemê Qolan, diçe him xuşka xwe, him jî hersê birayên xwe rizgar dike, tîne. Ji aliyê din zora gelek hêzên mayî jî dibe, agir li ber çavên wî dipeke, di dawiyê de ji xwe re *Xuşka Dinyayê* tîne.[2] Mêrxasê yekemîn timê pêşengiya birayan, destebirakan dike. Lê mixabin, di dawiya çend çîrokan de ji tirsan, ji çavnebariyê û ji ber çend sedemên mayî, bêbextîk tê serê mêrxasê çîrokê yê yekemîn. Metoda here nas, wî davêjine bîrekê. Lê belê ew rêkê dibîne, difilite û heyfa xwe ji wan kesên bêbext distîne.[3] Kesên wî xelas dikin, çawa em dibînin bi taybetî koçên bazirganan in.

Keçên padişahan

Di nav van kesên ko terkeserî dinê dibin de ji bo keçekê ji xwe re bibînin, bi wê re bizewicin, gelek kesên şivan, gavan, kesên belengaz û xizan hene. Piraniya wan hewl didin, bi keça padişah û paşan re bizewicin. Ji ber van bêgavî û neçariyan, di nav çîrokên kurdî de çîrokên ko li ser padişah, paşan û hakiman cihekî fireh digrin. Çima padişah, paşa û hakim? Bi van keçên bavdewlemend re zewac, wek rêke xelasiyê hatiye dîtin, ew dixwazin ji wê belengaziya ko ew di nav de ne, zû xelas bibin û rojekê bibin zavê kesên dewlemend, pişta xwe xurt bikin. Her çiqas ev karekî dijwar û çetin be jî, dîsa jî ew diçin an jî kesên mayî dişînin xwazgîniyê keçên padişahan. Ji aliyê din motîva belengaz û padişah wek dijayetîkê di çîrokê de kelecanî û meraqeke mezin peyda dike. Ew diçin doza mirovatiyê li padişah dikin. Çawa em di çîrokên kurdî de dibînin, di wan salên kevn de, kesekî ko biçûya xwazgînî, berê diçû li ber qonaxa padişah li cihekî taybetî rûdinişt, ji vî cihî re digotin »kursiyê xwazgînî«. Di çend çîrokên mayî de jî, jê re »textê xwazgînî« û »kevirê *xwazgînî*« hatiye gotin. Ev kursî zêrkirî bûye. Ev kursiyê zêrkirî tenê bona kesên tên xwazgînî, hatiye saz kirin.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Kursîkî zîvkirî jî heye, ev kursî jî tenê bona daxwaziyên mayî hatiye çêkirin. Zengilek jî li ber vî kursîyî hebûye, bi alîkariya vî zengilî padişah agahdar dibû wekî xwazgîniyê keça wî hatine.

Dema kesekî belengaz here li padişah doza mirovatiyê bike, padişah çend mercên (qewl, hoy, şert) nedîtî, nebîhîstî û ecêb pêşberî van kesan datîne, çawa dibêjin »ne min dîtiye, ne jî tu bibîse!«, ewqas mercên giran bûne. Ev mercan di wan salan de li şuna qelend hatiye hesibîn. Bicihanîn, pêkanîn û qedandina van mercan, karên mirovan nîne, wek misal di çîrokekê de kesê çûye xwazgînî pêwist e tone genim û çehê tevlihevkirî ji hev derîne, ji ber vê neçariyê, ew diçe li bal kurê padişahê mûriyan, ji wî alîkariyê hêvî dike.[4] Eger ev kes daxwaziyên padişah neqedînin, angorî çîrokan, padişah serê wan jê dike. Ji ber van karên giran, kesên diçin xwazgîniyê keçên padişah, xwe davêjine li ber bextê hêzên mayî, wek pîran, dêw, hût, keça padişah, hacetên tilsimî, wek şiva qudretê... Dema daxwaziyên padişah bi cih tên, padişah êdî pêwist e keça xwe bide wî kesî.

Di van çîrokan de tiştekî balkêş jî, li hemberî van serhişkî û mercên padişah, keçên ko timê qencî û xweşiyê dixwazin, ew di riya bavê xwe de nameşin, gelek caran jî diwazin alîkariya wan kesên ko hatine xwazgînî, bikin. Ev keçan, bi vî tehrî wan mercên ko bavên wan pêş da danîne, jê re çarekê dibînin, hêsantir dikin. Di dawiya çîrokan de çawa em dibînin, ew dighêjin bext û mirazên xwe. Ev keçên padişah bi zanîn û bi çavekî mayî li dorberê xwe, li bûyeran û li dinê dinêrin. Ew gelek caran ya xwe dikin.

Ev dijayetiya padişah û keça padişah nav û deng e. Wek keça padişah, wisan jî çawa em di çend çîrokên kurdî de dibînin, kurê padişah yê piçûk timê di rêke qenc de dimeşe, mêrxas e, fedakar, rastgo û camêr e. Di çend çîrokên kurdî de wek gelek caran tê dubare kirin, bi taybetî sê kurê padişah hene, navê yê piçûk gelek caran Mîrze Memûd an jî Mîrze Mihemed e. Ji ber ko ew timê di rêke rast de dimeşin, bi qencî, bi mêrxasiya xwe ve tên nasîn, peyva »mîrze« jî, wisan tê bawer kirin ko ji aliyê civatê de bi zanetî li ser navên wan kesan de hatiye zêdekirin. Di nav çîrokên kurdî de gelek çîrokên ko li ser Mîrze Memûd û Mîrze Mihemed hatine gotin, hene. Ev herdu kes wek du mêrxasên çîrokî yên here navdar tên bi nas kirin, ew xelaskarên jinên bindest in.

Mîrze Memûd di gelek çîrokan de terkeserî dinê dibe, diçe dikeve

nav gelek şer û dewên mezin, ji xwe re keçeke bedew peyda dike, tîne. Ji ber ko mêrxas, camêr e, gelek keçik timê li ser wî bengî dimînin. Dema ew bi keçeke mayî re mecbûr bimîne, razê, ew şûrê xwe datîne navbera xwe û wê. Ev yeka jî, helalî, paqijî û dilovaniya Mîrze Memûd nîşan dide, ev şûr dibe nîşana helaliyê.

Çembera dora jinan teng dibe

Ji der keç û kurê padişah, vê carê padişah bi xwe jî dixwaze bizewice. Carcar, çav ber dide jinên xelkê, dixwaze bi jinên mayî re serê xwe bike yek. Her çiqas ew padişah be jî, çawa em di çend çîrokan de dibînin, karê peydakirina yarekê ewqas hêsa nîne. Gelek caran ew ji wezîrê xwe alîkariyê dibîne, wezîr dişîne li bal jinan. Di dawiya van çîrokan de çawa em dibînin, ji ber famdarî, hiş û dûrdîtiniya jinan, ev padişah bi hêsanî nagihêjin daxwazên xwe, lingê xwe dikin soleke teng û destê xwe dikin qûla mar. Di çîroka bi navê *Jin û Padşa* de, dilê padişahekî dikeve jineke mêrkirî. Mêrê jinikê leşkeriya xwe dike. Padişah dixwaze bi dek û dolav, bi fend û fêlan ve him jinê, him jî mêrê wê bixapîne. Lê dema mêze dike ko jinik nayê rayê, naxwaze bi wî re razê, di dawiyê de him jinikê, him jî mêrê wê dikuje.[5] Ew helaliya ko di navbera jin û mêr de heye, dibe kakilê naveroka gelek çîrokan. Di çîroka *Jina Wezîr Ya Aqil* de padişah nagihêje daxwaza xwe. Dema padişah mêze dike, wezîr ne mal e, diçe mala wî, hin giliyan ber jinikê re davêje, jinik nêta wî fam dike û çend hêkan bi rengên cida boyax dike, datîne pêş padişah. Paşê ji padişah dipirse wekî tama kîjan hêkê zêde ye, dema padişah dibêje tama hemûyan wek hev e, wê çaxê jinik nêta padişah dide rûyê wî, dibêje jin jî hemû wek hev in, bi sergirtî dibêje ko, dest ji min berde, jin wek van hêkan hemû yek in.[6] Ji ber vê bersîva jinikê, êdî ji destê padişah tiştek nayê, padişah bi poşmanî paş da vedigere û diçe qonaxa xwe. Di hemû van çîrokên vî tehrî de jî çawa tê xuyan, mal û milk, dewlemendî, pere û pûl ewqas ne giring in, pêwendiyên mirovî, helalî, rastî û pakî timê di van çîrokan de serdikevin.

Gelek çîrokên kurdî jî, li ser melayan hatine gotin. Di van çîrokan de pêwendiyên melan û jinan cihekî fireh digrin. Gelek ji van çîrokan kurt in û wek pêkenokan hatine gotin. Civatê bi melan qirf û tinaz kirine, bi alîkariya van çîrokan ew rexne kirine, berpirsiyariya wan aniye bîra wan. Çawa tê zanîn di civata kurdî de, ji ber olê islamiyê ci-

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

vatê timê baweriya xwe bi melan anîne, cih û rûmeteke mezin dane wan. Melan jî, ev baweriya xelkê gelek caran bedkar kirine. Di çîroka *Gulê û Çûko* de, li ser kaniyê jina mele timê dikeve dora pêş, jina gavîn ji vê yekê aciz dibe, gazinan li mêrê xwe dike, jinik dixwaze mêrê wê jî bibe mele. Gavan kincên melan xwe dike, terkeserî dinê dibe, bûyerên mezin tên serê wî. Ew diçe Serhedê navê wî gelekî belav dibe, gavan dibe melakî navdar, jina wî jî dibe jinseyda.[7] Çawa em di çend çîrokan de dibînin, çavên melan timê li jinên kesên mayî in, çavê wan timê li der in. Gelek caran xwe vedişêrin, bi vî tehrî dixwazin nêzîkî jinan bin. Di çîroka *Terzî* de çawa em dibînin ko, ew, jina terzîkî ji rê derdixe, bi wê re dikeve kêfê.[8] Her çiqas naxwazin jinên wan herin nav koma mêran, lê belê ew bi xwe timê dixwazin bi jinên mayî re bimînin. Dema daxwazên wan neyên cih, çawa em di çîrokên *Keçelok û qîzika Amûtam* de jî dibînin, ew dikarin şeran jî bavêjin jinan, navên wan xirab bikin.[9] Di çend çîrokan de jî, mela zanînên xwe yên olî bi kar tînin, bi alîkariya duayan dixwazin jinan ji rê derxin, di dawiyê de dibin babetên pêkenokan, dema melek qala horiyan dike, pîrejinek jî derbarê »horiyên nêr« de ji mele agahdariyan hêvî dike.[10] Tema meleyên jinbaz di nav çîrokên kurdî de temake gelek belavbûyî û navdar e.

Mêrên hesûd gelek caran dibin sedemê malwêraniyê û tûjbûna pêwendiyên jin û mêran. Mêrên hesûd timê wek naxwaşîkê şikê dibine jinên xwe. Babetên çend çîrokên kurdî li ser bingehên hesûdiyê ava bûne, hesûdî bûye babeta pêkenokan, çîrokan. Mêr di van çîrokan de tên rexne kirin. Jinên şîrhelal û dilpak timê di van çîrokan de rûspî derdikevin. Di çîroka ko *Meriv Bixwaze* de serpêhatiya mirovekî hesûd heye. Ew timê jina xwe pêkol dike, ew diçe kîderê, mêr dide pey, ew heta avdêstxanê jî dide pey jina xwe.[11] Di çîroka *Çavreş Lingan Diweşîne* de, dema kesek dibe mêvanê malê, bawîşkên wî tên, mêrê jinikê vê yekê wek nîşana pêwendiyên jina xwe û mêvanê malê dihesibîne, şikê dibe bawîşkên mêvan. Jina xwe bi kêranê hewşê ve dadiliqîne. Lê belê, paşê dema ew dinêre bawîşkên mêvan berdewam in, armanc ne jin e, ew ji kirinên xwe poşman dibe.[12]

Motîva »keça aqil«

Di nav beşek çîrokên kurdî de em rastî jinên zane, fêmdar, xebathez, qenc, helal û rastgo tên. Ew timê di van çîrokan de tên pesinandin, di

gelek rojên teng û dijwar de dibin alîkarên mêrên xwe, riyên qenciyê û xêrê datînin li ber mêran. Mêrên tiral, bêkêr û yên ko timê di mal de rûdinên û kar nakin, çawa em dibînin ji aliyê jinên xwe de tên rexne kirin. Ev mêrên tiral carcar dibin babetên pêkenokan. Di dawiyê de jinên van kesên tiral, mêrên xwe davêjin ber dêrî, ew terkeserî dinê dibin, diçin tevî nav bûyer, teqereq û gelek qewmandinan dibin. Di çîroka *Eloyê Newêrek* de, mêrekî wisan tirsonek heye, timê li mal e, newêre derkeve derva. Rojekê jina wî mêze dike, êdî ev yeka awa nameşe, lîstikekê tîne serê wî. Jinik diçe derva katan li ber dêrî radixe û dibêje Elo hela rabe kate barîne. Dema Elo radibe, diçe dêrî vedike, li katan mêze dike, jina wî, tîne wî nişkêva def dide, dêrî digre û carke din venake. Paşê Elo neçar dimîne, diçe derdikeve welatên dûr, dibe dostê dêwan, dewlemend dibe, vedigere tê mala xwe.[13] Çîrokeke ko nêzîkî babeta vê çîrokê ye, çîroka *Silêmanê Newêrek* e.[14] Di çîroka *Mêrê Şevê* de jî, mêrekî awa şil û şêt heye. Jina wî rojekê dibêjê, rabe şer derketiye, tu çima di mal de rûniştîyî, pêlî damara wî ya mêraniyê dike. Mêr mecbûr dimîne radibe şûr û mertalê xwe hildide diçe nava gund, lê belê çi şer, çi hal! Paşê dema mêrik vedigere tê mala xwe jinik dêrî lê venake, dibêje mêrê min çûye şer, xwe li nezaniyê datîne. Bi kurtî çîrok paşê wek pêkenokekê berdewam dike.[15] Wek van çîrokan, di çend çîrokên mayî de jî, angorî mêran, em rastî aktîfbûna jinan tên. Mêrên ko dibin bayisê malwêraniyê û kambaxiya malê, timê tên rexne kirin, jin jî wek stûna malê tên pesinandin.

Motîfa »Keça aqil« di çîrokên kurdî de, motîveke bingehî e. Gelek caran bi famdarî, bi zanîn, bi serwextbûna xwe ve, keç û jin zora mêran dibin. Di çîroka *Bav û kur* de, ji hêrsê kuran yek heramza (pîç) e. Dema kur diçine bal melakî wekî hîn bin, ji wan kîjan heramza ye, mela nikare jê derxe, keça wî tê hawariyê, piştî çend pirsiyaran kurê heramza tê kivş kirin.[16] Di çîroka *Qîza serwext* de, serpêhatiya keçeke zane û famdar heye. Piştî gelek çetnayan ew dibe padişah, teyrê dewletê tê serê wê rûdinê.[17] Teyrê dewletê, bêguman ji ber serwextiya vê keçikê tê serê wê rûdinê, wek xelatekê mirov dikare bihesibîne. Bi gotineke mayî bi vê motîva teyrê dewletê, civat vê keçikê pîroz dike. Di çîroka *Bûka aqil* de, vê carê bûkek tîne yek û yek gazî bîst kesan dike, sêvekê dixe cêbên wan, her yekî re jî dibêje »ez te hez dikim«. Piştî ev hemû bîst kes diçin ji vê bûkê re paletiyê dikin, ew dibêje »de bixebitin, ez heyrana xorté sêv cêbê de«. Ji ber ko sêv cêba herkesî de

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

hebûye, hemû bi xîreteke mezin ve kar dikin, kar zûtirê diqedînin.[18] Di çîrokeke mayî de, padişahek dixwaze kurê xwe bizewicîne, dilê kur dikeve keça gundiyekî. Cara pêşîn, malbata padişah naxwaze bibin xinamiyê mala keçên gundiyan. Lê belê, padişah dema serwextiya keçikê dibîne, wê çaxê êdî bêgav dimîne, biryarê xwe diguhirîne.[19]

Komên jinên xirab

Di nav hin çîrokên kurdî de em rastî jinên wisan tên ko bi xirabiya xwe ve hatine nasîn, wek damarî, xwesû, hewî, jintî, dayîkên bêbav û dilbikevir... Ji van jinan gelek di dawiya çîrokan de cezayê xwe dibînin û tên kuştin.

Di nav hin çîrokên kurdî de motîveke here naskirî û mezin jî motîva damariyan e. Di van çîrokan de, rewşa wan zarokên ko diyên wan dimrin, dikevin ber destê damariyan, her diçin ber bi nepakî û xirabiyê diçe. Dilhişkiya damariyan tu sînoran nas nake. Gelek caran dikevin bin mêrên xwe, zarokan û bavên wan berî hev didin, zarokan li ber çavên bavan reş dikin. Carcar bav di bin bandûr û gotinên van jinan de jî dimînin, wê çaxê êdî ji van zarokan re tu starek namîne. Ew timê lêdan, kutan, kotekan dibînin, tî û birçî dimînin, bi tirs û xofeke mezin ve dijîn. Di dawiya van çîrokan de, damarî ji aliyê civatê de, tên gunekar kirin û cezayên mezin dibînin. Di çîroka *Tûdî Quşî* de, damarîke wisan dilkevir ji aliyê zarokan de tê kuştin û cezayê xwe dibîne. Angorî çîrokê du zarokên kesekî gelek dewlemend hebûne. Bavê wan rojekê lêdixe diçe hecê. Ew, herdu zarokên xwe li ber destê vê jina xwe ya duwemîn dihêle. Ev jin, dema mêrê wê diçe hecê, ji xwe re dostekî nû dibîne, bi wî re rojên xwe derbas dike. Ev dostê wê dixwaze wekî jinik van zarokan bikuje, serê wan jê bike. Lê belê cariyeke vê malê hebûye. Ew, zarokan ji vê yekê agahdar dike, zarok jî serê xwe hildidin diçin cihekî dûr. Piştî ko mêrê jinikê ji hecê vedigere, qala kurên xwe dike, jinik dibêje ko zarok mirine. Çend sal derbas dibin, rojekê ev zarok dixwazin wek mêvanî herin serîkî bidin mala bavê xwe, hela ka rewşa wan çawa ye. Ew ji bavê xwe re behsa çîrokekê dikin, babeta çîrokê hema serpêhatiya wan bi xwe ye. Wê çaxê bav fam dike ko ev kesan zarokên wî bi xwe ne, her tişt êdî zelal dibe. Damariyê dikujin, wê cariyê jî didine bavê xwe. Di gelek çîrokên kurdî de, piştî xirabîkê gelek sal derbas dibin, ew mêrxasên ko ji malekê ne û bi salan

ji hev dûr ketine, di nav çîrokê de besa çîrokekê dikin (çîroka jîyîna xwe) dikin, ev çîroka serboriya wan bi xwe ye. Piştî vê »çîroka nav çîrokê« her tişt derdikeve holê, bi vî tehrî imkana zanîn û hînbûna kesên xirab peyda dibe.[20] Ev »çîroka nav çîrokê« di çend çîrokên mayî de jî wek stîlekê, xemlekê tê bi kar anîn, ji bo zelalbûna mesaja çîrokê imkaneke mezin peyda dike. Di çîroka *Elik û Fatik* de jî dîsa êş û jana damariyan tê pêşkêş kirin. Ev çîroka, çîrokeke gelek naskirî û hezkirî ye. Li gelek deverên Kurdistanê belav bûye. Elik û Fatik navên bira û xuşkekê ne. Piştî ko diya wan dimire, ew dibin sêwî, stoxar li ber dîwara dimînin. Dema diya wan dimire, bav ji nû ve dizewice, ji xwe re jinekê tîne. Ev jinbav keseke nebaş bûye, timê bi çavekî xirab li van zarokan mêze kiriye. Rojekê damariya van zarokan, wan dişîne çolê wekî ji wê re kerengan berev bikin, bînin. Binê tûrikê wan jî qûl bûye, çi kerengên berev dikin, ji vê qûlika tûrikên wan de tê xarê, nikarin tu kerengan bidin hev. Ew gelek diwestin, tî û birçî û bêxew dimînin, riya xwe şaş dikin û gelek tiştên nebaş tên serê wan, di dawiya çîrokê de ji wan her yek ji xwe re dizewice, dighêje mirazê xwe.[21] Çîroka bi navê *Pepûk* ji aliyê naveroka xwe de gelekî nêzîkî çîroka *Elik û Fatik* e. Dema ew diçin ji damariya xwe re kerengan berev bikin, çawa me li jor jî got ji ber ko tûrikê wan qûlik bûye, imkana berevkirina kerengan tune bûye, zarok jî nizanin wekî damariya wan bi zanetî tûrikekî qûl daye wan. Vê carê xuşk şikê dibe birayê xwe, ew hew dizane, hema birayê wê hemû kerengên berevkirî dixwe, carekê xelas dike, nizane ko tûrik qûl e. Ji ber vê yekê jî, ew dikevine qirika hev, bi hevra şer dikin. Angorî çîrokê, rojekê xuşka lawik tîne zikê birayê xwe diqelişîne, dixwaze mêze bike ko hela ka kereng hene an na. Di dawiyê de dibîne ko, tu kereng di zikê birayê wê de tune ne, vê carê gelek li berxwe dikeve, duayan li Xwedê dike wekî wê bike pepûk. Xwedê daxwaza keçikê tîne cih, wê dike pepûkekê.[22] Gelek şax û guhartokên serpêhatiya van xuşk û bira hene, beşa dawîn ya her şaxekê jî, angorî her çîrokbêj û deverê ji hev cida dibe. Li ser babeta damariyan çîrokeke here balkêş jî çîroka bi navê *Sûrîeyar* e. Angorî vê çîrokê, sê keçên mirovekî hebûne, piştî çend salan diya wan dimire. Berî ko diya wan bimire, ew ji mêrê xwe hêvî dike û dibêje mêrê xwe, dibeje dema ez mirim, te jineke teze anî, nehêle ew jin bi destê xwe ve zarokên min bixe, destekî min jê bike. Dema wê xwast zarokan bixe, bira bi vî destê min ve lêxe. Jina wî dimire. Jina teze, ango damarî dibêje mêrê xwe,

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

divê tu van zarokan bibî serê çiyakî bikujî. Mêrê wê her çiqas vê yekê naxwaze, rojekê mecbûr dimîne, wan dibe serê çiyakî dihêle, tê jina xwe dixapîne, dibêje min zarok kuştin. Bi vî tehrî, ev hersê zarok ji ber destê damariyê difilitin. Piştî çend salan ji wan keçan yek bi kurê paşakî re dizewice, xuşkên xwe li bal xwe cîwar dike, bavê xwe jî, efû dike, paşê hemû di nav xweşiyê de dijîn.[23]

Çawa tê xuyan bêbaviya damariyan di nav çîrokên kurdî de, wisan jî di nav berhemên mayî de motîveke nav û deng e, wek misal gelek gotinên pêşiya hene ko li ser damariyan û zordestiyên wan yên li dijî zarokan hene.

Ji der jana damariyan, motîveke »jina xirab« ya mayî jî jana xwesûyan e. Xasî jî wek damariyan gelek caran bi dilhişkî, bêwijdanê û bi neheqiya xwe ve hatine nasîn. Di çîroka *Bûka Gulsûn* de, xasîke wisan bêiman û bêbav heye. Rojekê lawikek dizewice, ji xwe re keçekê tîne. Diya lawik jî, bi wan re tevayî di malê de dimîne. Dema kurik diçe li ser karê xwe, ev bûka teze û xwesûya xwe tenê dimînin. Xasî gelek caran xwarinê nade bûka xwe, wê birçî dihêle, bi wê re pev diçe, rewşa bûkê her diçe xirab dibe. Bûkeke bêdeng, şermoke û newêrek bûye, zar û zimanê wê tune bûye, keseke gelek reben bûye. Di dawiyê de ji hal dikeve, ken ji bîr dike. Mêrê wê paşê jê derdixe ko diya wî li jina wî hatiye xezebê, jê re nepak e. Mêrik biryarê xwe digre wekî careke din bizewice, diçe digere, vê carê ji xwe re keçeke bi navê *Gulsûn* dibîne, tîne malê. Gulsûn angorî jina berê bûkeke çavvekirî, serwext, şerût û bi zar û ziman bûye. Gelek caran cesaret dike li dijî neheqiyên xwesûya xwe derdikeve, dilê wê çi bixwaze tîne cih. Di dawiya çîrokê de ji ber lêdaneke Gulsûnê xasî gelek bêhal dikeve, paşê jî dimire. Bi vî tehrî herdu bûk ji destê vê xwesûyê xelas dibin.[24] Gelek çîrok hene ko di dawiyê de bûne bingehê bendên pêşiyan, mirov dikare bibêje her koka bendeke pêşiya diçe dighêje çîrokekê û bûyerekê, ji ber vê yekê jî di navbera peydabûna bendên pêşiyan û çîrokan de pêwendiyên xurt hene. Her çîrokek demek hatiye êdî ketiye qalibê hevokekê, kurt bûye, wek çend peyvan ketiye tehrekî pendên pêşiyan. Mirov van çîrokan »çîrokên bendên pêşiya« jî dikare bi nav bike, wek misal »bûkê tune zar û ziman, xwesûyê tune dîn û iman« di dawiya çîrokekê de peyda bûye, ev çîroka wisan e:

Bûkek teze anîn peya kirin, xwesûya wê roja pêşîn du nan anîn dane ber bûkê û gotê: »Bûkê can, şerm neke, lê serê nan ker meke«. Bûkê ji

şerma wê rojê nan ne xwar, got: »Xwesûya min gotiye serê nan ker meke«. Sê roj temam bûn bi vî tehrî, xwesûyê digote bûkê, lê bûkê jî nan ne dixwar. Rojtira çara dîsa xwesûyê nan danî ber bûkê û gotê : »Şerme meke, lê serê nên ker meke«. Bûkê dîna xwe dayê ji birçiya wê qudum bikeve, ewê anî ji orta nên derxist xar, tenê qalkê li ser nan ma. Wisan sê roja bûkê nan ker nedikir, tenê orta nan dixwar, qalikê nên cî de dihişt. Rojekê xwesûyê gotê : »Bûkê, tu çira orta nên dixwî qalikê hişk jî dihêlî?« Bûkê got: »Tu xwesûya min î, çi te digot min jî gura te dikir. Wextê bûkê tune zar ziman, xwesûyê tune dî û iman«. Hingê bûkê xwesûyê re xeber de, şermî ji ortê rabû.[25]

Çawa me li jor jî got di dawiya çîroka *Bûka Gulsûn* de, piştî mirina xwesûya wan, ev herdu hewî dibin yek, bi kêfa dilê xwe şa dibin. Ji ber ko çîrok xelas bûye, mirov nikare derbarê pêwendiyên van herdu bûkan û hewiyan yên pêşerojê de tiştekî bêje. Di çîrokê de, xasîk û du bûk hene. Herdu bûk jî hewiyê hev in. Ji ber ko di çîrokê de xasî heye, vê carê şerê hewiyan disekine, hewî li dijî xwesûyê ne, dubendî, nakokî û şerê nav xwe ber didin, bi xwesûya xwe ve mijûl dibin. Eger çîrokê de motîva xwesûyê tune bûya, bêguman şerê hewiyan dikaribû mezin bibûya, di çîrokê de cihekî fireh bigirta. Çawa tê zanîn hatina jineke nû, di statûya jina yekemîn de guhasinên mezin pêk tîne, cih û rûmeta wê nimz dibe, jina duwemîn timê dibe berdilk û şirîna mêrê xwe, çawa bendeke pêşiyan dibêje: *nû hatin, kevin hilatin.* Di destpêkê de anîna jineke nû timê ji mêran re wek bûyereke xweş tê xuyan, lê belê piştî demekê, şerê hewiyan dest pê dike, hewî dikevine pêsîra hev, wê çaxê ew rojên xweşiyê êdî namînin, winda dibin, derdê pirjiniyê wê demê baş tê fam kirin. Di çîroka *Mêrê du jinan* de ev yeka gelek eşkere tê xuyan.[26] Di çîroka *Gulançikzêrîn* de, dilê padişahekî dikeve sê keçikên malekê, hersêyan jî, ji xwe re tîne. Padişah ji ber bersîvên keça piçûk, zêdetir ev keça hez kiriye. Lê belê herdu keçên mezin dest pê kirine dexesiya keça piçûk kirine. Demek derbas dibe, şerek derdikeve padişah diçe şer. Wê demê jî jina piçûk ducan bûye, ber hemlebûnê bûye. Piştî çend mehan, dema keça piçûk diwelide, herdu xuşkên mezin gazî pîrikeke bêiman dikin wekî bê alîkariya keça piçûk bike. Dema keçik diwelide, ev pîrik li şuna zarokan, du cewrikên (tule, kudik) sa tîne nîşanî keçikê dide, zarokan jî dike sandoqekê dibin davêjine nav behrê. Dema padişah tê, qala vê yekê dikin, padişah dibêje li ber malê safêrekê çê bikin, jinikê û herdu cewrikên wê li wir

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

girêdin. Sal derbas dibin, ew herdu zarokên padişah yên ko avîtibûne behrê (Huseyîn û Gulîzer) ji mirinê xelas dibin, dema ez zarokan rojekê qala serpêhayiya xwe dikin, paşê padişah fam dike ko ev zarokên wî yên jina piçûk in. Herdu jinên wî yên mezin lîstikeke anîne serê jina piçûk. Paşa tîne van herdu jinên mezin ceza dike, jina piçûk jî azad dike.[27] Çîroka *Mîrze Memûd û Xuşka Wî,* ji gelek aliyan de dişibîne vê çîrokê. Di çîroka *Mîrze Memûd û Xuşka Wî* de jî hewiya mezin hesûdiya hewiya piçûk dike. Di çîroka jorîn de çi tê serê hewiyê, tê serê vê hewiyê jî, herdu çîrok wek şaxên hev dikarin bên hesibîn. Di dawiya vê çîrokê de, dema padişah fam dike ko çi hatiye serê wî, tîne jina mezin şeq-şeqî dike dikuje.[28] Naveroka çîroka bi navê *Gulê* jî, wek van herdu çîrokan e.[29] Di hersê çîrokan de jî, derdê hewiyan motîveke hevpar e.

Di van çîrokên ko li ser derdê hewiyan hatine gotin de tiştekî ko bala mirovan dikşîne jî, rewşa pîran e, wek kesên bêiman û sêrbaz di nav koma »jinên xirab« de cih digirin. Di çîrokên kurdî de em rastî çend tîpên pîran tên. Pîr, di zimanê kurdî de bi taybetî ji bo jinên ko salên wan bihurîne tê bi kar anîn. Carcar ji wan re *pîrejin* jî tê gotin, di çîrokên kurdî de ev pîr gelek caran famdarî, zanebûn û mêvanheziya xwe ve tên nasîn. Çawa di çend çîrokan de jî xuya dibe, ev pîran kesine belengaz in, tenê dimînin, çavên wan li destê kesên mayî in, rojên xwe dipên. Ev tîpên pîran gelek caran alîkar in, qencî û pakiyê dixwazin, bextan û mirazan dighînin hev, suran re vekirîne, keç û xort dikarin baweriya xwe bi wan bînin. Ji wan hinek jî dilreş in, timê li pey xirabiyê ne, gilî û gotina digerînin, gilîgerok in, xeybê mirovan dikin. Çawa me di çîroka *Gulançikzêrîn* de qala wê kir, hin pîr jî hene, bi taybetî dema zarokanînê de alîkariya jinan dikin, ji wan re pîrik (ebe) dibêjin, di çîroka Gulançikzêrîn de ew pîrika wek jineke neçê tê nasîn. Tîpeke mayî jî *pîrhevok* in, ev kesan wek jinên çîrokî jî dikarin bên nav kirin, timê xirabiyê dixwazin, xof û tirsa wan timê li ser mirovan e, memikên xwe davêjine li ser milê xwe, pêşkarî mirovan dibin. Di jîyîna rojane de ev peyva, ji bo jinên bêter, bed, nebedew jî tê bi kar anîn.

Di folklora kurdî de jana damariyan, jana xwesûyan, jana hewiyan û jana jintiyan wek çar motîvên bingehî cih girtine. Van herçar motîvan (damarî, xasî, hewî, jintî) di nav folklora kurdî de sûretekî »Jina Xirab« peyda kirine.

Di çend çîrokên kurdî de bêbextî û nehelaliya jinan, bûye sedemê

malwêranî, malkambaxiyan. Bi taybetî jinên ko mêrkirî ne, lê belê bi mêrekî mayî re serê xwe dikine yek, di van çîrokan de wek jinên rû bi tenî tên hesibîn, gelek caran jî, di dawiya çîrokan de tên kuştin. Ev jinên ko bi yar in, jinên ko nabin xwediyê nefsa xwe, bi dizîka ve mêrên din re radizên, bi wan re şa dibin, di van çîrokan de gelek bi fesal gavên xwe davêjin, dek û dolap, fend û fêlên mezin tînin serê mêrên xwe. Carcar bi zanetî wek misal xwe nexwaş datînin, ji bo ko imkana hevdîtina dilketiyê xwe peyda bike, mêrê xwe bona »dermanekî« dişîne »welatê hat û nehatê«. Lê belê di dawiya çîrokan de her tişt êdî eşkere dibe. Çîroka *Ava heyatê û sêva Xelatê* di vî warî de gelek balkêşe. Jinik xwe nexwaş datîne, dibêje mêrê xwe, tê herî ji min re Ava heyatê û sêva Xelatê bînî. Mêrik tivdarekê xwe dike, terkeserî dinê dibe. Diçe gundê mala xuşka xwe, xuşka wî zane ne av, ne jî sêveke wisan heye, dibêje birayê xwe, jina te bi yar e, vegere here mala xwe! ew te dixapîne. Paşê bira û xuşk dikevine dilqê du gerokan, diçin dibînin ko gotinên xuşka wî rast in, jina wî bi yar e. Herduyan jî dikujin.[30] Di çîroka *Benglîboz* de, jineke padişahekî hebûye, navê wê Siltan bûye. Dema mêrê wê diçe şer, ew nêta xwe xirab dike, bi wezîrê padişah re radibe û rûdinê. Hespekî padişah jî hebûye, hespekî sêrbaz bûye, dikaribûye deng jî bike. Hesp, rojekê kurê padişah re, qala diya wî û wezîr dike, êdî pêwendiyên diya wî û wezîr eşkere dibin. Di dawiya çîrokê de, ev jinik tê kuştin.[31] Di çîroka *Silo û Rehmo* de hejmara jinên bi yarik her diçin zêde dibin. Silo di gomekê de xwe vedişêre, mêze dike dor bi dor sê mêrên çîptazî hatin gomê tevî pêz bûne. Ev kesan, yarikên wê jina ko Silo di goma wê de xwe veşartiye, bûne. Dema mêrê jinikê tê, diçe gomê rastî çend kesan tê, Silo mêrik re dibêje, ev yarê jina te ne. Silo jî radibe diçe mala xwe, dêrî dixe jina wî dêrî venake, jina wî jî bi yar e. Jinik yarê xwe dike kûpekî, vedişêre. Piştî demekê mêr vî kûpî dibe difroşe, dide cihûkî. Cihû dibêje Silo, vî kûpî bibe mala min, dema Silo kûp dibe mala cihû, mêze dike heft bûkên cihû her yek ji wan bi yarê xwe ve ketine nav kêf û henekan. Dema bûk çav li Silo dikevin, bembû davêjin li ser yarên xwe, wan vedişêrin. Paşê cihû tê malê, her tişt eşkere dibe.[32] Di dawiya çîrokê de, yarê jina Silo û yarên heft bûkên cihû jî tên kuştin. Çawa di çîrokê de jî tê xuyan, him jinên bi yar, him jî mêrên bi yar re imkana jîyînê zêde namîne. Di çîroka *Silqo* de, vê carê her çiqas Silqo jê derdixe jina wî bi yar e , dinêre xortek di nav cihê jina wî de ye, jinikê nakuje, tenê ber dide, paşê

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

jineke din ji xwe re tîne.[33] Çîroka *Bila ew nan û mastê xwe bixwe* wek pêkeniyan hatiye gotin, rojekê mêrek diçe leşkeriyê, heft sal leşkeriyê dike. Dema vedigere tê mala xwe, mêze dike kû sê zarokên wî hene, ew şaş û metel dimîne. Dema jina xwe dipirse wekî ev zarok yê kê ne, bersîva jinikê mêrik têr nake, êdî ter tişt derdikeve holê, mêrik fam dike ko ew zarok ne ji wî ne.[34]

Jinên destgiran

Çawa em li jor jî li ser sekinîbûn, di çîrokbêjiya kurdî de mêrên tiral, şil û şed, timê li malê ne, kêrî tiştekî nayên û bûne babetên gelek çîrokan. Civatê ew kesan di nav koma »mêrên xirab« de bi cih kirine. Wek mêran vê carê em rastî jinên wisan jî tên. Ev jinan jî tiral in, xebatekê nakin, her tiştî ji Xwedê, ji dorberê xwe hêvî dikin, di dawiyê de perîşan dibin, dikevin li ser zar û zimanan û dibin babetên çend çîrokan. Di çîroka *Mena komekê jî gotî hebe* de dayîk û keçek hene.[35] Di çîroka *Ardu* de bav, keçek[36] û di çîroka *Riya şixrê* de jî pîrejinek, dotek û pişîkek heye.[37] Hemû mêrxasên van hersê çîrokan jî, berî ko zivistan bê qet tivdarekê zivistanê nakin. Di van hersê çîrokan de dayîk, pîrejin û bav dibêjin çawa hebe emê bimirin, ne hewce ye em kar bikin, hersê keçên van çîrokan jî difikirin, dibêjin emê heta wê çaxê ji xwe re mêrekî bibînin, emê bizewicin. Di çîroka dawîn de pişîk jî dibêje, dema ew mirin û zewicîn ezê jî herim mala cîranan, bibim pişîka wan. Lê belê zivistan tê, ne ev dayîk, pîrejin û bav dimirin, ne jî keç mêr dikin. Dema zivistan tê ev kesên tiral, cangiran gelek perîşan dibin û destê kesên mayî dinêrin. Ji bo ko ji xwe re ardu û xwarinê berev bikin, dikevine çolan. Di dawiyê de mêze dikin ko jîyîn çawa ew difikirin wisan hêsa nîne. Ji aliyê din çawa em dibînin babeta van hersê çîrokan jî gelek nêzîkî hev e, wek şax û guhartinokên hev in. Ev yeka jî nîşan dide ko, tema van çîrokan ji aliyê civatê de giring hatiye dîtin ko ev çîrok ewqas belav bûne, nav dane.

Çend çîrokên jiyana rastî

Gelek çîrok li ser jîyîna kurdan hatine gotin, ev çîrokan, çîrokên rastî (real) tên bi nav kirin. Di jîyîna rojane de, ev bûyer li ser mirovan û li ser civatê re derbas bûne, wek neynika civatê ne. Ji aliyê dîrokî, der-

barê sal û demên bihurî de, ev çîrok me gelekî ronî dikin. Qewmandinên ko em di van çîrokan de rastî wan tên, wek qewmandinên bûyî dikarin bên hesibîn. Çawa tê tê zanîn civata kurdî wek civateke feodal ji gelek êl û eşîran pêk hatiye. Ji aliyê din bandûra serokeşîr, axa, beg, şêx û mezinan li ser civatê timê mezin bûye. Dubendî, nakokî, şer û dewên navbera van hêzan timê bala civatê kişandiye. Di hiş û mêjûyê civatê de cihek girtiye, ketiye li ser zar û zimanê civatê, bûne çîrok. Hevkuştin, xûnrijandin, dijminahî û şer wek motîv bûne babetê gelek çîrokan. Di vî warî de çîroka here balkêş, çîroka *Suto û Tato* ye. Bûyerên çîrokê li deverên Badînan derbas dibe. Suto serokê êla Duşkanî, Tato jî serokê êla Rêkanî ye. Şerekî bêhempa di navbera van herdu êlan de dest pê dike, bi hevra dijminatîke mezin dajon. Hêzên dewletê, axa û şêxên mayî jî tevî vî şerî dibin. Suto û merivên xwe gelek bêbextî, teda û zordestiyê li merivê êla Tato dikin. Di dawiyê de gelek mirovan ji hev dikujin. Ji bo tola hev bistînin herdu êl pêsîra hev ber nadin. Paşê gelek hêzên mayî dikevine nav, dixwazin wan bi hev bînin. Di dawiyê de herdu alî jî bi hev tên. Suto keça xwe dide Tato. Dema xûn hat rijandin, ji bo hevhatinê, li pêş xûnê dayîna keçekê di nav kurdan de edetekî kevn e. Ev yeka wek nîşana aşîtiyê dikare bê hesibîn. Lê belê Suto, rojekê xwe bi zanetî nexwaş davêje. Tato mirovên xwe ve tên serîkî bidinê wî. Dema ew diçin razên, mirovên Suto lêdixin Tato û mirovên wî dikujin. Bi vî tehrî Suto tola xwe ji dijminê xwe distîne û paşê radibe ser xwe spasî Xwedê dike.[38] Di çîroka *Revandina qereciyekê* de dîsa gelek mirov, qasî çil kes ji eşîra malmezinan tê kuştin. Rojekê xortekî eşîra malmezinan keçeke qereçiyan direvîne. Dema qereçî pê dihesin, davêjine ser eşîra Malmezinan, çil mirovên wan dikujin, paşê vedigerin malên xwe. Di çîrokê de dema serokê eşîra Malmezinan jê derdixe ko ewqas kes ji bo keçekê mirine, gazî xort û keçikê dike, dixwaze van herduyan jî bikuje. Lê belê dema mêze dike dilê lawik gelekî di keçikê de heye, dest ji kuştina wan ber dide. Serokê eşîra Malmezinan, çawa tê xuyan zewaceke bi keça qereçiyan di cih de nabîne.[39]

Di vî warî de çend çîrokên ko Alexander Jaba berev kirine û wek pirtûk weşandiye zêdetir bala mirovan dikşînin. Motîfên derbarê rewşa jinên kurd, di van çîrokan de gelek xurt û balkêş in. Di *Çîroka heyştan* de dilê du xortan dikeve keçeke bi navê Barnîk. Navê van xortan yek Şimasî, navê yê mayî jî Çolo ye. Cara pêşîn Barnîk didine

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Şimasî. Şimasî yekî dewlemend, Çolo yekî belengaz bûye. Lê belê dilê keçikê dikeve Çolo. Paşê ev herdu xort dikevine qirika hev, herdu jî tên kuştin. Di dawiyê de keçik jî bi xençerê xwe dikuje. Keçikê dibin li bal mezerê Çolo gor dikin. Di *Çîroka donzdehan* de serpêhatiya du birayên bêkar cih girtiye. Dilê birayê mezin Hesen Axa dikeve vê keça bi navê Lalî Xanim. Paşê dema birayê wî yê piçûk Çeleng Axa vê keçikê dibîne, dilê wî jî dikeve keçikê. Birayê piçûk lîstikekê tîne serê birayê xwe yê mezin, bira dev ji keçikê ber dide, birayê piçûk bi wê re dizewice, lê belê dilê keçikê birayê mezin - Hesen Axa de hebûye. Di dawiyê de keçik jehrê dixwe, dimire. *Çîroka nozdehan* de paqijî, helalî, dilovanî û cesaretê jinan tê zimîn. Angorî çîrokê mirovek hebûye, li bajarê Bitlîsê dima. Navê wî Cergo, navê jina wî jî Guzel Xatûn bûye. Rojekê jina wî bi mêvanî diçe gundê mala bavê xwe. Demek derbas dibe, Cergo xulamê xwe dişîne pey jina xwe wekî hilde bîne malê. Navê xulêm Kirêt bûye. Xulam di rê de nêta xwe xirab dike, dilê wî dikeve jina axê, pêşkarî jinikê dibe. Jinik dema firsendekê dibîne, tîne Kirêt dikuje, herdu milên wî jî jê dike, dibe nîşanî mêrê xwe û xelqê dide. Paşê herkes pesnê Guzel Xatûnê dide.[40]

Jinên wekî rawiran

Dema mirov çîrokên kurdî beş û beş analîz bike, ji hev derîne, mirov dibîne ko gelek çîrok jî, li ser rawir (tabe, terewil, lawir, heywan) hatine gotin. Ji ber ko piraniya kurdan di zikê tebiyetê de dijîn, di jîyîna wan ya rojane de ew û rawir di nav hev de ne, gelek rawiran diparêzin. Şivan, gavan, berxvan, golikvan û gelek kesên mayî her yek ji aliyê xwe de pisporekî rawiran e. Him rawirên hov, him jî rawirên kedîkirî di çîrokan de wek mirovan gavên xwe davêjin, cilên mirovan xwe dikin û dibin parçekî jîyîna mirovan. Mirov û rawir ji gelek aliyan de dişibînin hev. Di dawiya çend çîrokan de, ji ber xirabî û nepakiya xwe, çawa em dibînin ew dibin rawir, wek pepûk, hirç, jûjî, meymûn terkeserî dinê dibin. Dema em naveroka van çîrokan mêze dikin, yek ji mêrxasên çîrokê ji Xwedê re duayan dike, lawa dike, wekî ew kesê xirab û nepak bibe rawirekî, daxwaziyên van kesan derhal tên cih. Ew kes dibe çi lawirî? Ev yeka angorî naveroka çîrokê, rewş û kirinên van kesan re girêdayî ye. Bi saya van çîrokan em sedemên peydabûna her rawirekî jî fêr dibin.[41]

Naveroka hinek çîrokên kurdî bi temamî li ser rawiran e. Beşeke wan jî nîvî rawir in, nîvî mirov in. Di çend çîrokan de jî, her çiqas temam rawir bin jî, formekî hinerî di van çîrokan de peyda bûye, çawa em dibînin vê carê wek misal bi devê rawirekî an jî rawirekê çîrokeke li ser mirovan tên gotin. Vê beşê di nav hevsaziya çîrokeke dirêj de bi serê xwe cih girtiye. Dema em van çîrokên di nav çîrokan de mêze dikin, bi alîkariya van »çîrokên piçûk« rawir dixwazin nêt, merem û mesaja çîrokê xurt bikin. Angorî vî rûçikê hinera çîrokbêjiyê, bi devê rawiran şîret li me tên kirin, rawir rewşa xwe û bûyerên van çîrokên ko dibêjin, hemberî hev dikin, ji xwe re dikin pêlekan, materîal û daxwaza xwe ya dawîn pêşkêşî me dikin. Çawa tê zanîn wek hebûnên jîndar (zêndî, candar, ruhber) di navbera mirovan û hêzên nemirovî de, wek misal rawiran de gelek nêzîkahî û dirûvlêketinên balkêş hene. Gelek babetên çîrokên rawiran hene û naverokên wan ji motîvên gelek cida-cuda pêk tên. Di nav van motîvan de motîveke bingehî, motîva jinan û zewacê ye. Di vî warî de çîrokeke here hewaskar, şîretkar, çîroka bi navê *Zewaca Qijik û Kevokê* ye. Angorî çîrokê, Qijik mêr e, Kevok jî jin e, bi hevra dizewicin, lê belê piştî demekê bi hev nakin, dixwazin hev berdin. Ew diçin li bal qaziyekî, her yek qala rewşa xwe dike û çîrokekê qazî re dibêjin. Sedemê gotina van çîrokan jî, her yek ji aliyê xwe de bi misalên xweşik ve dixwaze qazî bidin bawer kirin, wekî kî heq e, kî neheq e, dixwazin li pêşberî qazî wek dadigehekê xwe biparêzin. Em ji naveroka çîrokê derdixin ko, Kevok doza hevberdanê dike, dixwaze ji mêrê xwe Qijikê veqete, wî berde. Angorî îfade û gotinên Kevokê, mêrê wê kesekî pîs e, timê qilêr û qirêj e, diçe ser cendek, kelaxan, timê tiştên pîs dixwe, bîna genî ji devê wî tê. Ji ber van sedaman Kevok dixwaze ji Qijikê veqete. Çawa me jor jî got, herdu diçin li bal qazîkî bawerî û nêrînên xwe li ser vê hevberdanê pêşkêş dikin. Pêşiyê Kevok, qala zordesiya ko li ser jinan heye dike, vê yekê wek neheqîkê di cî de nabîne. Paşê Qijik jî, bêbextiya jinan şirove dike, li ser neheqiya jinan disekine. Piştî ko her yek xwe diparêze, vê carê her yek çîrokekê jî dibêje wekî bawerî û dîtinên xwe xurttir bikin. Pêşiyê Qijik çîrokekê dibêje. Ev çîroka ko Qijik dibêje, bêbextiya jinan eşkere dike, wek misal Mîrze Mihemed rojekê bi çavê xwe dibîne ko jina wî û herdu jinên birayên wî bi kesên xerîb re ne, xwe tazî dikin, bi van mêran re dikevine avê, hev şa dibin, kêfa xwe dinêrin. Piştî van gotinên Qijikê dor tê Kevokê wekî bawerî û nêrînên xwe ji qazî re

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

pêşkêş bike. Piştî çend gotinan, ew jî çîrokekê dibêje. Angorî çîroka Qijikê mirovek hebûye, navê wî Memo bûye, Memo dema zewaca wî tê, bi dotmama xwe Rewşê re dizewice. Demek derbas dibe, vê carê Memo diçe hevala jina xwe ya dibistanê jî wek hewî bîne. Jina wî, ji bo ko belak neyê serê mêr, dikeve dilqê mêrekî, navê xwe datîne Ehmedê Kal, diçe digihêje mêrê xwe, lê belê mêr nizane ew jina wî ye. Ew timê alîkariya mêrê xwe dike ko qeza û belak nayê serê wî. Paşê dema ew hewiyê tîne ser Rewşê, vê carê dest pê dike Rewşê dixe, wê dikute. Fedakariya ko Rewşê jê re kiriye nizane... Kevok çîroka xwe dirêj dike, heta ko qazî dide bawer kirin ko mêr timê neheqiya jinan dikin û mêrê wê qijik jî mêrekî nepak e. Ji ber vê yekê jî dixwaze mêrê xwe berde. Çîrok bi vî tehrî xelas dibe.[42] Mirov êdî nizane ko qazî heq daye kîjan alîyî. Çîrokbêj mimkin e mafê biryardayînê ji xwendevan û ji guhdaran re dihêle. Çîroka *Zewaca qijik û kevokê* di babeta problematîka jinan de çîrokeke gelek hînkar (dîdaktîk) e. Ji ber ko herdu alî çi jin, çi mêr di vê çîrokê de sedemên hevberdanê bi vekirî, bi misal û bi alîkariya çîrokên mayî raberî xwendevanan û guhdaran dikin.

Çîroka *Kund û bilbil* ji aliyê dilovanî, paqijî, helalî, nefs û quweta danbawerkirina jinan de me zêdetir ronî dike, çîrokeke bandûrhişt e. Rojekê çawa dibe kund riya xwe şaş dike, diçe ber qula bilbilê. Dixwaze here bal bilbilê. Bilbil jinebîke xweyê çend zarokan bûye. Kund çiqas lawa dike, bilbil dîsa dêrî lê venake, dema dinêre nikare Kund bide bawer kirin, vê carê jê re qala çîrokekê dike. Angorî çîrokê li bajarê Helebê paşak dima, serkarekî xulamên paşê hebûye, navê wî Elo bûye. Rojekê dema paşa diçe hec, karên mala xwe dispêre Elo. Sê keçên paşê hebûne. Elo dor bi dor çav berdide keçên paşê. Lê belê keça piçûk, keçeke bêter bûye, Elo ew nikaribûye bîne rê. Di dawiyê de wê davêje çelekê, heta bavê wê tê. Paşê jî îftira davêje keçikê, ji bavê re dibêje, dibê keça te, dema tu ne li vira bûyî kerxane vekiri bû, timê li ser riyan derpiyê xwe derdixist... Piştî van gotinan gelek bela têne serê keçikê, bav dixwaze wê bikuje, paşê ew rêkê dibîne xelas dibe. Dema Bilbil vê çîrokê dirêj dike, Kund gelek aciz dibe, dibê ev çîroka gelek dirêj e, tu nikarî qut bikî. Lê belê bilbil, heta ko kund bikeve bimire, çîroka xwe didomîne. Bi mirina kund ve êdî çîroka bingehî diqede, xelas dibe.[43]

Him çîroka *Zewaca qijik û kevok,* him jî çîroka *Kund û bilbil* bi tehrekî allegorîk rewşa jinan, problem û êşên wan, zordestiyên li wan

tên kirin, bi stîleke hinerî radixin li ber çavan. Çawa tê xuyan ew »çîrokên nav çîrokan« bedewîke mezin didin van herdu çîrokan. Di van çîrokên rawiran de, çawa em dibînin jinên ko kincên rawiran an jî rawirên ko kincên jinan xwe kirine, ji wan her yek problemeke jinan pêşkêş dike. Di çîroka *Kêz xatûn* de, Kêz xatûn piştî gereke dirêj ji xwe re mêrekî dibîne, pê re dizewice, navê mêr Mişko Axa bûye. Kêz Xatûn her çiqas bedew bûye, her ewqas jî qure û pozbilind bûye. Di dawiyê de Kêz xatûn dibe goriyê vê quretî û pozbilindiya xwe, ji aliyê Mişko Axa de tê kuştin.[44]

Çawa me li jorê jî pêşkêş kir di van hersê çîrokên kurdî de cotek rawir kincê jin û mêran li xwe dikin, dikevin dilqê mirovan, bi hev ra dizewicin (qijik û kevok, kund û bilbil, kêz û mişk). Di van hersê çîrokan de jî, em rastî tu zewaceke dilşa nayên, ya hev berdidin yan jî dibin bayisê mirina hev.

Ji aliyê din çîrok jî hene, ji van cotan yek mirov e, yek jî rawir e, bi hevra dizwewicin, dibin jin û mêrên hev. Di çîrokên *Mar*[45] û *Hemend*[46] de, vê carê marek wek xortekî dixwaze bi keça padişah re bizewice. Piştî çend teqereqan ew diçin, digihêjin mirazê xwe. Ev herdu çîrok jî, ji gelek aliyan de wek hev in, mirov dikare bêje, şaxên hev in jî. Mar hewl dide ko martiya xwe zêde nîşan nede, bala mirovan zêde nekişîne ser xwe, lê belê dîsa jî ji destê wan nafilite, dawiyê de dîsa ya xwe dike, bi keça padişah re dizewice. Eger em ji dinya çîrokan piçekê dûr bikevin, di jîyîna rojane de mar çawa em zanin wek rawirekî zêdetir bi kûvîtiya xwe, zordestî û êrîşkariya xwe ve tê nasîn.[47]

Di nav kurdan de mar, rawirekî zêde hezkirî nayê hesibîn, angorî lêkolînvaneke tirk ya ko gelek çîrokên kurdî wergerandine tirkî, pêwendiyên nexweşiya mar û tunebûna ava paqij gelek xurt in. Angorî wê, ew kesên ko ava ne paqij vedixwin, li gor baweriya wan, di zikê wan de imkana peydabûna meran zêdetur e, ev yeka jî dibe bayisê tirsa maran.[48] Lê belê di folklor û mîtolojiya kurdî de, ev sûretê maran yê êrîşkar wisan bi hêz û xurt nîne. Çîroka şahmaran (şahê maran) de mar bi sûretekî gelek mirovî ve hatiye xemilîn. Angorî van mîtolojiyan mar wek fîgurekî mîtolojîk ji navê berjêr wek mar, ji navê berjor wek keçeke bedew e. Mar angorî vê mîtolojiyê bûye nîşana bedewî û xweşiyê, navê şaha van marên nîv-mirov û nîv-mar, angorî mîtolojiyê şahmaran bûye.[49] Dema mirov van herdu çîrokên ko me navê van li jor

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

daye û mîtolojiya şahmerdanê dide ber hev, mirov van herdu çîrokan de sûretekî maran yê nêzîkî mirovan dibîne.

Jinên çîrokî

Ji aliyê din jin hene tenê jinên çîrokî û mîtolojîk in, ne mirov, ne jî rawir in. Ew gelek caran wek keçên dêwan, hût, cinan û wek pîrhevokan tên nasîn, horî, perî ne. Çawa me di destpêkê de de jî gotibû, dema ew mêrxasên berê xwe didine »welatê hat û nehatê«, ew diçin rastî van dêw, hût û cinan tên, ev erd welatê wan e. Gelek mêrxas li vî welatî nasiya xwe didin keçên wan, dibin heval, paşê vedigerin tên cî û meskenê xwe. Dema ew diçin lingê xwe davêjine welatê hat û nehatê, ev dêw, hût û cin fam dikin ko bîna »benî« yan , »benî ademan« tê, »evdê sereş« hatine welatê wan, mirovan zû nas dikin. Ew dest pê dikin îfadeyên wan mirovan digirin, carcar jî gelek şer û dew, mirin û kuştin pêş da tên. Dîsa me di destpêkê de gotibû, dema kesek diçe xwazgîniyê keçekê, bavê wê çend mercên giran û dijwar pêşda davêje, erdê pêkanîn û cihanîna van mercan jî bi taybetî ev welatê hat û nehatê ye, ev kesan mecbûr dibin berê xwe didin vî welatî. Motîfeke din jî, dema kesek bedhal dikeve, nexwaş dibe, ji bo dîtin û peydakirina dermanekî ew diçin vî welatî, ew wek misal pey *sêva xweşiyê* û *ava heyatê* dikevin... Carcar jî jinên ko dixwazin demekê ji mêrên xwe dûr bikevin, sedem û bahaneyên cida dibînin û mêrên xwe dişînin van welatan dûr. Çîroka *Silêmanê Zindî* di vê babetê de çîrokeke pir giring e. Bavê Silêmanê Zindî ji aliyê hûtekî de tê kuştin. Ew jî heft kurê hût dikuje, bavê wan jî dîl digire, tîne dest û piyê wî girê dide, davêje çelekê, selekî datîne ser çelê. Vê carê diya Silêmanê Zindî dibe evîndarê hût. Ji bo ko ew û hût bi rehetî hev bibînin, bi hevra şabin, ew xwe naxwaş datîne, kurê xwe Silêmanê Zindî dişîne dîtina dermanan (zebeşê hûtan û şîrê şêran). Diya wî di wê baweriyê de ye ko, dema Silêmanê Zindî çû van deveran, dêwê wî bikujin, êdî vegera wî tune ye. Cara pêşîn kur diçe nav bostanê Dêwê Sor, keça dêw dibe evîndarê Silêmanê Zindî, dibe alîkara wî. Ew zebeşê diya wî gotibûyê, peyda dike, vedigere malê. Diya wî û hût vê carê lîstikeke din tînin serê Silêmanê Zindî, diya wî dibêjê, here min re »şîrê şêr di eyarê şêr de« bîne. Silêman lêdixe diçe Çiyayê şêran. Keça dêw dîsa jê re dibe alîkar, dibêje dema tu diçî Çiyayê şêran li wir xuşkeke min heye navê wê Gulxan e, vê namê bide

wê, ewê te re bibe alîkar. Vê carê jî Silêmanê Zindî daxwaziya diya xwe tîne cih. Lê belê ji ber ko diya wî keseke bêbext û xayîn bûye, di dawiyê de çavê kurê xwe derdixe û davêje bîrekê (çal). Paşê ew bi alîkariya çend rêwiyan tê xelas kirin. Vê carê Silêmanê Zindî tê malê, him diya xwe, him jî dostê wê dikuje, paşê jî laşê wan dişewitîne. Silêmanê Zindî xwe jî bi keça Dêwê Sor re dizewice, navê wê Herdemxan bûye. Paşê ew diçin mirazê xwe şa dibin. Di çîroka Silêmanê Zindî de dubendîke gelek tûj heye, li alîkê dayîkeke dil bi kevir, bêbext, li alîkî jî herdu keçên Dêwê Sor (Herdemxan û Gulxan) bi qenciya xwe ve tên nasîn, wek du tîpên li dijî hev, ji hev dûr, bûne nîşana pakî û nepakiyê. Bi van herdu tîpên jinan ve, çîrokê imkaneke rûberîhevkirin, danberhevdanê ji bo xwendevanan peyda kiriye. Di çîrokê de jinên çîrokî di warê qenciyê de çawa em dibînin zora jinên mirovî (benî adem) dibin. Bi vê teknîka xwe ve çîrokeke bi hêz e. Ev çîroka ko Roger Lescot berev kiriye (Silêmanê Zindî), ji gelek aliyan de dişibîne çîrokeke ko Heciyê Cindî berev kiriye (Meymûn Xanim û Mîrze Memûd), di vê çîrokê de jî diya Mîrze Memûd, dêwekî bi navê Babir re dibe yek, li dijî kurê xwe xirabiya difikire, herdu çîrok jî xirabî û dilkeviriya dayîkên bêbext radixe ber çavan.[50] Çîroka *Şarûr Bilbil* de Mîrze Memûd rastî keçên Dêwên Sor, Spî û Reştê, ev hersê keçik jî wî re dibin alîkar û dibin evîndarê wî, lê belê Mîrze Memûd heta ko nagihêje merema xwe, têkilî van keçikan nabe, şûrê xwe datîne navbera xwe û wan.[51] Ji ber ko di van çîrokan de dêw, hût, cin bi bi xirabiya xwe ve tên nasîn, li pêşberî van zordestiyên bavên xwe, keçên wan jî bûne wek nîşanên aşîtiyê, evîn û qenciyê. Dijayetîke mezin navbera bav û keçan de heye. Di çîrokên li ser padişahan de jî, çawa me gotibû dijayetiya bav û keçan bi nav û deng e. Di çîroka *Nêçîra Çiyayê Reş* de him dilê keça Pîra Heftserî dikeve Mîrze Mihemed, him jî dilê dergistiya Dêwê Canpolat. Her çiqas dergistiya Dêwê Canpolat dixwaze wekî Mîrze Mihemed bibe mêrê wan herduyan jî, lê belê ew vê yekê cih de nabîne, Mîrze Mihemed bi keça Dêwê Canpolat re dizewice, navê wê Gulsûm bûye, keça Pîra Heftserî jî dide birakî xwe.[52] Ev keçan bi vê evîna xwe ve, em dikarin bêjin ko ew bi tehrekî mayî neheqî û zordestiyan li welatê xwe, zordestiyên bavan protesto dikin. Evîn, dibe formekî protestoyê.

Beşên dawîn yên çîrokên kurdî timê heqî, qencî, paqijiyê wek motîvên dilpakiyê li ser mirovan de dibarînin. Di çend çîrokên kurdî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

de, carcar ew kesên ko hatine girtin, eziyet û cefa dîtine, nepakî hatine serê wan, mêrxasê çîrokê yê xêrxwaz van kesan dişîne himamê wekî xwe himam bikin, bişon. Ev motîva himamê wek nîşana paqijiyê dikare bê hesibîn. Ne tenê qilêr û qirêja bedenê, ev serîşuştina ji alîkî de jî dibe nîşana serketin, serbestî û şahiyê, motîva himamê dibe nîşana destpêka jîyîneke nû.

Tekoşîna jinan

Bi kurtî tema jinan di nav çîrokên kurdî cihekî fireh digire. Dema em van çîrokan bi çavekî rexnegirî analîz dikin, jin di du warî de gelek aktîf in. Ji alîkî de ew bi xurtî li dijî neheqiyên li wan bûyî, radiwestin, şer dikin, ji alîkî de jî wek pêşeng û rêber bi zanebûn û famdariya xwe ve rê nîşanî mêran didin, di nav çîrokan de motîva jinên tekoşer peyda dikin. Ew tevî raberzînên »jin tabîê mêr e an mêr tabîê jin e« dibin, ew di çend çîrokan de îspat dikin, nîşan didin ko, timê »jin ne tabîê mêr e«, ew gelek hewl didin ko nîşandin wekî mêr jî dikarin tabîê jinan bibin. Çawa tê zanîn karên ko jin di nav malê de dikin bêhejmar in, ne tenê karên malê, li der malê jî jin timê mijûl in, di warê bicihanîna karên der û hundur de sebira jinên kurd bêsînor e. Di çîroka *Mêr Neşên Bibin Kevanî* de dema zilamekî cotkar bi jina xwe ve pev diçe, mirûzê xwe dike wekî şîv tune, rojekê jin dibêjê de were tu bi karên malê ve mijûl bibe, ez li şuna te herim cot, dema jinik êvarê vedigere mal, mêze dike ko çi malwêranî. Mêrê wê poşman dibe, rojtira din dîsa diçe li ser cotê xwe.[53] Di çîroka *Qirxsaçliyê* de em rastî jineke wisan tekoşer tên. Ew terkeserî dinê dibe, di rê de rastî gelek kesan tê, ev kesen çav ber didin wê, dixwazin bi wê re bizewicin, dest davêjine wê, lê belê Qirxsaçlî her carekê rêkê dibîne, pêsîra xwe ji vê koma mêran xelas dike. Carekê rastî padişahekî tê, sî û neh jinê wî hebûne, dixwaze Qirxsaçliyê jî bixwaze, hejmara jinên xwe bike çilî. Qirxsaçlî, padişah dixapîne û sî û neh jinên wî jî hildide direve, diçe. Vê carê rastî komeke çil mêran tê. Ev çil mêr dixwazin, bi van çil keçan re bizewicin. Qirxsaçlî, bi keçên hevalên xwe ve, lê dixin koka van çil mêrî tînin, paşê dikevine riya xwe. Rojekê tên cihekî dibînin ko padişahê wî welatî miriye, teyrê dewletê difirînin, angorî edetên wan salan, teyr serê kê daniya, ew dibû padişahê wî welatî. Vê carê teyr tê datîne serê Qirxsaçliyê, Qirxsaçlî dibe padişah, wan sî û neh keçikên

din jî dike wezîr, wekîl û karên mayî dide wan, meclîseke tenê ji jinan pêkhatî ava dike. Di dawiya çîrokê de, ew kesên ko berê di rê de rastî wê hatibûn, dest avîtine wê, angorî kirinên wan Qirxsaçlî tîne cezayan dide wan, kesên bi heq û neheq ji hev cida dike.[54] Çîroka Qirxsaçliyê nîşan dide ko jin dikarin di heqê her tiştî de derkevin, serkevin û bigihêjin serfiraziyê. Di çend çîrokên kurdî em rastî jinên wisan tên ko li dîjî dijminên xwe seferber dibin, karên xwe bi serfirazî diqedînin, digihêjin armancên xwe.[55] Çend çîrokên kurdî jî jin hene, nîşan didin ko jin dikarin gelek caran lîstikên mezin bînin serê mêran, li ser tilîke xwe van mêran bidin lîstinê. Di Çîrokên *Jina Bêter*[56] û *Masiyên Bejî*[57] de, em rastî jineke wisan tên, dikare mêrê xwe bide bawer kirin wekî di nav zeviyan de jî masî dikarin peyda bin û mêr jî bawer dike. Bêteriya jinan carcar digihêje sînorekî wisan, mirin jî bi wan nikare. Dema van tîpên jinan tiştek xiste hişê xwe, angorî çîrokan Xwedê jî bi wan nikare, ev jin di nav koma jinên serhişk de cih digirin. Rojekê mêrek û jina xwe diçin nav zeviyê, dinêrin kêrguşkek ji nav zeviyê revî çû. Jinik dibêje, ew rûvî ye, mêr dibêje na jinik ew ne rûvî ye, ew kêrgûşk e. Mêr çi dike û nake nikare jina xwe bide bawer kirin, diçin gora jinê dikolin, jinik dîsa dibêje, na ew rûvî ye.[58]

Bi kurtahî di çîrokên kurdî her çiqas li pêşberî miraz, bext û dilşahiya evîndaran gelek dijwarî, tengasî û asteng peyda dibin jî, ew dîsa bi serfirazî vedigerin tên, dighêjin hev. Bi taybetî jin ji ber van dijwarî û tengasiyan tu wext stoyê xwe xar nakin, timê aktîf in. Di gelek çîrokan de ew tînin hûrê rawiran dixin serê xwe, dikevine dilqê keçelan, ji ber ko kes şikê nebe wan, ew her imkanên xelasiyê diceribînin. Motîfa »jina keçelok«, ji alîkî de aktîfbûna jinan nîşan dide.[59] Di vê kefteleft, şer û tekoşîna xelasiyê de, çend hêzên çîrokî jî timê amade ne, tên hewariya evîndaran, keç û xortan, alîkariya wan dikin, wek secade, xalîçên firoke, teyrê sîmir, şiva qudretê, jin an jî keça dêw...[60] Ev yekitî, destbirakî û dostayetî, çawa em dibînin wisan xurt e, ko di dawiyê de, zora wî dêwê herî xurt, Canpolat jî dibe, heft deriyê wî yên pola jî êdî kêrî tiştekî nayên, wek mêrê rojên teng Mîrze Memûd çawa wê keçika bedew – Çilkeziyê ji destê Canpolat xilas dike û Çilkeziyê digihîne mirazê wê. Em dibînin ko dawiya her çîrokekê de mizgîniya şahiyê bi lez diçe digihêje dê û bavan, mirov dikare bibêje ko dawiya her çîrokekê de dîlanek heye.[61] Motîfa Mîrze Memûd di çîrokên kurdî de wek xelaskarê jinên bindest yê herî bi nav û deng dikare bê hesi-

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bîn. Di çîroka *Usifê Tenbûrvan* de piştî gelek teqereqan Gulbarîn ji destê Canpolat tê xelas kirin. her çiqas Canpolat bi lêdanan nayê kuştin, di dawiyê da ruhê wî jê tê standin, paşê ew bêcan dimîne, dimire, Gulbarîn para Usivê Tenbûrvan dikeve.[62] Di çîrokeke mayî de vê carê keçeke mayî tê xelas kirin, navê wê Bilbilhezar bûye.[63] Bi vî tehrî Çilkezî, Gulbarîn, Bilbilhezar û gelek keçên mayî ji ber destê dêwan, hûtan difilitin, digihêjin bext û mirazê xwe. Bi kûrtahî mirov dikare bibêje ko pirsa xelasî û azadiya jinan, kakilê piraniya çîrokên kurdî pêk tîne.

Serkanî

1) Çawa berî û piştî destpêka sedsala me, wisan jî di salên dawîn de çîrokên kurdî bala gelek kurdnas û lêkolîneran kişandiye ser xwe. Ji ber vê yekê jî, wan ev berheman wergerandine çend zimanan: M. B. Rudenko, *Kurdskie Skaski,* Moskov, 1959. Cemal Nebez, *Kurdische Märchen und Volkserzählungen,* Munîh, 1972. Arab Schamilow, *Die drei Galatzköfte-Kurdische Volksmärchen,* Berlin,1977. Joyce Blau, *Contes Kurdes,* Paris, 1986. Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl & Zîna Celîl, *Kurdiskie Skazki, Legendi i Predaniya,* Moskov, 1992. Muhsine Helimoğlu, *Cigaramın Üstünde Bir Topal Karınca –Türkçe'de Ilk Kez 88 Yeni Masal,* Ankara, 1992 (Piraniya çîrokên ko di vê berevokê de cih girtine, li deverên Kurdistanê yên cida hatine berev kirin). *Der Löwe des Daragnos und andere kurdische Fabeln,* Wien, 1992.

2) Roger Lescot, *Çîrokên kurdî,* Stockholm, 1986, rûp. 68–105.

3) Roger Lescot, rûp. 68–105, 106–140.

4) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta kurdîê III,* Erîvan, 1969, rûp. 71–83. (Ev xebata Heciyê Cindî ji pênc cildan pêkhatî ye ü her cildekî de gelek çîrokên kurdî cih girtine. Di nav xebatên ko heta niha hatine pêkanîn de, xebateke here berfireh û giranbiha ye. Berevkirina van çîrokan qasî bîst û pênc salên nivîskar giriye. Cildê yekemîn di sala 1961'an de hatiye weşandin, cildê pênca û dawî di sala 1986'an de der çûye).

5) Heciyê Cindî, *Hikayatêd Cimaeta kurdîê IV*, Erîvan, 1980, rûp. 72–74.

6) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda II,* rûp. 229–231.

7) Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe I*, Stockholm, 1989, rûp. 116–119. (Zeynelabidîn Zinar ji sala 1987'an vir de heta niha şeş cildên Xwençe weşandine. Di her cildekî de beşeke gelek çîrokên kurdî cih girtine, hemû li Stockholmê hatine weşandin. Cildê dawî 1993'ê de der çû).

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

8) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta Kurdiê I,* rûp. 201–210, Hikyatêd Cimaeta kurdî IV, rûp. 173–175.
9) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta Kurdiê IV,* rûp. 198–201
10) M. Emîn Bozarslan, *Masiyên Bejî,* Uppsala, 1987, rûp. 28–29. (M. Emîn Bozarslan heta niha gelek pêkenokên gelî wek pênc pirtûkan weşandiye: *Masiyên Bejî* 1987, *Ji Dîna Dîntir* 1988, *Ilmê Tûrik* 1989, *Bûka Gulsûn* 1990, *Mela Kulî* 1991).
11) Hesenê Metê, *Ardu* (Ji Kurteçîrokên Gelêrî), Stockholm, 1990, rûp. 104–106.
12) M. Emîn Bozarslan, *Masiyên Bejî,* rûp. 48–49.
13) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda II,* Moskov, 1978, rûp. 260–267.
14) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Gulançikzêrîn (*Berevokeke folklorik), Erîvan, 1984, rûp. 82–88.
15) M. Emîn Bozarslan, *Mela Kulî,* rûp. 28–34.
16) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta kurdîê IV,* rûp. 47–49.
17) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta kurdîê III,* rûp. 9–16.
18) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Zarotina Kurda II,* rûp. 205.
19) *Zargotina Kurda II,* rûp. 235–237.
20) Heciyê Cindî, Hikyatêd Cimaeta kurdîê IV, rûp. 52–54.
21) Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe II,* rûp. 281–285.
22) M. Emîn Bozarslan, *Pepûk,* Uppsala, 1985, rûp. 53–66. (M. Emîn Bozarslan ew çîrokên ko li ser rawiran hatine gotin, wek pênc pirtûkan weşandiye. Wî ev çîrokan bi »meselokên lawiran« nav kiriye: *Mîr Zoro* 1981, *Gurê Bilûrvan* 1982, *Kêz Xatûn* 1982, *Serketina Mişkan* 1984, *Pepûk* 1985).
23) Selîm, Bakişik, *Surîeyar,* rojnama Azadî, Istenbol, 25–31.7.1993.
24) M. Emîn Bozarslan, *Bûka Gulsûn,* rûp. 70–82.
25) *Zargotina Kurda II,* rûp. 209.
26) M. Emîn Bozarslan, *Ilmê Tûrik,* rûp. 19–22.
27) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Gulançikzêrîn, r*ûp. 114–130.
28) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta kurdîê III,* rûp. 203–207.
29) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta kurdîê III,* rûp. 84–95.
30) Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe I,* rûp. 247–248.
31) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta kurdîê IV,* rûp. 123–134.
32) Zeynelabidîn Zinar, Xwençe VI, rûp. 155–166.
33) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta kurdîê IV,* rûp. 44–46.

34) M.Emîn Bozarslan, *Ji Dîna Dîntir,* rûp. 9–10.
35) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Gulançikzêrîn,* rûp. 51.
36) Hesenê Metê, *Ardu,* rûp. 71–73.
37) M. Emîn Bozarslan, *Ji Dîna Dîntir,* rûp. 23–24.
38) Major E. B. Soane and Bazil Nikitin, *The Tale of Suto and Tato,* London, 1988. (Ev çîroka berî gelek salan ji aliyê van herdu kurdnasan de bi zimanê Inglîzî hatiye çap kirin. Di vê çapa nû de ligel çapa Inglîzî, çîrok bi herdu zaravayê kurdî kurmancî – soranî jî hatiye wergerandin).
39) Hesenê Metê, *Ardu,* rûp. 118–121.
40) Alexandre Jaba, *Recueil de notices et de recits Kourdes,* St-Petersbourg, 1860.
41) M. Emîn Bozarslan, *Pepûk,* 1985.
42) Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe II,* rûp. 185–237.
43) Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe VI,* rûp. 145–152.
44) M. Emîn Bozarslan, *Kêz Xatûn,* rûp. 58–76.
45) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta kurdîê IV,* rûp. 87–91.
46) A. Gernas, *Hemend I–II,* Rojnama Azadî, Istenbol, 6–12/2/1993, 14–20/2/1993.
47) Roger Lescot, *Çîrokên kurdî,* rûp. 94.
48) Muhsine Helimoğlu, *Cigaramın Üstünde Bir Topal Karınca,* Ankara, 1992, rûp. 24.
49) M. Zahîr Kayan, *Di çanda me de motîva şahmaranê,* Rojnama Welat, Istenbol, 12–18/9/1993.
50) Roger Lescot, *Çîrokên kurdî, rûp.* 38–67. Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta kurdîê I,* 211–227.
51) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Çîrokêd Cimaeta Kurda,* Erîvan, 1974, rûp. 106–137.
52) Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe VI,* rûp. 189–209.
53) M. Emîn Bozarslan, *Ji Dîna Dîntir,* rûp. 30–32.
54) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Çîrokêd Cimaeta Kurda,* rûp. 21–42.
55) Alexandre Jaba, *Recueil de notices et de recits Kourdes,* St.Petersbourg, 1860.
56) *Zargotina Kurda II,* rûp. 231–232.
57) M. Emîn Bozarslan, Masiyên Bejî, rûp. 60–64.
58) *Zargotina Kurda II,* rûp. 221.

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

59) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta Kurdîê II,* rûp. 72–78.
60) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta Kurdîê V,* rûp. 98–106.
61) Heciyê Cindî, *Hikyatêd Cimaeta Kurdiê* I, rûp. 17–42.
62) Stig Wikander, *Recueil de textes kourmandji,* rûp. 24–32.
63) Stig Wikander, *Recueil de textes kourmannji,* rûp. 35–38.

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

— BEŞ II —

Di gotinên pêşiyan de zihniyetên jinparêz

Gotinên pêşiya beşeke giring ya folklora kurdî pêk tînên. Ji van gotinan re carcar *bendên pêşiya* jî dibêjin. Ev berheman carcar jî *mesele û metelok* tên bi nav kirin. Gotinên pêşiya yên kurdî gelek dewlemend û rengîn in, ji wan beşek şaxên wan yên cida jî hene. Heta niha hemû gotinên pêşiya di nav kurdan de nehatine berev kirin, nehatine şirovekirin û li ser wan xebatên zanistî û folklorîk zêde nahatine pêka anîn. Di vî warî de xebateke here fireh di sala 1985-an de ji aliyê Prof. Heciyê Cindî hat weşandin. Di nav vê berevoka ko bi navê *Meselok û xeberokêd cimaeta kurd* hat çapkirin, ji bîst pênc hezarî zêdetir gotinên pêşiya cih girtine.[1] Ev berevoka di vî warî de xebata here firehîn tê hesibîn. Ji der vê xebata Heciyê Cindî, çend xebatên herdu biran Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl di vî warî de hene.[2] Di van salên dawîn de, li Tirkiyê jî çend pirtûkên gotinên pêşiya ji aliyê Huseyin Deniz[3] û A. Balî[4] hatin weşandin. Ji aliyê din, çend berhem û lêgerîn çawa em dibînin bi serê xwe berevokên gotinên pêşiya nîn bin jî, di nav rûpelên van de gelek gotinên pêşiya hatine weşandin an jî zaniyariyên kurt li ser gotinên pêşiya hene.[5]

Gotinên pêşiya wek neynika felsefeya jîyîna gelê kurd gelek zaniyarî û agahdariyên giranbiha pêşkêşî me dikin. Bi taybetî di warê pêwendiyên civakî û mirovî de, ev gotinên kurt, têr û tijî û menakûr, gelek şîretan li me dikin. Kurdan bi kîjan felsefaya jîyînê ve li dorberê xwe, li cihanê nihêrîne? Başî û nebaşî, pakî û nepakî û rastî û nerastî bi çi awayî ji hev hatine cida kirin? Wek van pirsan mirov bersîvên gelek pirsên mayî jî bi alîkariya gotinên pêşiya, bi awakî gelek kurt dikare bide. Civatê bi xwe qiymetê gotinên pêşiya daye: *giliyê pêşiya, kevirê xaniya.*

Di nav gotinên pêşiya yên kurdî de, beşeke wan çawa em dibînin li dora tema jinan berev û lod dibin, bi sedan gotinên li ser jinan di zi-

manê kurdî de hene. Ev loda gotinên pêşiya derbarê rewşa jinan de, gelek agahdariyên sosyolojîk pêşkêşî me dikin. Bi saya van gotinên pêşiya mirov xwe bi hêsanî dirêjî serboriya civata kurd dike, pêwendiyên jin û mêran, rewşa malê, malbat û jinê çêtir analîz bike. Bi vî tehrî, em van berhemên folklorîk ji xwe re dikarin bikin pêlekan û li ser rewşa jinên kurd bighêjin çend encam û nêrînên sosyolojîk û etnografîk. Dîsa bi saya van gotinan em dikarin xwe wek civat baştir binasin û bidin nasandin. Ew wek neynikekê ne, bi her aliyan ve dikarin civata kurdî bînin ber çavan.

Bêguman her gotineke pêşiya yekten ji devê yekî/yekê ji nişka ve derneketiye. Her gotineke pêşiya, serpêhatî û çîrokeke wê heye, di dawiya bûyerek giring de peyda bûne. Pêwistî û hewcedarîkê ew afirandine. Dema em tecrûbe û ceribandinên mirovan yên sedsale jî, li ser van etaban de zêde bikin, wê çaxê mirov dibîne ko her gotineke pêşiya li ser bingehên ked û zehmetekî aqilmendiyê peyda bûye, forma xwe ya dawî wergirtiye.[6]

Her gotineke pêşiya ya li ser jinan, raste-rast rewşa jinan tîne zimîn. Beşek ji wan jî, rewşa jinan dane ber çavan, lê belê li ser tiştên mayî hatine gotin û wan tînin zimîn. Ji ber ko li ser tema jinan şax vedane û jin ji xwe re kirine bingeh, ev beşa duwemîn ya gotinên pêşiya dîsa jî bala mirovan vedigerînin li ser rewşa jinan, wek misal dema mirov dibêje *qîz mêvanê malê ye,* mirov dixwaze bibêje keçek nikare heta mirinê di malê de bimîne, ji aliyê din ji bona tiştên derbazok jî mirov dikare vê gotina pêşiya bi kar bîne. Dema mirov tenê vê mana duwemîn bide ber çavan, kok û binyata peydabûna vê gotinê mirov nikare (wek rewşa keçan) bavêje alîkî. Ev kok û binyatên çend gotinên pêşiya jî, bona ronîkirina vê analîza me ya li ser jinan gelek rênîşandar û kêrhatî bûne. Ji aliyê din, ji der gotinên pêşiya, ji bo xurtkirina çend nêrîn û baweriyên xwe, me ji ferhenga hevbêjeyên (tabîr) kurdî jî gelek îstîfade kir.[7]

Di nav hevbêjeyên kurdî de, gelek hevbêjeyên derbarê jinan de hene, wek gotinên pêşiya rê nîşanî me didin. Bi sedan gotinên pêşiya yên kurdî nîşan didin ko civata kurd giringîke mezin daye jinan û babeta jinan.[8] Li her heremê angorî zarav û devokan şax û guhartokên wan jî hene. Hemberîhevkirin, danberhevîna wan bêguman gelek balkêş û kêrhatî ye. Xebateke wisan dikare gelek zaniyarî û ahahdariyan derxe holê. Lê belê ev yeka xebateke bi serê xwe ye.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Jin kaniya jiyînê ye

Ji nav gotinên pêşiya yên kurdî de dema mirov motîvên zihniyetên jinparêz (pro-jin) hildiçine, gotina ko bala mirov zêdetir dikşîne li ser xwe, bêguman gotina *jin kaniya jîyînê ye.* Gelo civata kurd çawa xwe gihandiye vê baweriyê? Ji bo peydabûna nifşên nû û berdewambûna mirovatiyê, bi anîna zarokan ve, jin wek fakorekî produktîf, adan û fêkîdar hatiye hesibîn. Bi anîna zarokan, jin bûne nîşana bereketê, wan tam û lezeteke nû daye jiyanê. Wan mirovatî ji windabûnê xelas kirine, anîne vê rojê. Dema mirov malbatên kurdî yên pir-zarok dide ber çavan, ew hezkirina zarokan, wek evîn nêzîkî babet jinan bûye. Ev jinên pir zarok, ji aliyê civatê de awa hatina nasandin: *maka nodik nod canûyî.* Bi vî tehrî jinan, angorî civatê xemlek daye jiyanê, jiyan neqişandiye. Ev hurmeta li dor jinan berev û tîr dibe, di gotineke din de dighêje dereceke here bilind: *jin bedewiya emir e.* Bêguman ev gotinên zêrîn, cihê jinan di civata kurdî de bi şemal û bi tîrejeke gelek tûj ve ronî dikin, serbilindî û rûmeta jinan zêdetir dibiriqînin, nîşan didin. Anîna zarokan ji aliyê jinan de pêşkêşeke here mezin hatiye hesibîn, zarok parçek ji canê xwe hesab kirine. Vê yekê hîsên merhemat, dilşewatî, destvekiriyê, parastin û dilovaniyê li bal jinan zêdetir kiriye. Vê realîtê, jin bi malê ve girê daye: *jina bê zar dilê wê naşewite malê.* Heta mirinê jî, pey zarokên xwe dikevin. Bi kurtî, wek gotineke mayî dibêje: *jin sebir e.*

Di civata kurdî ya îro de carcar dibe mirov rastî rêç û şopa van peyvên delal neyê, jîyîn dikare mirova dilsar û rûsar bike. Lê belê tev van gotinên pêşiya, folklor tenê şîreta me dike, riyên cihaneke dilşa û şaneşîn nîşanî me dike, wek bîr û bawerî dimîne: *berê texte ya jinan bûye.* Ev gotina pêşiya ji alîkî de xirabiyên civata îro, kêmasiyên navbera jin û mêran rexne (krîtîk) dike, ji alîkî de pirên duh-îro-sibê bi tehrekî folklorîk ava û xurt dike. Ji aliyê din ev gotina pêşiya derbarê lêkolîna bingehên malbatên maderşahî (jinhakim/dayîkhakim) de jî, derîkê li pêşiya me vedike, ji me re dibe alîkar.

Kurd zêdetir çi hez dikin? Bersîva vê pirsê di nav romantîkiya kurdan de vejartiye: Kurd ji gişka zeftir jina xwe, hespa xwe û çeka xwe hez dike. Gotineke mayî vê gotina pêşîn hin jî zelaltir dike: *mêrê kurmanc gava têr xwar ya mirovan dikuje, ya jinekê direvîne.* Hemû ev gotinan, beşekî folklorê jî pêk bînin, dîsa wek xemlên jinparêz, der-

barê »siyarên rojhilatê« de me gelekî ronî dikin, çend materiyalên folklorîk pêşkêşî me dikin.

Dema mirov dixwaze bighêje serfirazîkê û bibe xudanê cesaretekî mezin, civatê çend motîvên alegorîk ji rewşa jinê û bedewiya jinê hilçandiye, daye ber çavan. Ev gotinên pêşiya jî nîşan didin wekî civatê rûmeteke çawa bedew daye jinan, çima jin wek pîvan ji xwe re hilbijartiye.

- *Bi xweziya, dest nagihêje baqê keziyan.*
- *Dilê tirsonek sîngê gewr nabîne.*

Dema mirov hemû van gotinên pesndar yên ko derbarê jinan de hatine gotin an jî rewşa jinan dane ber çav, ji xwe re xistine kok, lê belê babetên mayî tînin zimîn, berev dike, mirov dibîne ko, jinan di nav folklora kurdî de ji xwe re textek ava kirine, bi serbilindî dijîn û timê dilşa ne, rû bi ken in.

Jin wekî avakara malê

Çawa tê zanîn civatek, wek komên piçûk ji gelek malbatan pêk tê. Dema mirov hemû van malbatan berev dike û digihîne hev, wê çaxê civatek saz dibe. Gelo ji bo selamet û pêşeroja her malbatekê, erk (wazîfe) û berpirsiyariya mezin kî hildide li ser milên xwe? Bersîva vê pirsê, mirov bi alîkariya gotineke pêşiya ve dikare bide: *avaya malê destê jinan e.* Ev gotina him erkekê, him jî berpirsiyarîkê dispêre jinan. Jin him ji bo parastina zarokan, him ji bo birêvabirina karên hundirê malê, wek paqijî, amadekirina xwarinê û him jî di afirandina berhem û mehsûlekê de timê aktîf e. Gotineke mayî dîsa dibêje: *avahiya malê kebanî ye.* Gotineke nêzîkî vê gotinê jî awa ye: *jin dike malavayî.* Dema mirov van gotinên pêşiya baş, hûr û kûr analîz dike, bi hêsanî dibîne ko jin ne tenê avakarê malê ye, wisan jî îdara malê dike, malê diparêze: *jin gol e, mêr çem e.* Gotineke nêzîkî vê gotinê jî awa ye: *mêr kanî be jin lîç e.* Ango jin berev dike, depo dike û wek bankekê, roleke nîv-aborî dilîze. Peyva lîç bona golên piçûk û berevbûna avê tê bi kar anîn. Ev herdu gotin jî berpirsiyarîke mezin dispêrine jinan, kebaniya malê dibe şênahiya malê: *mal têr e, kebanî şêr e.*

Rûmeta ko civata kurd ewqas daye jinan, nedaye tiştekî mayî. Civatê

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

jin wek nîşana namûsê ya here mezin hesibandiye. Peyva jin gelek caran cihê namusê de tê bi kar anîn. Peyvên namûs û jin ketine zikê hev, wek gotineke pêşiya dibêje: *mêrê kurmanc boy namusê kevçî av de dixeniqe.* Dîsa gotineke mayî giringiya namûsê tîne zimîn: *namûs û xîret ne bi peran e.* Mêr timê namûsa jinên xwe li ser her tiştî re digirin, ji bo namûsa xwe dikarin canê xwe jî bidin. Jin û namûsa wê pirseke hebûn û tunebûna mêran e, gotineke pêşiya vê yekê gelek vekirî eşkere dike: *namûsa jinê, çeka mêr e.* Namûsa jinê dibe namûsa mêran jî: *namûsa mêr jin xweyî dike.*

Cihê dayikan tijî nabe

Dê (dayîk) di folklora kurdî de hurmeteke mezin dibînin. Di warê mezinkirina zarokan de keda dayîkan mezin e. Ev yeka ji ber çavên civatê nereviye, ji ber vê yekê jî civatê di nav hemû kategoriyên jinan de giramî û hurmeteke bêhempa ji bo dayîkan nîşan daye, wek gotineke pêşiyan dibêje: *dayîk hate derda Xwedê rabû berda.* Dema civatê dayîk û bav rûberî hev kirine, dane pêşberî hev, civatê li aliyê dayîkan cih girtiye: *dê ji bav şirîntir e.* Çima gelo ev bawerî bi salan wek gotineke pêşiya li ser zar û zimanê mirovan geriyaye? Bi çend gotinên mayî ve, civatê bersîva vê pirsê jî daye:

- *Dê hejandiye, dê mêjandiye.*
- *Zarok li ser milê dê mezin dibin.*
- *Zarok ya dê ye, ne ya bavê ye.*

Di warê mezinkirina zarokan de keda dayîkan zêde ye, ev peyvên zêrîn ji bo dayîkan hatine gotin. Ji alîkî de her çiqas her jin dayîk nîn be jî, ev peyvan bi tevayî ji bo jinan jî hatine gotin. Çawa em dibînin ew rûmeta ko civatê daye dayîkan, ewqas nedaye bavan, civatê angorî keda mirovan adalet belav kiriye: *bav dimire zar nizanin bavê wan miriye, dê dimire stoyê wan xar dibe.* Ji bo bêsînoriya xirabiya mêrekî nîşan bidin, gotineke pêşiya awa dibêje: *mêrikê xirab, çiçikê diya xwe geztiye.* Her çiqas gotineke pêşiya nîn be jî, dema imkaneke mezin dikeve destê yekî, ji xwe re stareke germîn dibîne, îfadeke kurdî dibêje: *filankes kete zikê diya xwe.* Ji aliyê din, gelek mirov wek kevneşopîkê, erf û edetekî naxwazin nifirên diya wan li ser wan bin,

dema dayîkan şîrê xwe li zarokekî xwe heram kir (wek *şîrê min te heram be!*), êdî ew nefer dikeve bin barekî giran yê ruhî. Dema karê wî di jîyîna rojane de bi hev ne hat, ew sernekeve, ew vê carê van nifirên diya xwe tîne bîra xwe. Civat bi xwe jî van nifirên dayîkan davêje cihekî guhê xwe, di pêşerojê de kontrol dike, neheqiya li dijî dayîkan napejirîne. Bi kurtî angorî materiyalên folklorîk cihê dayîkan zû-zû nayê tijî kirin.

Di folklora kurdî de motîva jana damariyan wek motîveke bingehî tê hesibîn. Dema jina yekî dimire, ew zarokên ko bê dê dimînin, dikevene ber destê damariyan. Lê belê damarî tu wext cihê dayîkan nikarin tijî bikin. Di vê babetê de dayîk û damarî wek du hêzên li dijî hev in. Gotineke pêşiya cihê dayîkan gelek baş nîşan dide: *Wexta dê dimire, destê wê jêkin, pê etîma bikutin.* Ev gotina dixwaze bibêje ko zarokên êtîm dimînin, bira nekevin ber destê damariyan.

Wekheviya jin û mêran

Bi kêmanî gotinên pêşiya û folklora kurdî tu cidatîk wek mirov nexistiye navbera jin û mêran, herdu cins jî wek mirov hesibandiye. Jin, di folklora kurdî de tu wextan piçûk nehatine dîtin, rûmeta wan nimz nebûye. Her çiqas di jiyana rojane de jin carcar piçûk tên dîtin, tên zêrandin, pêpes kirin, hincirandin û ji aliyê mêran de zordestîke mezin dibînin jî, di jiyana folklorîk de em nikarin rastî dinyake wisan tarî bên, xeletî ne xeletiya folklorê ye, ev rewşa xirab bi gelek faktorên mayî ve girêdayî ye. Zordestiya li jinan dibe, gotineke pêşiya gelek vekirî eşkere dike, lê belê rûreş dike: *jin darê şkestî ye.* Ev gotina pêşiya, li ser hîmên baweriya pakî û napakî, rindî û nerindiyê ava dibe, nepakî û nerindiyê protesto dike. Di malê de kesa here xebatkar bêguman kebanî ye. Civatê dîtiye ko, dîsa jî ew ji gelek tiştan bêpar e û ev yeka wek neheqîke mezin dîtiye, rexne kiriye:

- *Kebanî timê bêpar e.*
- *Kebanî ya melûn e, ya mehrûm e.*
- *Jin darê şkestî ye.*

Ev gotinên pêşiya jî nîşanî me didin ko, civatê zordestî û neheqiya li jinan dibe, timê aniye zimîn û ev newekheviya li ber çavên civatê nere-

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

viye, dest daye li ser vê rewşa xirab. Dema em çend gotinên pêşiya berçav dikin, em dibînin ko civatê timê wekheviya jin û mêran li ser her tiştî re girtiye û qet ne be ev wekheviya bi gotin be jî, hêvî kiriye:

- *Dê tev bavê cote bask e.*
- *Şêr şêr e, çi jin çi mêr e.*
- *Jin dîwarê hundir e, mêr dîwarê derva ye.*
- *Jin, mêr takî ne.*

Gotina *şêr, şêr e, çi jin çi mêr e,* çawa em di gelek serkaniyan de rastî wê dibin, êdî bûye nîşana wekheviya jin û mêran. Dema gilî tê ser jinan, bêguman cara pêşîn ev gotina tê bîra mirovan û di nav kurdan de gelek belav bûye, gotineke here populer e. Ev peyvên zêrîn, bawerî û dîtinên civatê yên li ser rewşa jinan gelek bi vekirî diyar dikin. Hemû ev gotinan nayê wê manê ko bi rûçik û karekterên xwe ve, jin û mêr yek in. Civatê ev cidatiya jin û mêran jî tespît kiriye û çend sînor jî kişandine: *jin jin gotî, mêr mêr gotî.* Di zimanê kurdî de peyva serjinik, hinekî jî nezelaliya van sînoran nîşan dide. Çawa tê zanîn ev peyva ji bo mêrê ko zêde serê xwe dixe karê jinan tê bi kar anîn. Ji aliyê din, civatê wekheviya jin û mêran bi zimanekî din, awa nîşan daye:

- *Jin heye ji mêran zêde ye.*
- *Kulfet heye ji sed mêrî zêde ye.*
- *Jina baş ji hezar mêrê xirab çêtir e.*
- *Ji kurê bêxîret, qîzeke kor paktir e.*
- *Qîz hene heft kura nadin.*
- *Qîza filankesê xûna mêrekî ye.*

Di hevbêjeke kurdî de, dema gilî tê ser jin an jî keçeke jêhatî û mêrxas, awa tê gotin: *caba heft mêra dide.* Jinên awa di nav kurdan de *keçebav* tên bi nav kirin. Bi xwe jin be, lê belê bi mêra çûbe, ji wan re jî *mêrejin* dibêjin. Gelek gotinên pêşiya bi eşkere nîşan didin ko tu wext mêr ji jinan hêjatir nînin, ne hêztir û ne jî jîrtir in. Herdu cins jî mirov in û wek hev in, her jins jî angorî keda xwe, hêz û kabîliyeta xwe tevî avakirina malbat û civata xwe dibin. Ji aliyê din, civatê ev yeka jî nîşan daye, wekî him di nav jinan de, him jî di nav mêran de kesên nebaş hene, kesên xirab hene, hemû wek hev nînin.

Dema mêrek dikeve tengasiyê, bêgav û neçar dimîne, cara pêşîn jin tê hewariya wî û mêr xwe davêje li ber bextê wê: *jin kela mêra ye.* Dema xûn dirije, mirov ji hev tên kuştin û dijminatiyên mezin navbera malbat, eşîr û êlên kurdî de pêş da tên, rola jinan mezin dibe. Ji bo sekinandina şer, ew wek hêzên aşîtîxwaz, çareserkar xwe berpirsiyar dihesibînin, pêşiyê li van şerên neheq digrin, xirabiyê naxwazin:

- *Kulfet diçe xûnê, xûn safî dibe.*
- *Mêra xwe avîtin kewarê, jin şandin hewarê.*

Hemû ev gotinan nîşan didin ko çi jin, çi mêr, herdu jî can in, mirov in, herdu jî di tanga (alî) xwe de, dema imkan û mecal têkeve dêst, dikarin bighêjine serfirazî û serketinên mezin, di avakirina civatekê de angorî hêza xwe beşdar û cih digrin. Dema wan dest da dest, pişt dan pişta hev heta mirinê jî, tu hêz bi wan nikare: *jin û mêr tevr û bêr.* Di nav xetên vê gotina pêşiya de jî, mirov dîsa rastî rêç û şopa wekheviya jin û mêran tê.

Motîva jina baş û jina xirab

Di folklora kurdî de civatê her çiqas cihekî bi rûmet daye jinan jî, di navbera jina baş û nebaş de sînorek jî daniye. Bi vî tehrî hertim jina baş rûspî kiriye, jina nebaş rûreş kiriye. Civatê hemû jin nexistine takî teraziyê, ji vê xeletî û şaşiyê xwe parastiye, dûr maye. Ev herdu gotinên pêşiya derbarê vê yekê de me gelekî ronî dikin:

- *Jin jî heye, jinkok jî heye.*
- *Jin ser jinê re heye.*

Berî ko civat bala mirovan bikşîne li ser jinên nebaş, zêdetir rewşa jina baş raxistiye ber çavan û motîva jina baş afirandiye. Bi vî tehrî civatê xwestiye, bingeh û hîmên her malbatekê xweş bên avîtin, sibê-dusibê, di pêşerojê de ji cihê xwe nelivin, neliqin. Çend gotinên pêşiya bi taybetî li ser jinên baş hatine afirandin:

- *Jina ba şbêmene birê mêrê xwe ye.*
- *Jina baş namûsa mêrê xwe ye.*

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

- *Jina baş dûrva kivş e.*
- *Jina baş sebir e.*

Civatê timê baweriya xwe bi jina çê û baş aniye, cesaret daye wan, şahsiyeta wan xurt kiriye û pêş da biriye:

- *Bira jina çê be, bira nav ordiya esker be.*
- *Keça bi esil li nav tabûra leşkerê Romî de be jî, kes pê nikare.*

Gelek gotinên mayî jî hene ko, cidatiya jinên baş û jinên nebaş eşkere dikin, li ser jinên nebaş, xirab rexnan dibarînin:

- *Axiriya diranê dêşe kişandin e, jina xirab berdan e.*
- *Jin heye gula mêrê xwe ye, jin heye kula mêrê xwe ye.*
- *Jin heye bira ye, jin heye birabir e.*
- *Jin jî hene, jan jî hene, merhema dilan jî hene.*
- *Jina çê meriva dike wezîr, jina xirab merivan dike rezîl.*
- *Kulfeta xirab mêran serberjêr dike.*
- *Jina xirab bênamûsiya komê ye.*

Di civata kurdî de, her wisan jî di gotinên peşiya de komeke jin, jinê here xirabtir hatine hesibîn. Bi taybetî jinên xebergerok, virvirî, dikin bilebil, zêde xeber didin, kûdkudo û pîrhevok di folklora kurdî de timê di nav kategoriya »jinên xirab« de cih digrin. Carcar dema em rastî çend motîvên ko jina serberjêr dikin, rûmeta wan winda dikin tên jî, ev gotinan ne hemû jinan, tenê ji bo jinên xirab hatine bi kar anîn. Ji ber ko dema em naveroka çîroka peydabûna van gotinan raçav dikin, em dibînin ko cara pêşîn jineke xirab bûye bayisê peydabûna van gotinan, ne jin bi giştî. Ji ber vê yekê jî element û motîvên li ser jinan timê pozîtîf in, her çiqas çend motîvên negatîf hebin jî, ev yeka jî mercên piçûkdîtina jinan yên dîrokî ve girêdayî ye, bi taybetî yên olî û pederşahî...

Salên keçîniyê

Di jiyana her jinekê de salên keçîniyê (keçtî) cihehî bi taybetî digrin û pişti gelek salan dîsa dem-dem tên bîranînê: *pîrî û kalî roja reş e, qîztî*

û xortî gula geş e. Di her malbatekê de hebûna keçan wek xeml, nexş, şênahî û dewlemendîkê hatiye hesibîn. Civatê keç ji hemû xirabiyê parastiye, nexwastiye navê wan xirab derkeve, di nav civatê de sosret û rezîl bin. Keç hene, di civatê de bûne xweyê rûmeteke mezin: *qîza filankesê xûna mêrekî ye.* Ev guhdariya ko civatê li ser keçan pêk aniye, bêsedem nîne. Ji ber ko keç ji bo etabeke jiyanê ya nû xwe amade dikin, pêwist e ew di nav xweşî û selametiyê de mezin bibin, navên wan dernekeve xirabiyê:

- *Bira mirov ziyareta xirab bike, navê qîza xirab neke.*
- *Bira qîzê bibin ser xençerê, nebin ser xeberê.*

Dema keçek mezin dibe, tê salên mêrkirinê, gelo ev keça azep û xama nesîbê kê ye? Bersîva vê pirsê, çawa em dibînin di çend gotinên pêşiya de gihiştiye zelalîkê. Gotinek dibêje: *keç ziyaret e.* Çawa tê zanîn hejmara kesên ko diçin ser ziyaretan zêde ne. Di nav van kesan de, gelek dilketiyên keçikê hene, keç ji nav van kesan yekî ji xwe re wek mêr hildijbêre. Civatê bi alîkariya vê tespîtê xwastiye pêşiya mêrkirinên bêdil raweste, alternatîfên cida cida, imkanên teze pêşkêşî keçan bike, toleransekê peyda dike. Civatê xwastiye bibêje ko bi darê zorê tu tiştek naçe sêrî:

- *Keçik wek sêva darê ye, herkes kevirê xwe davêjê, kî bixe wî re ye.*
- *Qîz heye dara rez e. Hatî û çûyî kewtiyê xwe davêjê.*

Ji aliyê din li ser keçan pêkanîna zordestiyê û di malê de zêde hiştin û girtina keçan ji aliyê civatê de baş nehatiye dîtin, ew wek mêvanên ezîz hatine ezimandin:

- *Qîz ewledê xelqê ne.*
- *Qîz mêvanê malê ne.*
- *Qîz zebeşê gihiştî ne.*
- *Keç hewsar nabe.*

Jiyan ji bo her keçekê wek xewnekê ye, xewnerojekê ye. Ji wana gelek dilçivîk in, di nav gelekan de xortxapînokî dibe edetekî, bi şeng û şepaliya xwe tên nasîn: *dengê qîzan zû diçe kuran.* Ev rewşa keçan ji ber

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

çavê civatê nereviye: *ro çû dîza, bû fitara qîza.* Çawa gelek zane dibêjin, bi hatina baharê ve hîsên evînê, hevhezkirinê zêde dibin. Gotineke pêşiya bandûra baharê li ser keçan bi vî awayî tîne zimîn: *bahar e, qîzik çi har e.* Peyva harbûnê, li bal keçan zêdebûna hîsên seksuel nîşan dide.

Bi kurtî ew qîmetê ko civatê daye keçan, tê wê manê ko daye jinan jî. Keç bûne nîşana hebûna mirovan û komê:

- *Bedew, gund tînin ber çav.*
- *Bavê bê qîz, çiyayê bê av e.*
- *Qîzê kê hene, ew padşa ye.*

Ji aliyê din civatê hebûna keç û kuran ewqas zêde mezin nekiriye, bi giştî zarok wek şirînaya malê ditiye:

- *Qîz hene heft kura nadin.*

Şerê bûk û xwesûyê

Dema her keçek mêr dike, ji bo wê jiyaneke nû jî dest pê dike. Rojên keçaniyê êdî xelas dibin. Bûktî jî wek keçaniyê di jiyana her jinekê de dikare bibe perîyodeke dilşa. Eger di malê de xasî hebe, hejmara zarokan jî zêde be, êdî salên keçanî û bûktiyê dûr dikevin: *qîztî çiqayî xweşe, bûktî gula geşe -wexta dikeve ber darê derûşê, per û baskê wê diweşe.* Di gotineke mayî de bûk dîsa gilî, gazin û loma dike: *bûme bûk, bûme pepûk.*

Di her malbateke nû pêkhatî de, di malê de li ser parevekirina îktîdarê û birêvabirina karên malê, gelek caran di navbera bûk û xwesûyê de dijayetî, nerehetî û şerên mezin dikarin dest pê bikin. Gelek caran dema keçek mêr dike, tê malê, ne tenê rastî mêrê xwe tê, wisan jî rastî diya mêrê xwe tê û ev pîrejina dibe xwesûya wê. Angorî xwesûyê, ew rewşa malê ji bûkê çêtir zane û ji ber ko demekê di avakirin malê û mezinkirina zavê de keda wê zêde derbas bûye. Ew dixwaze hertim gotinên wê bên cih, naxwaze ev bûka nû li ser wê re be. Ev rewşa nû gelek caran dibe bayisê parçebûna malbatan, sedemêm lihevnekirinên bûk û xwesûyê, bûk û zavê û dê û kur. Navê bûkê gelek caran xirab derdikeve: *bûka xeniqandiye heft xasî, ji bilqîniya cêr tirsî.* Carcar

pêwendiyên bûk û xwesûyê serast dibin, di malê de xweşî û rehetîk peyda dibe: *bûka çê ye, xasî dê ye.* Ji bo ko di malê de hertim xweşî û dilşahî hebe, diya kur berî zewacê çavê xwe digerîne wekî »bûkeke baş« ji »xwe« re û keçeke rind ji kûrê xwe re bibîne. Eger keça birakî wê hebe, vê yekê jî bona pêşeroja xwe, pişt guhê xwe re navêje. Çend gotinên pêşiya vê yekê gelek başeşkere dikin:

- *Bûka xala delaliya mala.*
- *Bûka apê kete kapê, bûka xalê delaliya malê.*

Êdî »keseke xerîb« û »keçen xelqê« di malê de tune. Pêwendiyên bûk û xwesûyê angorî dê û bavê keçikê, rewşa malbata wê, ji hev cida dibin. Çi dibe, bira bibe şerê bûk û xwesûyê naqede, heryek tanga xwe de royê dibîne:

- *Bûk anî leze, da ga û peze, sivika malê dîsa eze.*
- *Bûkê tune zar û ziman, xwesûyê tune dîn û iman.*
- *Bûk heye tifaqa malê xweyî dike, bûk jî heye xirab dike.*

Demeke wisan tê êdî rehetiya bûkê qet namîne, xwaziya xwe li rojên bihurî tîne, keçaniya xwe digere. Firsend têkeve dêst, îro jî dixwaze here mala bavê:

- *Bûk wisan mala bavê hez dike, wekî îznê bidî wê pêxas jî here.*
- *Berê bûkê têkeve mala bavê wê - wê bi serserê xwe jî here.*
- *Mala mêrê jinê xezne be jî, dîsa çavê wê mala bavê ye.*

Bêguman ev daxwaziya vegera malê, ne tenê bi derdê xwesûyê ve girê daye. Gelek faktor û sedemên mayî jî li ser vê vegerê bandûrekê nîşan didin, wek bîranîna »rojên keçaniyê«...Bi kurtî şerê bûk û xwesûyê, wek şerê hewiyan di folklora kurdî de cihekî fireh digire.

Neçariya jinebiyan

Dema mêrê jinekê dimire, ew jina bî dimîne, di kurdî de jê re dibêjin *jinebî.* Ji bo jinekê windakirina mêr, bûyereke gelek tirş û tal e. Çend dijwarî, serêşî û tengasiyan peyda dike. Tenêmayîn ewqas ne hês ye. Ji

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

aliyê din ji nû ve mêrkirin û zewaceke nû jî ewqas ne hêsa ye. Eger mêr li pey xwe zarok jî hiştibin, wê çaxê rewşa jinebiyan hin jî xirabtir dibe. Tenêmayîn bi serê xwe êşeke mezin e û bala her kesî li ser jinebiyan e: *jina bî nakeve tu mala.* Jinebî ji ber şikbirinê, ji ber navê wê xirab dernekeve û ji bo selameta zarokan gelek caran naçe der û cînaran, mala xwe dimîne: *jina bî zef jê tê xeberdan.* Ev dorgirtina civakî, gerîna gilî û xeberan lingê jinebiyan dikine soleke teng, neçarî û bêgavî wan gelek diêşîne û ji şerma nizane çi bike: *jina bî dest ber rû ye.*

Ji aliyê din, piştî mirina mêr, civat berpirsiyariya parastina zarokan jî dispêre jinebiyan. Ev yeka bona wan barekî giran e. Rojên kêf, xweşî û eşqê êdî qediyane. Naxwazin bi dîtina mêrekî din, navê wan xirab derkeve. Çawa tê zanîn mesajên wek »jina bênamûs xirabiya komê ye« guhên wan qûl dikin. Bi vî tehrî her tişt li ber çavên wan reş dibe, bîna wan gelek caran teng dibe. Bi kurtî jiyan bona jinebiyan bi piranî tarî û sar dibe, nizanin çi bikin: *jina bî mîna meha Adarê ye, geh digrî, geh dikene.* Ji ber van êşên jinebiyan, ew navbera du avan de dimînin, careke din mêr bikim an na? Bersîva vê pirsê, ewqas ne hêsa ye, ji ber vê bêgaviyê navê jinebiyan carcar xirab derdikeve: *jina bî du rû ye.*

Dema jineke yekî dimire, eger zarokên wê malbatê hebin, rewşa mêr jî wek jinebiyan gelek xirab dibe. Tijîkirina cihê jina berê ewqas ne hêsa ye, bi mirina jinê, per û baskê van mêrebiyan -j inmiriyan yekten dişkên, diweşin: *jin dimire, mêr serbirî dibe.*

Protestoke dijî pirjiniyê

Di nav gotinên pêşiya yên kurdî de beşek gotin jî, çawa tê xuyan li dora temaya pirjiniyê berev dibin. Em ji vê yekê derdixin ko, civatê ev tehrê zewacê nebaş dîtiye û serda çûye. Anîna jineke nû, ne ji aliyê zarokan de, ne jî ji aliyê dayîkê de hatiye pejirandin û ew li dijî anîna vê jina nû derketine. Ev jina nû ji aliyê zarokan de wek *jinbav,* ji aliyê dayîkê de jî wek *hewî* hatiye bi nav kirin. Hatina hewiyê di pêwendiyên jin û mêr de qelîştekekê peyda dike û di malê de dibe sedemên dilsarîke mezin. Civatê zêdetir êrîş biriye ser bavê, ew protesto û rûreş kiriye, wek gotineke pêşiya dibêje: *mêrê du jina du rû ye.* Di malê de serdestiya kîjan jinê hebe, bêguman statûya jina din dikeve, qedrê wê namîne. Pêwendiyên mêr bi kîjan jinê re xurt bin, bi kîjan jinê ve kêfa wî zêde tê, ew jina dibe jina here berbiçav û serdest.

Jina ko rûmeta wê zêde namîne, bi piranî jina yekemîn e, wisan nîn bûya, mêr jina duwemîn nedianî (hejmara jina dikare bighêje sisê û çaran jî). Jina ko dibe gula malê û şirîna malê, zêdetir jina bedew, ciwan û jina ko salê wê hindik in. Çi dibe bira bibe, bi taybetî jina yekemîn, dema jineke mayî tê ser wê, ji vê rewşê xirabtir, rewşeke din nabîne: *Bira meriv here ser sêwiya, neçe ser hewiya.* Carcar herdu jin jî, ji rewşa hewîtiyê aciz in. Nerazîbûna herdu aliyan qet nebe li ser tema pirjiniyê dibe sedemê hevra peyivîn û dîalogê. Lê belê tecrubên pirjiniyê çawa nîşan didin, jina yekemîn hatina jina duwemîn wek afatekê dibîne: *jin dibê bira bextê min hebe, bira çavekî min tune be.* Jina paşîn ji bo ko xwe têxe çavê mêrê xwe, ji destê wê çi tê dike, bi mêrê xwe ve dizeliqe û vê gotina pêşiya ji xwe re dike guhar, dixe guhê xwe: *jin dikare mêra mîna destmalan li ser destê xwe bigerîne.* Ew, vê nêzîkayê hin caran li dijî jina yekemîn bi hostatî û bi zanetî bi kar tîne, carcar mêr û jina pêşîn berî hev dide, rûmeta wê hildide bin piyan, wê pêpes dike. Civatê bi çavekî baş hatina hewiyê nenihêriye û ew pîroz nekiriye: *jina paşîn mîna pînê berovajî ye.* Jina pêşîn bi hatina jina paşîn ve, gelek diêşe, ber xwe dikeve, êdî dibe xulam û berdestîke malê. Ji aliyê din her çiqas, mêr çend rojên xwe bi kêf û eşq derbas dike jî, di malê de bêpergalîke mezin dest pê dike û rewşa malê serobino dibe: *Heçî merivê mala xwe bi destê xwe xirab bike, bira du jina bîne.* Gotineke mayî jî awa dibêje: *kebanî bûn sêsê, kodik li ber sê.*

Wek jana hewiya, janeke mayî jî jana jinên bira ne. Çawa tê zanîn gelek malbatên kurdî, malbatên fireh in, di malê de çend bira bi zar û zêçên xwe ve dikarin bijîn. Lê belê carcar dubendî û nerehetiyên navbera jinên wan her diçin mezin dibin. Li ser parvekirina karên malê bi hev nakin, dibin dijminê hev. Çend gotinên pêşiya li ser jinên bira ne, li ser jintiyan in:

- *Jinê bira meriva dikin şîva gura.*
- *Jina bira nola gura.*
- *Jintiya hev ra kire bilebil, bira hev ra bûne derd û kul.*

Jin û namûs

Civatê sînorên namûsê û bênamûsiyê gelo angorî kîjan bingehan kişandiye? Dema mirov derbarê vê yekê de çend bawerî, agahdarî û

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

zaniyariyan ji nav gotinên pêşiya hildiçine, li ser kûr difikire, mirov dibîne ko him jin, him jî mêr piştî zewac û mêrkirinê pêwist in, hin »kincên nû« li xwe bikin, gavên xwe bi pîvan bavêjin. Ew divê li pey jin û mêrên mayî negerin û çavên wan ne li der be: *her kezîsorek, simbêlsorek li ber heye.* Şaxeke mayî ya vê gotinê jî awa ye: *her kezîzerek simbêlsorek li hember e.* Dema du kesan biryar girtin wekî bizewicin, pêwist e li ser biryarê xwe bisekinin. Di navbera wan de peymanek hatiye girêdanê: *jin û mêr ne fînoyê sor in, hero serê yekî bin.* Çi jin, çi mêr be, herdu jî angorî vê peymanê nikarin wek rojên keçanî û xortaniyê pey yarên teze bin, pey dilketiyên nû bin. Dema jin û mêr ji hevre ne helal bin, wê çaxê dubendî û serêşiyên mezin dikarin derkevin rûyê avê. Ev serêşî heta mirin û kuştinê jî diçin. Di rewşeke awa de dîsa em tên li ser motîva »jina xirab« û »mêrê xirab«. Ji bo çareserkirina vê êşa ko nayê kişandin, civatê derîk vekirî hiştiye: hevberdan (telaq). Gotineke pêşiya bi vekirî bona jin û mêrên ko hero dikevine qirika hev, ji wan re riya xelasiyê nîşan dide: *berdana jinê edetê dinê.* Mirov nikare bibêje timê jin dibin sedemên malxirabî û hevberdanê, civatê wisan jî kêmasiyên »mêrê xirab« jî nîşan daye. Gotineke pêşiya derbarê vê yekê de çarçavekê pêşkêşî me dike, bi kêmanî jinê rûspî derdixe: *çiqas jine rind be, dîsa mêrî tol e.* Çawa tê xuyan ne tenê jin, dema li malê de nerehetî peyda bûn, mêr jî dibin sedemên hevnekirinê. Li ser bênamûsiya »jina xirab« gelek gotinên pêşiya hene:

- *Kulfeta bêesil pêşa xwe davê li ser serê xwe.*
- *Dêlik ne bi ba be, kûçik nare cem.*
- *Jinê dil kir dîwar qûl kir.*

Tiştekî balkêş jî ew e, di nav gelek bêjebendên (tabîr) kurdî de, jinên xirab ji aliyê namûsê de bi tehrekî gelek tûj hatine rexne kirin, cidatiya wan û heyanan tune ye, ew wek *dêlik, kelb, çêlekan* hatine bi nav kirin. Ji ber ko li bal heyanan pîvanên edeb û ehlaq ji ortê rabûne, jinên xirab jî wek wan heyanan hatine dîtin:

- *Çêleka nava boxa.*
- *Çêleka çil boxe.*
- *Kelba heram.*
- *Dêlka nava gund.*

- *Dêlka doxê.*
- *Bûye dêla ser cewra.*

Dîsa çend bêjebend ji aliyê namûsê de jinan rûreş dikin, rexnan li wan dibarînin, wek:

- *Dawa xwe avêtine ser serê xwe.*
- *Delinga xwe herimandin.*

Gelo van jinên ko ji aliyê civatê de hatine gunekar kirin, navê jinan bi gişt̂ çiqas xirab derxistine? Gelo hemû jin wek van jinên xirab hatine dîtinê? Gelo tevlihevîke awa, yekkirineke awa, li ser pêkanîna suretekî jina xirab di nav civatê de bandûreke çawa hiştiye? Bersîvên van pirsan, dikarin cihê jinan gelekî zelatir û baştir bidin xuya kirin.

Ji aliyê din carcar mêr bêsebeb, bi jinê re şer dike, gelek tiştan ber xwe derdixe û dikare îftirayên mezin jî bavêje jinê: *li jina xwe meniyan bû, digot gava tu hevîr dikî quna xwe dihejînî.* Kumreşî, dexesî, çavnebarî û hesûdî di nava cotên wisan de gelek fire ye. Behecokî canê herdu aliyan jî dixwe û timê herdu alî jî şikê dibine hev: *dilê wî baltûza wî girtiye, meniya jina xwe digere.*

Civat di nav gelek salan de gihaye wê baweriyê ko ji alîkî de zewac, ji alîkî de yartî bi hevre nameşin. Hebûna her pêwendîkê, tunebûna pêwendiya din bi xwe re tîne, civatê gotina xwe awa kurt biriye:

- *Kî hêviya yarê ma, bê jin ma.*
- *Jin, mêr ne fînoyê sor in, hero serê yekî bin.*

Çend gotinên pêşiya ko hene erk û berpirsiyariyê jin û mêran yên şevê, yên cînsî (seksuel) bi vekirî tînin bîra wan:

- *Jina zû radize mêrê xwe zû kal dike.*
- *Zilam hertim dixwaze, lê hertim nikare, pîrek hertim dikare, lê hertim naxwaze.*

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Serkanî

1) Heciyê Cindî, *Meselok û Xeberokêd Cimaeta Kurda,* Erîvan, 1985.
2) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Mesele û Metelokên Kurdî.* Weşanên Ronahî, Zurîh, 1976.
— Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Mesele û Metelokê Cimaeta Kurd,* cilt I–II, Erîvan, 1969–1971.
— Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Gotinên Pêşiyan* (bi rûsî), Moskova, 1972.
3) Hûseyîn Denîz, *Gotnê Pêşyê Kurda,* Îstenbol, 1991.
4) A. Balî, *Gotinên Pêşiyan Ên Kurdî,* Istenbol, 1993.
5) Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe,* cild I, Stockholm, 1987, Gotinê Pêşiya: rûp. 10–30.
6) Mele Mehmûd Dêrşewî, *Miştaxa Çiya-Ji Gotinên Pêşiya,* Stockholm, 1989.
7) M. U. Xamoyan, *Ferhenga Kurdî-Rusiye Firazêologî,* Erîvan, 1979.
8) Ji bo ko xwendevan wan gotinên pêşiya yên ko li ser babeta jinan hatine gotin bi hêsanî bibînin, li ber destên wan bin, em piraniya van gotinên pêşiya angorî rêza alfabetê li jêr pêşkêşî xwendevanan dikin:

Avaya mala destê jinan e.
Avaya malê kevanî ye.
Axiriya diranê dêşe kişandin e, jina xirab berdan e.

Bihar e, qîzik çi har e.
Bav dimire, zar nizanin bavê wan miriye, dê dimire stoyê wan xar dibe.
Bayê gurkirî, jina virkirî, ji wanan tiştek dernayê.
Bavê bê qîz çiyayê bê av e.
Bavê pak mezelê wî ber derê qîzê ye.
Bedew gund tînin li ber çav.

Berê texte ya jinan bûye.
Berdana jinê edetê dinê.
Berê bûkê têkeve mala bavê wê - wê bi serserê xwe jî here.
Bextê dê cihêzê qîzê ye.
Bi xaziya dest nagihêje baqê keziyan.
Bila jin çê be, bira nav ordiya esker be.
Bila keç be, bira pîr be.
Bira kurek bibe, navê qîza lê daynin.
Bira li xêra birê bûna, jina birê mehir nedikir.
Bira meriv here ser sêwiya neçe ser hewiya.
Bira meriv ziyaretê xirav bike, navê qîzan xirav neke.
Bira serî hebin, kum gelek in.
Bira qîza bibin ser xençerê, nebin ser xeberê.
Bûk bi dilê zavê ye.
Bûk heye, kula xwesûya xwe ye.
Bûk heye tifaqa malê xwey dike û bûk jî heye bela dike.
Bûk li hespê ye, kes nizane nesîbî kê ye.
Bûk li me şerm dike, rû digre, zik vedike.
Bûk li hespê ye, kes nizane kesîbê kê ye.
Bûk siyarê hespê ye, kes nizane qismetê kê ye.
Bûk wisan mala bavê xwe hez dike, wekî îznê bidî wê pêxas jî here.
Bûka apê kete kapê, bûka xalê delaliya malê.
Bûka malê rewşa malê.
Bûka malê raza qîz anî , gotin gunekarî ya xulam e.
Bûka malê şuxil de xwe dixapîne, xortan re kefçî û kodika tîne.
Bûka çê ye û xasî dê ye.
Bûkek anî leze, da ga û peze, sivika malê dîsa eze.
Bûkê tune zar û ziman, xwesûyê tune dîn û iman.
Bûkê xala, delaliya mala.
Bûkê xeniqandiye heft xasî, ji bilqîniya cêr tirsî.
Bûme bûk, bûme pepûk.

Çavê melle ser bûka cînara ye.
Çiqa jina rind be, dîsa mêrî tol e.

Damarî nabe dê û dak.
Dayîk hate derda, xwedê rabû berda.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dê bû, lê bû dêmarî.
Dayê bibîne, dotê bistîne.
Dengê qîza zû diçe mala kura.
Dê bibîne û qîzê bihebîne.
Dê bû dêmarî, bav bû filê Kavarê.
Dê çî ye, dot jî ew e.
Dê, dotê şer kir, kêmaqila bawer kir.
Dê hejandiye, dê mêjandiye.
Dê ji bavê şirîntir e.
Dê û law şer kir, bêaqila bawer kir.
Dê tev bavê weke cote bask e.
Dêlik ne bi ba be, kûçik nare cem.
Dilê tirsonek sîngê gewr nabîne.
Dilê wî baltûzê girtiye, meniya jina xwe digere.
Dilê dê dotê jî hev dimîne.

Eger ez bibim keç ez zanim ezê doxîna xwe çend cara girê bidim.
Eva dil e ne savar e, parîkî lêdixe dibuhir e.
Ew pîreke zemanî ye, gelek gilî bin wê de hene.
Ez dibêm: xadimim, ew dibê: ji lawik û qîzikan çi xeber.

Ga bide ga miriya, jin bide jinmiriya.
Gerekê bûk bi dilê zavê be.
Gotin »apo jina te kevir e«, got »ji minetê çêtir e«.
Gula sûretê jinan, mêr e.

Her kezîzerekê, simbêlsorek li ber e.
Her kezîsorek, simbêlsorek li hembere.
Heta dilê dê nekevê, qîzê nadê.
Heta xanim xemilî, def û dewat kemilî.

Jin bedewiya emir e.
Jin çav li der e, mêr xalî li ser e.
Jin dara şkestî ye.
Jin dîwarê hundur e, mêr dîwarê derva ne.
Jin dibê bira bextê min hebe, bira çavekî min tune be.
Jin dikare jina rê dagerîne, mêr nikare jina rê dagerîne.

Jin dikare mêra mîna destmala ser destê xwe bigerîne.
Jin dike malavayî.
Jin dimire, mêr serbirî dibe.
Jin dinê de tu tiştî dizîva cem xwe xweyî nake, xenjî dilketiyê xwe.
Jin gol e, mêr çem e.
Jin ew e, zarê xwe xweyî ke.
Jin hene, beranberî sed mêrî ne.
Jin heye gula mêrê xwe ye, jin heye kula mêrê xwe ye.
Jin heye, ji mêran zêde ye.
Jin heye bira ye, jin heye birabir e.
Jin heye, zeviya ber gund e.
Jin jî hene, jan jî hene, merhema dila jî hene.
Jin jî heye, jinkok jî heye.
Jin jin gotî, mêr mêr gotî.
Jin kela mêra ye.
Jin kaniya jîyînê ye.
Jin kela ye, mêr girtî.
Jin ko heye nola marê nîvkuştî ye.
Jin ko hez bike dikare kevir qûl bike.
Jin mêr rûspî dike.
Jin mêr takî ne.
Jin mêra natirse wekî şerma wê tune be.
Jin ser jinê re heye.
Jin stûna malê ye.
Jin şûrê pişta mêrê xwe ye.
Jin û mêr, tevr û bêr.
Jina başbêmene, birê mêrê xwe ye.
Jin tenê xwe şerm dike, kesekî şerm nake.
Jin û mêr ne fînoyê sor in, hero serê yekî bin.
Jina başji hezar mêrên xirab çêtir e.
Jina baş sebir e.
Jina bedew bela seriyan e.
Jina bêxwedî har dibe, mêrê bêxwedî jar dibe.
Jina bêxweyî şerm nake.
Jina bê zar dilê wê naşewite malê.
Jina bî nakeve tu mala.
Jina bî zef jê tê xeberdan.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Jina bî mîna meha Adarê ye, geh digrî, geh dikene.
Jina bî dest ber rû ye.
Jina çê mêr radike.
Jina çê meriva dike wezîr, jina xirab meriva dike rezîl.
Jina du dotan, dide xwe du lotan, ne li vir ne jî li Cizîra Botan.
Jina kê baş e, mala wan timê dewat e.
Jina kudkudo nekeve destê dijminê min.
Jina kotî mêrê baş kotî dike.Jina baş mêrê kotî baş dike.
Jina mêr be, dibê: dûrî min here hespê min texe.
Jina nedelal çavê mirovan diêşîne, jina delal dilê mirovan diêjîne.
Jina paşîn mîna pînê berovajî ye.
Jina xirab, ne tê kuştin, ne jî tê berdan.
Jina şermîn bi milletekî, mêrê şermîn bi kirasekî.
Jina qenc seyd e, ya xirab qeyd e.
Jina te kîderê, tu jî ji wê derê.
Jina xirab bênamûsiya komê ye.
Jina xelkê ramûsanek, hespê xelqê meyîdanek.
Jina wî jin e, loma mala wî rengîn e.
Jina zû radizê, mêrê xwe zû kal dike.
Jinê bira meriva dikin şîva gura.
Jinê bira nola gura.
Jinê dil kir dîwar qûl kir.
Jinê dil kir mêrê xwe sil kir.
Jinê go: Bira ez jina mêrê çê bûma, bira ez rojekê rûyê dinê bûma.
Jintiya hevra kire bilebil, bira hevra bûne derd û kul.

Kebanî timê bê par in.
Kebanî ya melûn e yan mehrûm e.

Keç hefsar nabe.
Keça mîran bi qelendê gavanan nayê.
Keçik wek sêva darê ye, herkes kevira davêjê, kî bêxe wî re ye.
Keçik ziyaret e.
Kî hêviya yarê maye, bê jin maye.

Kulfet diçe xûn, xûnê safî dibe.
Kulfet şurê dudev e li pişta mêr.

Kulfet ko heye parsûyê xar e.
Kulfet neynika malê ye.
Kulfet heye sed mêrî zêde ye.
Kulfet heye ceh dike genim, kulfet heye genim dike ceh.
Kulfeta bêesil pêşa xwe davê li ser serê xwe.
Kulfeta bî durû ye.
Kulfeta çê be, mêr jî pê re çê dibe.
Kulfeta destdirêj timê, rûreşe.
Kur darê bavê hiltîne, qîz teşiya dayê hiltîne.
Kulfeta dizî kir, wê bê berdanê.
Kulfeta eslê wê cî, tî be an birçî, bikujî cîkî de naçî kulfeta xirab mêran serberjêr dike.

Kur li bavan diçin, qîz li diyan diçin.
Kurd ji gişka zeftir jina xwe, hespa xwe xwe û çeka xwe hez dike.

Li jina xwe hêcetê dibêjît: Tu çima qûna xwe li ber bêjingêra dihejînî.

Mal têr e, kebanî şêr e.
Mala bê jin mîna aşê xirabe ye.
Mala mêrê jinê wekî xezne be jî, dîsa çavê wê mala bavê ye.
Mala ko jin nexwaşe, derê xwe kilît e.
Malê de tune arvanok, navê jinê dînanok.
Memikê qîza zeynet in, kelaxê pîrê robet in.
Mêrê kurmanc gava têr xar ya mirovan dikuje, ya jinekê direvîne.
Merîkî xirab e, ewî çiçikê diya xwe gestiye.
Meriv ser xîret û namûsa xwe dimire.
Mêr jî hemû ne yek in, jin jî hemû ne yek in.
Mêr û jin hevra rik, xirab dibe ew malik.
Mêr kanî be, jin lîç e.
Mêra xwe avîtin kewara, jin şandin hewara.
Mêrê başjina wî xurt e.
Mêrê du jina durû ye.
Mêrê Kurmanc boy namûsê kevçî av de dixeniqe.
Mêrî du jinik hêsîr e.
Mêrik li jina xwe meniyan bû, digot gava hevîr dikî qûna xwe dihejînî.
Mirikê xirab, çiçikê diya xwe geztiye.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Namûsa jinê çeka mêr e.
Namûsa mêr jin xweyî dike.
Ne jina belaş, ne xulamê be meaş, ne erdê kaş.
Ne jina kenokî, ne mêrê şermokî.

Parsûya jinê xar e, loma îtîbara wê tune.
Pîr bi ganekî nabe qehbik.
Pîrê bawer ne dikir mêr ke, ko mêr kir dewa heftek û heştekan kir.

Qîz ewledê xelqê ye.
Qîz çira xelqê ye.
Qîz hene heft kura nadin.
Qîz ko heye dara rez e, hatî û çûyî kewtiyê xwe davêjê.
Qîz mêvanê malê ye.
Qîz zebeşê gihiştî ye.
Qîza bêqelend zimandirêj e.
Qîza filankesê xûna mêrekî ye.
Qîzek nazand û gundek bezand.
Qîzê kê hene, ew padşa ne.
Qîzê dil kir, tas avît, dîwar qûl kir.
Qîztî çiqayî xweşe, bûktî gula geşe, wexta dikeve ber darê dergûşê, per û baskê wê diweşe.

Reva jinê edetê dinê.
Rewşê jinan kofî ye.
Rewşê qîza kezîn e.
Ro çû dîza, bû fitara qîza.

Şêr şêr e, çi jin çi mêr e.
Şerê kûçikan li ser dêlan in.
şêwra jina bêriya bizina.

Usa milahîm e, mîna qîza kezî.

Xew nema li piçûka, fedî nema li bûkan.

Yekî jina xwe berdabû, digot were bibe yara min.
Yê jinê berde li paniyê nanêre.

Wextê dê dimire, destê wê jêkin, pê êtîma bikutin.

Zar ya dê ye, ne ya bavê ye.
Zarok ji bavê de êtîm namînin, ji dê de êtîm dimînin.
Zaro li ser milê dê mezin dibe.
Zilam hertim dixwaze, lê herim nikare. Pîrek herim dikare, lê hertim naxwaze.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— BEŞ III —

Di destanên kurdî de serdestîke jinan

Di destanên (beyt, serpêhatî) kurdî de gelek realîteyên jîyînê hene. Jîyîn timê dikele û jîndariya van berheman me gelekî ronî dikin, şemal û tîrêjên berfireh belav dikin. Ji bo ko dinya me hîn jî xweşiktir bibe, me di nav ronahîke mezin de dihêlin û mesajên gelek xurt dighînin me. Di rojên teng de tên hawariya me mirovan, ji me re dikarin bibin referansên pir giranbiha. Ji bo ronîhîkirina cihê jinan di civata kurd de, ev destanan gelek rênîşandar in. Çawa em ê paşê jî bibînin cure cure materiyal folklorîk û edebî pêşkêşî me dikin.

Dema mirov destanên kurdî baş analîz dike û tê de kûr dibe, di nav van destan, serpêhatiyên nav û deng de em rastî serdestîke jinan tên. Jin di van berheman de xwedî erk û berpirsiyar in, hevsazî û pêşketina bûyerên van destanan de roleke mezin dilîzin. Ew, timê li dijî neheqî û bêdadiyê radiwestin, ber xwe didin. Di van destanan de tekoşîneke jinan heye. Jinan bi xwîna xwe ve be jî, di dinya van destanan de ji xwe re textek ava kirine. Ji bo bicihanîna daxwazî, hêvî û xewnerojên xwe timê ya xwe kirine. Bêdilî, dudilî an jî bêgavî di biryarên wan de kêm tê dîtin. Ew di vî warî de gelek serhişk in û gelek caran ji bo dilketiyê xwe dimrin, canê xwe didin. Ji ber vê yekê jî, di van destanan de em rastî tradejiyên mezin tên. Di destanên kurdî de reng û tehrê bûyerên bingehî, çawa em dibînin bi destê wan diguhirin an jî ew bi xwe dibin bayisê bûyerên giring. Di pêkanîna avahiya bûyerên destanê de û di warê zelalbûna mesaja van berheman de, em dikarin bêjin ko mêrxasên jinîn roleke berbiçav dilîzin. Hemû şax û guhartinokên van destanan de, jin di rêke rast û qenc de dimejin. Him ji bo azadiya xwe (emancipation), him ji bo azadiya welatê xwe, him jî bona mafên mirovî, çawa em dibînin ew xwe davêjin nav agirên mezin. Dema mirov hemû van destanan û şaxên wan rûberî hev dike, hemberî hev dike, mirov dibîne ko gelek babetên hevpar û hevreng di naveroka

wan de hene. Gelek caran mêrxasên jinîn, mêrxasên mêrîn dixin bin bandûr û kontrola xwe, mêran ji xirabiyê, ji rojên reş diparêzin û riyên rast nîşanî wan didin. Heta niha rûberîhevkirina destanên kurdî zêde nehatine pêkanîn. Ne tenê rûberîhevkirina wan, ev berheman îro çawa em dibînîn hê nehatine berev kirin, derbasî li ser kaxiz jî nebûne. Ji ber van dijwariyan, imkan û mecala li ser van berheman kar kirin, lêkolîn çêkirin jî bêguman jar û qels dikeve an jî pêk nayên. Dema mirov van berheman rûberî hev dike, mirov rastî zaniyarî, agahdarî û encamên gelek giranbiha tê. Ji ber ko ev hezaran sal e, ev berheman li ser zar û zimanê gel digerin, gel jî bawerî, gotin û ceribandinên xwe yên bi salan tevî van berheman kirine, ew dewlemend kirine, tehr û rengekî nû dane wan. Di dawiyê de ev berheman bûne dewlemendîke folklorîk.

Di vê lêkolîna xwe de em dixwazin qasî 20 destanên kurdî û serpêhatiyên gel yên navdar rûberî hev bikin û di naveroka van berheman de tenê cihê jinan, serdestiya wan, rol û berpirsiyariya wan tespît bikin û xwe bigihînên çend nêrîn û baweriyên hevpar û gîştî. Motîva jinan, evîn û zewac û mêranînê di folklora kurdî de motîveke gelek xurt û fireh e. Le belê di vê lêkolîna xwe de zêdetir em dixwazin li ser destan û serpêhatiyên gel, beytên kurdî bisekinin. Berhemên ko li ser babeta jinan agahdarî û zaniyariyên balkêş tê de hene, di nav folklora kurdî gelek in. Di van destanan de babeta jinan babeteke bingehî e: Memê Alan û Zîna Zêdan, Siyabend û Xecê, Ker û Kulik, Binefşa Narîn û Cembeliyê Hekkarê, Mem û Eyşê, Zembîlfiroş, Sêva Hecî, Menşa Eliyê Selim Axa, Kela Dimdimê, Filîtê Quto, Bişarê Çeto, Saliho... Ji der van destanan çend destanên mayî jî, bi taybetî din av kurdên Îranê de belav bûne, paşê hatine berev kirin, gelekî balkêj in, wek Ferx û Xatun Astî, Şor Mehmûd û Merzingan, Mehr û Wefa, Behram û Gulendam...[1] Lêkolînvanê elmanî Oskar Mann, cara pêşîn bi firehî çend destanên kurdî him berev kirin, him jî ew wergerandin zimanê almanî, wek du pirtûk çap kirin, wek Laz û Xezal, Nasir û Malmal, Qer û Gulîzer. Çend destanên heta niha neberevkirî weşandin.[2] Bêguman gelek destan û serpêhatiyên gel yên mayî jî hene ko dikarin di vê babetê de alîkariya me bikin û me ronî bikin. Bi taybetî çend destanên ko di nav gelên rohilatê de belav bûne, wek Leyla û Mecnûn [3], Usif û Zelêxe[4] û Rustemê Zal[5] gelek destan hatine ketine zimanê kurdî. Ji der şaxên destanên kurdî, çawa em dibînin çend şaxên van

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

destanan yên edebî jî, paşê ji aliyê nivîskarên kurd de hatine amade kirin. Rûberîhevkirina şaxên folklorîk û edebî jî angorî her destanekê dewlemedî û rengînîkê pêşkêşî me dikin. Ji aliyê din çend destanên ko di zimanê kurdî de zêde belav nebûne, ji aliyê kurdan de hatine wergerandin, jîyîna folklorîk û edebî di nav kurdan de ji bêtamî û rijîtiyê hatiye parastinê, wek destana Ferhat û Şirîn... Angorî çend serkaniyan vê destanê, Ferhat bi xwe ji malbateke kurdî hatiye.[6] Lê destan bi xwe gelo di nav kurdan de çima ewqas belav nebûye? Bersîva vê pirsê jî gelek balkêş e. Dengbêj û destanbêjên kurd, gelek destanên rohilatê bi motîvên kurdî ve dewlemend kirine, xemilandine, li gelek cihên Kurdistanê şaxên van destanan peyda bûne. Ji van destanan û şaxên wan beşek hatiye berev kirin, êdî bûne kerîkî edebiyata kurdî ya anonîm. Lê belê vê lêkolîna me ya bi sînorkirî, wek xebat, armanceke wisan fireh nedaye pêşiya xwe, ji bo ko hemû destanên kurdî yên naskirî şaxên wan yên folklorîk û edebî pêşkêşbike, rûberî hev bike. Ev xebata me di vî warî de tenê gavek e, bêguman gaveke pêşîn û piçûk e, ji kurtenotan pêk tê, divê gavên mayî bên pêkol kirin. Ji ber ko lêkolînên li ser destanên kurdî, ne tenê problematîka folklora kurdî, wisan jî dikarin gelek pirsên, edebî, civakî, etnografîk, dîrokî ronî bikin, sînorên van warên lêgerînan nêzîkî hev bikin.

Di destanên kurdî de struktura bingehî – dijayetiya sêserî

Destanên kurdî de babeta ko bala me zêdetir dikşîne li ser xwe, ev serpêhatiyên evîndariyê yên romantîk in ko li ser sînorên mirin û kuştinê şax vedidin. Piraniya wan bi bûyerên rûsar, xemgîn û nedilşa ve xelas dibin. Beşên van berheman yên fînalê, encamê gelek dramatîk in. Bayîs û sedemên pêşketina van bûyeran, bi baweriya me, di nav van destanan de peydabûna rekabeta destxistina jinê ye. Bi taybetî du mêr (dilketî) dibine evîndarê keçekê, bi keçikê ve dibin sê kesan, ev pêwendiyên sêserî û sêber demek tê, êdî her diçin berbi xirabiyê dimeşin. Ji van hersê kesan re tu rêke xelasiyê namîne. Ji herdu raqîbên mêrîn yek tu gavekê şunda navêje. Hebûna yekî tunebûna yê mayî bi xwe re tîne. Carcar him jin, hem jî dilketiyê yekemîn di vî şerê sêserî û sêber de tên kuştin an jî, ji qehra dijwariyên mayî can didin, dimrin. Raqîbê duwemîn çawa em dibînin, pêwist nîne dilketîk be,

carcar jî ew dê û bav, ap an jî hêzên mayî in. Ew nigê dilketiyê yekemîn û jinan dixine soleke teng, dijwarî û serêşiyên mezin peyda dikin. Ji bo ko du dil nebin yek, gelek caran jî xwîn dirije an jî dilketîk ji ber êş û jana dilan dimire. Di destanên kurdî de bêguman gelek strukturên mayî jî hene. Lê belê struktura here balkêş struktura dramên sêserî an jî sêber in.

Di dawiya destanên kurdî de, evîna du dilan gelek caran dibe sergêjî û serêşîke mezin. Ji bo çareserkirina van serêşiyan çawa em dibînin mêrxasên van destanan canê xwe didin, dibin gorî, di nav van goriyan de hejmara jinan zêdetir e. Ji ber ko ew di bin zordestîke mezin de ne. Di navbera du avan de dimînin, nizanin çi bikin û dihelin diçin. Ew, mirinê wek riyeke xelasiyê hildijbêrin. Di destana şêx Ferx û Xatûn Astî de her çiqas motîvên pro-jin hebin jî, bi taybetî mirina Astiyê, vê struktura pêwendiyên dilketiyan gelek vekirî nîşan dide, bi taybetî beşa dawiyê. Dema Ferx û Astî mezin dibin, dilê wan dikeve hev, çawa em ji destanê fêr dibin, ew gelek ji hev hez dikin. Dilê yekî bi navê Uso jî dikeve Astiyê, ew hertim li pey Astiyê ye. Du xuşkên Astiyê jî hebûne, navê wan Naz û Nazdar in. Rojekê ev hersê xuşk û Ferx bi tevayî diçin hewz, avjenî dikin, xwe rût û tazî dikin dikevine avê. Ji ber ko Ferx avjenî nizanibûye, ew li qiraxa hewz disekine, li wan mêze dike. Piştî demekê bavê Astiyê, ji keça xwe dipirse wekî ew dixwaze mêr bike an na, eger dixwaze, bi kê re? Keça wî her çiqas dibêje ez mêr nakim jî, paşê bav jê derdixe ko dilê wê di Ferx de heye, dibêje »evîn ji xwedê ye« û keça xwe dide Ferx. Paşê Ferx diçe Bexdayê, demeke dirêj li wir dimîne, Astî ji derdê Ferx ker û gêj dibe. Rewşa bavê jî xirab dibe, ji ber neçariyê mecbûr dimîne keça xwe Astiyê dide şivanê xwe, navê wî Şaxol bûye. Ferx bi alîkariya qulingan bi Astiyê re deng dike, jê re naman dişîne. Ji derdê dilan, Astî nexwaş dikeve. Piştî demekê jî dimire, wek destana Leyla û Mecnûn ew kincên Leylayê xwe dike û xwe reş girê dide. Paşê Ferx vedigere, berî ko bê cihê mala bavê Astiyê, ew rastî şivanekî tê, ew şivan Şaxol bûye, şivanê ko Astî bêdil girtine danê. Paşê Ferx ji vî şivanî fêr dibe ko, Astiyê can daye, çûye dilovaniya xwe. Destan, bi vê xebera tirşû tal ve xelas dibe, êdî em pê nizanin çi tê serê Ferx? Piştî mirina Leylayê çawa Mecnûn jî dimire, sedî-sed dinya Ferx jî serobino dibe. Kes Astiyê nakuje, ew bi xwe can dide.[7] Lê belê dema mirov rewşa Astî di nav de maye, mêze dike, wê çaxê mirov dibîne ko ew nemiriye, derdê dilan ew kuştiye, ew hatiye

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

kuştinê. Ji ber ko berî nexwaş bikeve, can bide, ew bi xwe re şer dike, bi mercên dorberê xwe ve şer dike, berxwe dide, êdî dora wê ewqas teng dibe, dinya wê tarî dibe, tu rêke xelasiyê namîne, nikare ji êşa dilan bifilite. Ji ber vê yekê jî mirov nikare bibêje Astî miriye, bi rastî Astî hatiye kuştinê. Bi vê perspektîfê, bi vê nêrînê ve mirov rewşa ko jin di nav de nin, çêtir û baştir fam dike.

Tiştê herî balkêş, di nav vî şerê sêserî û dijwariyên mezin de çawa em dibînin jinên kurd dîsa jî ya xwe dikin, mirin jî tev hemû rîsk û telukeyan didin ber çavan. Ji bo ko bigihêjin bext û mirazên xwe, ew her riyên xelasiyê diceribînin, baweriya xwe winda nakin, dilketiyê diwemîn, dê û bavê xwe, apên xwe û hemû hêzên mayî yên ko li pêşberî dilşahiya wan dibin asteng, davêjin alîkî û riya xwe de dimejin. Ev babeta, di tekoşîna xelasiya jinan de wek gaveke giring dikare bê hesibîn.

Di hemû destanên kurdî de ev tekoşîna azadiyê, wek mesajên protestoyê û wek rûreşkirina erf û edetên kevn, li dijî hêzên feodal, hêzên zordar bi rastî hêjayî peydaniyê ye. Di destanên kurdî, di serpêhatiyên kurdî de, beşeke problematîka xelasiya jinan jî, rev e, ne reva bi zorê, reva ji du dilan pêkhatî. Dema keç ji xelasiya xwe re rêkê nabîne, vê carê bi dilketiyê xwe re direve, bi gotineke mayî hev direvînin, dema mirov li ser vê struktura xelasiyê difikire, mirov dibîneke ko rev ji alîkî de protestokirina pêwendiyên nemirovî û paş damayî ye, kakilê tekoşîna xelasiya jinê ye. Ji ber vê yekê jî her revek, di nav van mercan û rewşê de riya xelasiya jinan fireh dike, riya zewacên bêdil dixitimîne, zihniyetên paşverû dirizîne, diqelêşe û pûş dike. Her çiqas di dawiya revê de serêşiyên nû peyda bibin jî, di vî warî de gava here çêtir rev e. Ji ber ko tu rêke mayî namîne, dora cotan tê girtinê, çembera zordestiyê her diçe teng dibe. Di çend serpêhatiyan de çawa em dibînin êdî roj, roja revê ye. Di serpêhatiya Hesenê Mûsa de rojên revê nêzîk dibin, nefreta li dijî bav her diçe zêde dibe:

Wele bi xwedê min didinê û min nadinê
Min nadinê ezê kincê xwe bişînim
Ser boyaxê reşkirinê,
Ezê mara mêra piştî çavê reş û belek,
Li xwe heram kim li darê dinê.
De hey wax, mala minê.
Sola torinê mala Mûsa qetiya ji çûyînê, ji hatinê.

Cilê mala bavê min qetiyan ji danînê, ji raxistinê,
Guhê dêka min qul kirin bi galgalê, bi gotinê...[8]

Ev berxwedana vê keça bi navê Hedo, gaveke gelek radîkal dikare bê hesibîn. Hesen kesekî xerîb bûye, diçe gundê mala Qaso cîwar dibe û dilê wî dikeve keça wî Hedo. Ji ber ko kesekî xizan û kesîb e, keçikê nadinê, paşê bi hevra direvin û çîrok her diçe dirêj dibe. Di her destan, her serpêhatîke kurdî de nefreteke mezin li dijî zewacên bêdil heye. Di stranekê de ev hêrs û rik dighêje xizemên poza, wan dilivînin, keç naxwaze wê bidin van kesên li mala wan berevbûyî, hatine xazgînî:

Xwazgînçiyê li mala bavê min rûniştî
Qelendê min digot, xelatê min dibirî
Xizemê bozê min mîna çerxa felekê li hev dizvirî.[9]

Dema mirov destana Memê Alan û Zîna Zêdan (Mem û Zîn) mêze dike, tiştê bala mirovan zêdetir dikşîne ser xwe, bêguman pirsa azadiya jinan e. Zîn, di vê destanê de nîşana azadiyê ye. Ev keça kurd, ji bo ko bigihêje mirazê xwe, li dijî birayê xwe – mîrê Cizîra Botan, fend û fêl, dek û dolavên Bekoyê Eyan bi xurtî radiweste, van pêwendiyên nemirovî bi mirina xwe ve protesto dike. Ev serhildana keçekê li dijî mîrekî karekî ewqas piçûk û hêsa nîne. Dîsa jî ew ya xwe dike, ji bo evînê ker û gêj dibe. Di dawiya destanê de çawa em dibînin, ew vê dinyayê protesto dike û jê bar dike, can dide.

Di destana Mem û Zîn de tiştekî balkêş yê mayî jî, dema Mem diçe dîtina Zînê, dibe mêvanê hersê biran (Hesen, Çeko, Qeretacîn), ev biran ewqas bînteng û aciz nabin, çawa tê zanîn Zîn dergistiya birayê piçûk, Çeko ye, ew sê sal in dergistî ne. Dema Mem qutiya dilê xwe vedike, qala Zînê dike, di vê malê de em rastî tu serhişkî, nerazîbûn, dexesî (hesûdî) û serhişkîkê nayên. Di vê beşê destanê de tolerans, nermayê û hevtêgihiştineke bêhempa peyda dibe, serî şkandin, çav derxistin, boz jê kirin nayê bîra tu kesî, her tişt bi hemdî xwe dimeşe. Çeko jî tev, ev hersê biran naxwazin serêşiyên mezin peyda bibin (her çiqas Zîn dergistiya wî be jî). Ez bawer dikim, di dawiyê de Çeko jî têdighê, wekî dema Zîn yekî dinê dixwaze, wê çaxê tiştekî mirov bike êdî nemaye, ew wisan difikire. Ji aliyê din ev hersê bira jî derbarê Mem de dighêjin bawerîkê: »*...ji bo evînekê welatê xwe berdaya*«.[10] Ew xortê ko

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

ji Yemenê [11] rê dikeve dilezîne, hespê xwe çargava dajo, wekî zûtirekê dilketiya bibîne, tempoya jîyînê di destanê de ji yekten bilind dike. Ew naxwaze agirê evînê vemire, dixwaze vî agirî bike agirekî herdemî di jîyîna keç û xortan de. Ji ber van rastiyan ev hersê bira jî, bi çavekî fîlozofîk hêjabûna evînê dipîvin, dinirxînin û evînê li ser her tiştî re dibînin. Ev hersê biran angorî van realîtan pêwendiyên xwe bi Mem ji nû ve careke din berçav û serast dikin. Ji aliyê din jina birayê mezin Hesen, ew jina bi navê Stî hemû imkanan ji Mem re amade dike. Hesen, Mem dibe »hêla jinan«, nasiya wî û jinan dide hev. Di destanê de rola Stiyê tim û tim qenc û pozîtîf e. Hesen û jina wî dixwazin ji hevevîniya van herdu dilketiyan re bibin alîkar û tu alternaîfeke mayî nabînin. Di vê beşê destanê de hurmeteke mezin ji bo jinan peyda dibe. Dema Zîn biryarê xwe diguhirîne – Çeko berdide, dilê wê dikeve Mem – ev biryara dijayetîkê di nav vê malbatê de peyda nake. Hemû ev yekan nîşan didin ko, wê demê gotin *»gotina jinan«* bûye.

Di destanên kurdî de gelek caran em rastî rêça rûçik û sûretên civata maderşahî – civata ko bandûra dayîkan û jinan lê zêde ye – tên. Di çend destanan de serdestiya jinan zêdetir e. Ew xwe nadin hincirandin, êşandin û zêrandinê. Ew di her wargê jîyînê de xwedî maf in, serbest in. Di destana Laz û Xezal de, em rastî civateke wisan tên li wir jin hakim in. Xanzad, piştî mirina bavê xwe dibe seroka eşîra Balekiya. Hejmara malbatên vê eşîrê hezar hefsed bûye û hemû rêvabirina karên eşîrê dikeve li ser milên wê. Ev yeka jî nîşan dide ko di salê gelek kevn de serdestîke jinan hebûye.

Di destana Laz û Xezal de strukturekî pêwendiyên cida peyda dibe. Vê carê du keç (Xanzad û Xezal) dibin evîndarê Laz. Ji der pevçûna ser keçan, ve carê em rastî pevçûn an jî rekabeteke li ser xortan tên. Herdu keç jî bi aktîfî tevî vê rekabetê dibin, giranî û bandûra xwe nîşan didin. Ji ber vê yekî jî, ev destana ji destanên kurdî yên mayî parîkî cidatir e. Laz û Xanzad kurap û dotmamên hev in, nîşaniya wan dibe, piştî mirina bavên Laz û Xanzadê, rêvabirina karên malbatên eşîra wan dikeve li ser milê Xanzadê (nîşaniya Laz). Ji ber ko Laz vê nîşaniya xwe ber dide, vê carê dibe evîndarê keçeke ji eşîreke mayî, navê wê Xezal e. Dilê wan gelekî dikeve hev, nazewicin, lê bi hevra radizên, bi hevra dimînin. Di navbera van herdu keçan de bivê-nevê dilsarîk peyda dibe. Lê belê herdu jî heta mirina Laz pêwendiyên xwe, silavên xwe ji wî qût nakin. Ev ev herdu keç her çiqas ji hev sar bûne, dijî hev in û

naxwazin Laz ji destê xwe derxin jî, dîsa jî roja mirina Laz, di şîna wî de beşdar dibin, bi tevayî wî hildidin, dikine gorê. Paşê Xanzad lêdixe diçe nav eşîra xwe, Xezal li wir dimîne.[12] Destana Laz û Xezal, ji alîkî de wek destana Ferx û Astî ye. Di herdu destanan de dijayetîke sêserî heye. Di destana Ferx û Astî de struktura mêr û jin û mêr, di destana Laz û Xezal de struktura jin û mêr û jin, pêwendî û bûyerên ko di van destanan de hene, di bin bandûra xwe de dihêlin, ji hev cihê dikin. Ji aliyê din di herdu destanan de evîndarîke romantîk heye. Herdu destan wek stran, dilok û helbestan gelek lîrîk in. Ji aliyê din, di salên kevn nav civata kurd de ji bo ronîkirina cihê jinan, ev destanan gelek hînkar û rênîşandar in.

Dijminên du dilan û çar çavan

Bêbextî, nokerî, xayîntî, dilreşî û fêlbazî wek element û motîvên negatîf di destanên kurdî gelek caran dibin sedemên bêmirazî û bedbextiyê. Di destana Mem û Zînê de, serpêhatiya Bekoyê şeytan, çawa me li jorê jî got, di jîyîna Mem û Zînê de dibe sedemê felaketeke mezin. Di destana Şor Mehmûd û Merzingan de, ev herdu dilketî jî dibin goriyê dek û dolab û fend û fêlan. Angorî destanê Şor Mehmûd û Merzingan di zaroktiya xwe de dest pê dikin hev hez dikin, bi hev re mezin dibin û di dawiyê de dizewicin. Şor Mehmûd dibe kesekî gelekî jîr û mêrxas. Apê wî Mamereş mêze dike ko Şor Mehmûd hêdî hêdî dibe telukekê ji bo wî. Ew ditirse, wekî rojekê Şor Mehmûd serkariya êla wî têxe destê xwe û wî bêrûmet bihêle. Demek tê Şor Mehmûd dixwaze dergistiya xwe Merzinganê hilde here. Ap naxwaze Merzinganê bidê. Gelek difikire, di dawiyê de dibêjê, eger tu herî şer zora dijminê min bibî, bi serfiraz vegerî ezê Merzinganê bidime te. Dema Şor Mehmûd ji şer bi serfirazî vedigere tê, piştî çendekî dema ew ji xwe re diçe nêçîrê, Memereş ji vê herêmê mala xwe bar dike diçe, welatekî mayî. Merzinganê jî dibe û destê evîndaran ji hev diqetîne. Di rê de Merzingan bi dizîka diçe li ser pirekê, ji kendalekî de xwe davêje nav gêjavê diqeniqe. Berî ko xwe bavêje ew bi pirevan re deng dike, wekî eger yek bipirse bira bibêje Merzinganê xwe avîte nav gêjavê. Paşê Şor Mehmûd tê wekî Merzinganê xelas bike, ew jî xwe davêje nav avê, avjenî nikaribûye bike û di dawiyê de ew jî dixeniqe. Dema bavê wê pê dihise tê li dor avê ji pirevan dipirse, wî Merzingan dîtiye

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

an na? Pirevan vê bersîva jêrîn dide:

Birao, derdê min giran e,
Nizanim li kê bikim nifirane,
Qîza tu dibêjî navê wê, Merzingan e,
Rawesta bû li ber van qiraxane,
Nifir dikirin li dayîk û bavane,
Ji derdê evîndariyê xwe avîte nav pêlên van avane,
Ji ber wê Şor Mehmûd jî xwe avîte nav gêjavane,
Niha gora wan bûye zikê masiyane.[13]

Heft xarziyê Memereş hebûne. Ew gelek mêrxas û cengawer bûne. Wan gelek Şor Mehmûd hez dikirin. Dema ew dibîsin ko ev bela mezin hatiye serê Şor Mehmûd û Merzinganê, hespên xwe siyar dibin, diçin pêsîra Memereş digrin, bi şûr û xenceran wî parçe parçe dikin. Paşê diçin cenazê wan ji nav avê derdixin, mêze dikin ev herdu dilketî di paşla hevda, hev hemêz kirine. Ji wan re dewateke bi nav û deng çê dikin, dibêjin ew li vê dinyê dilşa nebûn, qet nebe bira li dinya dinê bi hev şa bin.

Çawa tê xuyan, ev destana kurdî ji alîkî de wek destana Mem û Zîn di dawiyê de dibe destaneke bêmirazan. Di destanê de xayîntî û bêbextî tê protesto kirin, li dijî nepakî, neqenciyê dengên gelek xurt hene. Bi taybetî xwe xeniqandina Merzinganê di vî warî de wek protestoke mezin dikare bê hesibîn. Di destanê de dinênasiya kesên wek Memereşyên xayîn tê rûreşkirin.

Çend keçperî û pîrejin

Di destana Memê Alan û Zîna Zêdan û çend destanên mayî ji der mêrxasên mirovî, em çend mêrxasên wek cin, keçperî û kesên nexuyanbar jî dibînin. Ew dikevine dilqê (rol) jinan. Di destanan de roleke alîkarî û piştevaniyê dilîzin, wek pîrhevoka bi tirs û xof nîn in. Ev mêrxasên çîrokî, pêwendiyên dilketiyan re gelek caran dibin alîkar, nasiya wan didin hev û van dilketiyan dixin xewnên hev. Di destana Mem û Zînê de navên sê keçikên padişahê periyan derbas dibe: Tavbano, Hîvbano, Stêrbano. Ev keçên dilsoz û evînparêz biryar digrin ko bifirin herin Cizîra Botan. Ew dişin dikevin oda Zînê, wê hil-

didin tînin dixin xewna Memê. Piştî vê bûyerê Memê, li ser Zînê dibe evîndar û ker û gêj dibe. Çawa di destanê de tê xuyan, ev hersê keçê periyan guneyên van herdu keç û xortan (Mem û Zîn) hildidin li ser stoyê xwe. Di destana Sêva Hecî de jî, em rastî çend keçên wek van periyan tên. Di şaxekê vê destanê de navê yekê Gulçîçeka Dilan[14], di şaxeke mayî de navê wê Pîra Miraza[15] û di şaxeke mayî de jî Qîza Qenc[16] derbas dibe. Gulçîçeka Dilan, diçe Mîr Mehmûdê Cindî tîne, dixe oda Sêva Hecî, wan bi hev dide nasîn.

Ev periyên jinîn (femînîn), di çend destanên mayî de jî çawa em dibînin enînivîs, bext û mirazê keç û xortan tayîn dikin, evîn, merhamet û alîkariyê li ser mirovan de dibarînin. Ji der van periyan, di çend destanên mayî de, em rastî çend motîvên wek pîr û pîrejinan jî tên ko mirazan dighînin hev, di pêwendî û kontaktên navbera jin û mêran de roleke aktîf dilîzin. Ew gelek rîsk û telukayan jî didin li ber çavan, xwe davêjin nav êgir, di navbera dilketiyan de, ji ber ko zêde şik naçe li ser wan, xeberan dibin û tînin û dibin serkaniyên îstîhbaratê. Ji bo ko salên wan bihurîne, tecrubeyên wan yên jîyînê zêde ne, di van destanan de gelek caran keç û xort xwe davêjin pêsîra wan û alîkariyê ji wan hêvî dikin û baweriya xwe jî, bi wan tînin. Di destana Mehr û Wefa de, dema Wefa diçe hawariya dilketiyê xwe – Mehr, ew tê girtin, wê bi darê zorê direvînin, di rê de ew rastî pîrejinekê tê, hal û hewalê xwe jê re dibêje, ev pîrejina van gotinan paşê dibe dighîne Mahir.[17] Di destana Rustemê Zal de, Rustemê Zal berî ko bavêje li ser dijminên xwe, cara pêşîn dibe mêvanê van pîrejinan. Bi kurtî di destanên kurdî de ev fîgurên jinîn yên ko di beşeke van destanan de derdikevin pêşberî me, di warê pêkhatina kontaktên giring de cihekî yekemîn digrin û rolên aktîf dilîzin.

Jin di rêke rast de dimeşin

Di destanê kurdî de dûrdîtiniya jinan, çawa di van berheman de diyar dibe, gelek tûj e. Ji ber vê yekê de jî, ew di rêke rast de dimeşin. Piştî destana Memê Alan û Zîna Zêdan destana ko di nav kurdan de zêdetir belav bûye, destana Siyabend û Xecê ye. Destan, li ser evîna Siyabendê Silîvî û Xeca Resûl ava dibe. Wek gelek destanên mayî, di vê destanê de jî Siyabend û Xecê nagihêjin mirazê xwe. Lê belê ew evîna ko di vê destanê de pêl û pêl mezin dibe, hemû dijwarî, xirabî û

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

tiştên neçê di bin siya xwe de dihêle, wan difetisîne û bêrûmet dike. Dema mirov vê destanê baş analîz dike, mirov têdighê ko mêrxasa jinîn – Xecê paşerojê angorî Siyabend baştir dibîne û gavên xwe bi pîvan davêje. Di beşeke vê destanê de Xecê xewnekê dibîne û dikene, vê xewna xwe ji Siyabend re şiro vedike, Siyabend bêsebeb, vê xewnê şaş fam dike. Pey wan pezkuviyên ko Xecê di xewna xwe de dîtine, dikeve. Ken û gotinên Xecê şaş fam dike, hildide li ser xwe, diltenikiya xwe zû eşkere dike û vî kenî bi keçeliya xwe re girê dide. Ji nav wan duwanzdeh pezkuviyan yekî digre dikuje, pezkûvî jî lêdixe wî ji kendalekî de davêje, dikuje. Paşê navê wî dibe: *nêçîrvanê ko ji aliyê nêçîra xwe de tê kuştinê.* Ev beşa dawîn ya destanê, mesaja destanê gelek bi vekirî radixe li ber çavan, Siyabend xeletiya xwe, bi zimanê xwe eşkere dike:

Çawa min ji hev qetandiye destê nêrî û bizinê
Ewî usa ji hev qetandiye destê mêr û jinê.[18]

Dema Siyabend dixwaze nêrî bigre, wê demê nêrî û bizin li bal hev bûne, zirareke wan negihiştiye tu kesî. Ev serhişkiya Siyabend ji ko tê? Çawa em ji despêka destanê de fêr dibin, zaroktiya wî qet baş derbas nebûye, bêdê û bêbav mezin bûye. Ew di zaroktiya xwe de kesekî şerût bûye, bi dorberê xwe, bi hevalên xwe re zêde bi hev nekiriye, wek misal riya jina gavanê gund digre... Ji aliyê din ew keçel û gurî bûye, bêguman wî ev yeka wek kêmasîkê di xwe de dîtiye û xwastiye vê kêmasiyê bi tehrekî mayî, bi rêke din tijî bike. Bi çi tehrî? Siyabend çawa em dibînin dibe kesekî problematîk. Ev şahsiyeta wî ya parçekirî di dawiyê de dibe bayisê mirina wî û mirina Xecê jî. Xecê naxwaze wekî Siyabend here wî pezkûvîyî bikuje, gunê wê bi van pezkuviyan tê, lê belê Siyabend wê guhdar nake, ya xwe dike.

Ev serhişkiya Siyabend, di destana Ker û Kulik de serhişkiya van herdu birayan tîne bîra mirovan. Di vê destanê de diya van herdu kuran naxwaze wekî kurê wê herin bi her heft birayên wê re şer bikin. Lê belê ew gotinên diya xwe guhdar nakin, diçine şer. Çawa tê zanîn di dawiya destanê de Kulik tê kuştin, gotinên diya wan Werdekê rast derdikevin. Dûrdîtinî, rastzanîn û famdariya Werdekê wek Xecê vê yekê nîşanî me didin wekî di destanên kurdî de jinên kurd hertim serdikevin û di rêke rast de dimeşin. Ew rênîşandar in, bi şîretên xwe

ve pêşengiya mêrxasên van destanan yên mêrîn dikin.

Ji aliyê din, him di destana Siyabend û Xecê de, him jî di destana Ker û Kulik de zordestîke mîrên ereban jî heye. Xecê berî ko bi Siyabend re bireve, çawa tê zanîn dergistiya kurê mîrê ereban bû. Ker û Kulik jî, bona herin hespekî bi navê Bêcan jê re bînin, ji aliyê mîrên ereb de tên seferber kirin, mîrên ereb van herdu xortan li ser xalên wan de dişînin wekî bi xalan re bikevin şer. Lê belê Ker naxwaze diya wî tenê bêxweyî bimîne. Ji ber vê yekê jî kuştina heft xalên xwe nafikire, wê çaxê diya wî dikare bikeve destê mîrê Ereban. Angorî Kulik, Ker çêtir difikire û gavên xwe bi pîvan davêje. Di dawiya destanê de, çawa em dibînin Kulik tê kuştin, keça mîrê ereban –Têlî Rewşen Xatûn jî para Ker dikeve.

Di destpêka destana Ker û Kulik de, dema bavê Werdekê naxwaze keça xwe bide Silêman, Silêman Werdekê direvîne. Bav pey keça xwe dikeve, Werdek kevirekî hildide bavê dixe, dikuje.[19] Ev yeka jî nîşanî me dide ko, dema keça kurd dil kir, dilketiyê xwe û mirazê xwe ji ser her tiştî re digre, xwe davêje nav agirên mezin. Ew dikarin li dijî biryarên dê û bavên xwe jî derkevin. Ew di vî warî de serhişk in û gelek caran ber xwe didin. Di çend destanên mayî de jî, çawa em dibînin li dijî dê û bavên neheq mixalefeteke mezin heye. Ev dê û bavên neheq neyên kuştin jî, nifirên mezin li wan tên kirin, ev nifiran angorî çend destanan tên cih jî. Di destana Ferx û Astî de, Ferx nifirên mezin li dê û bavê xwe dike, di nav heftekî de him dê, him jî bavê wî dimire.[20] Bi saya motîva nifiran, mirov fam dike ko, kî dibe bira bibe, pêwist e kes nekeve orta du dilan û çar çavan. Ev bawerî di destanên kurdî de gelek xurt e. Çima piraniya nifiran ji devê jinan, bi taybetî ji devê dayîkan derdikevin û ev nifiran tên cih? Bersîva vê pirsê diçe dighêje mezinbûna neheqiya li jinan tê kirin. Jin hêrs, nefret û rika xwe di pratîk de nîn be jî, bi zar û ziman (verbal) diyar dikin. Ev yekan realîteke jîyînê îfade nekin jî, wek realîteke zimanî, gelek caran rastî realîteyên jîyîne jî tên, dibin bûyer. Ji ber ko kesên xirabiyê dikin, di pêşerojê de çi wê bê serê wan, mirov kêm û hindik, sedî sed nîn be jî, jê derdixe. Jin bi vê baweriyê ve nifiran dibarînin. Ji ber tecrubeyên jîyînê, jin di warê nifirbarînê de dighêjin aqilmendîke mezin û tenik.

Di vê babetê de serpêhatîke here balkêş jî, serpêhatiya Filîtê Quto ye. Angorî vê serpêhatiyê li welatê Mamê Etmanîk xela hebûye. Wan nikaribûne debar û abora xwe bikin. Ew ji eşîra Reşkota bûye.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Karvanê xwe amade dike, diçe bajarê Batmanê wekî aborî û debara zarokên xwe bike. Lê belê ev navça di bin konrola Filîtê Quto de bûye, bac û bertîl ji karvanê ko dihatine vê navçê distend. Ew rêbirekî nav û deng bûye. Dema dibhîse ko Mamê Etmanîk hatiye hêla Batmanê, mirovên xwe berev dike, diçe li ser wî. Şerekî mezin di nav wan de dest pê dike. Di dawiya vî şerî de him Filîtê Quto, him jî Mamê Etmanîk tên kuştinê. Piraniya stranên ko li ser Filîtê Quto hatine gotin, ji devê diya wî Şemê derketine. Ev jinika, kurê xwe neheq dibîne, pişta kurê nake, kirinên wî cih de nabîne. Her çiqas kurê wê nîn be jî, ew pişta Mamê Etmanîk digre. Filîtê Quto guh nade şîret û gaziyên diya xwe, di dawiyê de tê kuştin û diya wî dilorîne: *»Filîto lao, were neçe pêşiya vî kervanî!...*[21]

Ji aliyê din ev dayîka kurd ji vî şerê xwexwetiyê jî nerazî ye. Ew zane ko ev şerên neheq tenê kêfa hêzên dijmin, hêzên neyar û dewletê tîne:

Bitlîsê dergevana derge vekir
Donzde beyraqê Alî-Osman şede, îspat,
Şerê Filîtê Quto, Memê Etmê temaşe kir.[22]

Ji bo mêran danîna çend merc û hoyan

Di destanên kurdî de dema kesek daxwaziya zewacê dike, ji aliyê jinê de çawa em dibînin hin merc û hoy tên pêşkêş kirin. Pêwist e ko mêr zîrekî û jîrîtîkê nîşan bide. Ew pêwist in ya herin li ser dijmin an jî karekî mezin biqedînin. Eger ew di van seferan de sernekevin, ji wan re imkana keçdayînê namîne. Çima ev dijwarî û zehmetî tên pêkanîn? Bersîva vê pirsê mirov dikare bi sê tehrî şiro veke:

A) Bi pêkanîna micizeyan ve destan tempoke bilind bi dest dixe.

B) Bi van pêşdanînan ve, dê û bav dixwazin, zavayên xwe yên nû, jin jî dixwazin dilketiyen xwe biceribînin, başbûn û qenciya wan bi çavên xwe bibînin.

C) Di hin karên pratîk de ji van dilketiyên nû îstîfade bikin.

Di destana Ker û Kulik de, ji bo keça mîrê eraban ji xwe re bixwazên, ew pêwist in, herin hespekî navdar ji nav eşîreke mayî birevînin bînin. Diya wan Werdek jî, dema dixwaze namekê bi rê bike, diçe bal sofîkî, bi wî re tu dibêjî peymanekê girê dide. Dibêje wî eger tu vê namê bibî

bighînî xwedanê wê, ezê bi te re mêr kim.[23] Di destana Sêva Hecî de, ew kesê dilê wî ketiye Sêva Hecî pêwist e here cihekî qeytana Memûdî (di şaxeke vê destanê de qeytana Hemedanê tê nav kirin) bîne wekî ji bavê wê yê kor re bibe derman. Êdî Sêva Hecî ya wî.[24] Di destana Nasir û Malmal de, vê carê em rastî hoy û mercên mayî tên. Herdu keç (Taurezî û Esmer) dixwazin wekî ev herdu xort (Nasir û Malmal) herin Bexdayê çend sala bimînin, bibin kesên mezin, paşê bi wan re bizewicin. Berî ko ew bi rêkevin, ev herçar keç û xort di nav xwe de sond dixwin.[25] Di destana Şor Mehmûd û Merzingan de jî, bavê Merzinganê ji Şor Mehmûd tiştekî mayî hêvî dike, eger ew here dijminê wî bindest bike, ewê keça xwe Merzinganê bide Şor Mehmûd...

Wek van misalan gelek merc û hoyên mayî jî di destanan de tên pêşkêş kirin. Bi kurtî mirov dikare bibêje pêkhatin û bicihanîna van merc û hoyan cihê qelend (next) digre. Hemû ev merc û hoyan bi çi niyetê hatine gotin? Ji devê kê derketine? Angorî vê jî, dema mêr karên xwe diqedînin tên, ew vê carê dikarin rastî çend dijwariyên mayî jî bên. Vê carê serêşiyên nû di destanan de peyda dibin. Hertim, her tişt bi hemdî xwe nameşe.

Çima mêr dikevin rola şivanan

Di destanên kurdî de çawa em dibînin stûnên van berheman yên here xurt ji aliyê jinan de hatine dayîn. Jin mêrkirinên bêdil û reva zorê tu wext qebûl nakin. Sal derbas bin jî, ew nedilşa ne, dîsa jî riya xelasiyê digerin, timê bendewarê avakirina jîyîneke nû in. Di destana Binefşa Narîn û Cembeliyê Hekkarê de ev realîta gelek eşkere ye. Binefş, ji aliyê Derwêş Axa de bi destê zorê tê revandin. Ji ber ko birayên Binefşê li dijî vê zewaca bêdil derdikevin, ew tên kuştin. Derwêş Axa kesekî zordar û kal e. Tê gotin ko ew nod salî ye. Binefş mirinê ji mal, milkê dinyayê çêtir dibîne. Ji ber ko Binefş ewqas zêde ji Cembeliyê Hekkarê hez dike, navê kurê xwe yê Derwêş Axa bûyî jî, datîne Cembelî, Cembeliyê piçûk. Ev nav bêguman nîşana evîna Cembeliyê mezin e. Cembeliyê Hekkarê dikeve dilqê şivanan, kulavê şivanan xwe dike, wekî here bibe şivanê Derwêş Axa. Ew dixwaze bi dilketiya xwe re deng bike, wê bibîne û birevîne. Di dawiya destanê de bi xwe wisan dibe û ew bi hevra direvin. Bi vê kirina xwe ve Binefşa Narîn zewacên bêdil protesto dike û di dawiyê de dighêje mirazê xwe.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Di destana Binefşa Narîn û Cembeliyê Hekkarê de çawa me li jorê jî got, dema Cembeliyê Hekkarê dixwaze here Binefşa Narîn bibîne, dikeve dilqê şivanan. Di çend destanên mayî de jî em rastî vê motîvê tên. Çima şivan, ne kesekî din? Ji ber ko di nav kurdan de û di jîyîna rojane de kesê ko zêdetir kontak û pêwendiyên wî bi jinan re hene şivan in. Bi taybetî danê nîvro û berbi êvarê dema pez tê bêriyê, kesê serê pêz digre şivan e. Bi bêrîvanan re kontaktên wan yên dîrek hene, mesafa di navbera wan de gelek hindik e û imkana hevdudîtinê û hevraxeberdanê gelek zêde ye. Ji aliyê din şivan zêde şikê jî nabin li ser xwe. Ji ber ko ev karê pezdotinê ji du kesan pêk tê (şivan û bêrîvan) kesê ko pêz dajo bêriyê, gelek caran zarok in an jî pez bi xwe du hev rêz dibe, dikeve dorê. Di destana Qer û Gulîzerê de, Qer dibe waliyê Sonduzê, dilê wî dikeve keçeke bi navê Gulîzer, dema mêze dike bav keça xwe nadê, ew dibe şivanê mala bavê Gulîzerê.[26]

Berî ko Cembeliyê Hekkarê xwe bighîne dilketiya xwe ew di rê de rastî kesên mayî jî tê. Carekê dilê keça şêxekî ereban dikeve Cembelî. Navê vê keçikê Wedîha bûye.[27] Wedîhe bi dilekî na hezar dilî dibe evîndarê Cembelî. Ji bo ko ew û Cembelî timê hev bibînin, hev şa bin, ew rêkê difikire, diçe bal bavê xwe wekî Cembelî hilde ser karekî û di mala wan de bimîne. Lê belê Cembelî ji vê yekê re razî nabe. Çi dike nake ji destê vê jinikê nafitile. Demekê bi hevra dimînin, şevekê Cembelî bi dizîka ve ji mala vê keçikê direve, tevî tariya şevê dibe, pey rêça mala bavê Binefşa Narîn dikeve. Ev serpêhatiya di vê destanê de wek beşeke bingehî cih nagire, wek bûyereke duwemîn dikare bê hesibîn. Lê belê ev beşa destanê tiştekî nîşanî vê keça şêxê ereban dike, wekî bi zorê du dil nabine yek, bi hevdudîtineke derbazok û tesadûfî mirov nikare dilşa bibe. Ev beşa destanê, bûyerên ko di destana Zembîlfiroş de derbas dibin tîne bîra mirovan û wek hev in. Ji bo kêfa xwe, ev keça ereban û ew Xatûna ko navê wê di destana Zembîlfiroş de derbas dibe, jinên dewlemend, arîstokrat û xortxapînok in. Dorberên ko tê de mezin bûne, bajarî ne, gelek bi serbestî dijîn.

Sînorên namûs û bênamûsiyê

Destaneke ko di nav kurdan de gelek belav bûye, destana Zembîlfiroş e. Zembîlfroş debara xwe tenê bi firotina zembîlan (sêlik) ve pêk tîne. Kesekî belengaz û kesîb e. Ew tax û tax, kuçe û kuçe digere, zembîlan

difroşe. Kesekî çeleng, spehî û xweşik bûye. Angorî şaxeke vê destanê Zembîlfiroş berê mîr û dewlemend bûye, paşê jîyîneke sade ji xwe re hilbijartiye û xizan ketiye. Rojekê tê bajarê Sîlvanê cîwar dibe, li vir xwe re zembîlan difroşe.[28] Ji ber çelengbûn, bejn û bala wî, rojekê dema ew dîsa kuçe û kuçe digere, rastî jina mîrê bajêr tê. Dilê vê jinikê dikeve Zembîlfiroş û pêsîra wî ber nade. Zembîlfiroş bi xwe jî kesekî xwedî jin û zarok e. Çavê wî ji jinên kesî tune ye, kesekî serbilind, xwedî nefs e. Jina mîr çi dike nake, nikare wî ji rê derxe, bi wî şa be û rojên xweş bi hevra derbas bikin. Çawa em ji naveroka destanê û gotinên jina mîr fam dikin, ew mêrê xwe davêje alîkî, dixwaze Zembîlfiroş kaşî nav cî û nivînên xwe bike. Her çiqas ew bi gotinên xwe yên şehwetî ve dinya Zembîlfiroş serobino dike, dîsa jî Zembîlfiroş li ber xwe dide, nêzîkê wê nabe. Ew zarokên xwe difikire. Dilpaqijî, helalî û namûs, çawa em dibînin kakilê felsefeya jîyîna Zembîlfiroş pêk tînin.

Di dawiya destana Zembîlfiroş de çi tê serê Zembîlfiroş û Xatûnê? Bersîva vê pirsê angorî şaxên vê destanê ji hev gelek cida ne:

A) Dema Xatûn pey Zembîlfiroş dikeve diçe mala wî, çawa em dibînin Xatûn jina Zembîlfiroş dixapîne, dikeve nav cihê mêrê wê. Ew lempê vedimirîne, Zembîlfiroş dema tê dikeve nav cihê xwe wekî razê, Xatûn ji bîr dike xirxalê lingê xwe derxe û Zembîlfiroş wê çaxê fam dike ko ew ne jina wî ye. Ew Xatûn e. Zembîlfiroş dibe teyrekî ji kulekê re difire diçe. Xatûn heft sal li pey wî digere, li serê çiyakî rastî şopa wî tê, dibine xuşk û bira, piştî çendekî, Xatûn dimre.[29]

B) Li ser kanîkê rastî hev tên, Xatûn dixwaze Zembîlfiroş ramûse, dema Xatûn zimanê xwe dixe devê Zembîlfiroş herdu jî dimrin.[30]

C) Agir devê Xatûnê derdikeve, herdu jî dişewitin.[31]

Ç) Diçin cennetê, digihêjin mirazê xwe.[32]

D) Mîr dema pê dihese wekî jina wî çûye li bal Zembîlfiroş, lêdixe Zembîlfiroş dikuje.[33]

E) Zembîlfiroş xwe ji qesrê de davêje perçe-perçe dibe.[34]

F) Dema mîr dixwaze Zembîlfiroş bikuje, Xatûn dikeve navberê. Kêrê ji destê mîr digre, zikê mîr re dike, ew tê kuştin. Paşê Xatûn, Zembîlfiroş û jin û zarê wî bi tevayî diçin, cihekî wisan dengê axa û mîran li wir nayê.[35]

G) Jina Zembîlfiroş û Xatûn dibine hewiyên hev, wek jina mezin û jina piçûk bi hevra dijîn.[36]

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

H) Zembîlfiroş û Xatûn di nav xwe de peymaneke gîrê didin wekî dest ji pêsîra hev berdin. Paşê Zembîlfiroş ji ber daxwaziya bavê, diçe bajarê Diyarbekirê dibe mîr.[37] Ev şaxa dawîn, ne şaxeke folklorîk e, wek şaxeke edebî ji aliyê Mirad-Xanê Beyazidî de hatiye nivisîn.

Çawa tê dîtin heta mirinê, li dinya mayî jî Xatûn li pey Zembîlfiroş dikeve, pêsîra wî bernade. Di çend şaxên destanê de çawa tê xuyan, Zembîlfiroş her çiqas ji ber Xatûnê direve jî, wisan tê xuyanê bi kêmanî dibin xuşk û bira. Ji aliyê din dema em zordestiya mêrê Xatûnê didin ber çavan, ew dibînin ko hevkarîk û dostanetîk di navbera Zembîlfiroş û Xatûnê de li dijî mîr peyda dibe, Zembîlfiroş û Xatûnê nêzîkî hev dike. Ji aliyê din ji ber xizanî û belengaziyê, jina Zembîlfiroş jî, li dijî Xatûnê stoxar e. Ev yeka jî wek faktorekê, pêwendiyên Zembîlfiroş, jina wî û Xatûnê ji dijminatiyê diparêze û wan di xalekê de dighîne hev û dijayetiya van hersê kesan kêmtir dike. Bêguman ev hemû baweriyên mesaja destanê yên li ser helaliyê û dilpaqijiyê ava dibin, nahejîne. Ji ber ko di destanê de ev motîvan gelek xurt in. Lê belê hevbandûriya bûyeran bivê-nevê çend dijwariyan ji bo Zembîlfiroş peyda dike wek hebûna du jinan û newekhevdîtina Xatûn û mêrê wê... Li dijî mêrê Xatûnê mixalefetek peyda dibe, wê çaxê Xatûn wek dijmineke yekemîn nayê hesibîn. Di herdu şaxên dawîn de Zembîlfiroş jî êdî hatiye guhartin.

Destana Zembîlfiroş ji alîkî de destana Usif û Zelêxe tîna bîra mirovan. Xatûna ko navê wê di destana Zembîlfiroş de derbas dibe gelekî li Zelêxê çûye, dirûvê wê lê dikeve, wek hev in. Zelêxe jî wek Xatûnê jina mîrekî ye, mîrê Misirê. Dema Usif, kurê Aqûb pêxember dibin Misirê, dilê Zelêxê gelekî dikeve Usif. Di şaxên Usif û Zelêxê yên folklorî de, çawa em dibînin ko dema Zelêxe, Usif ji xwe re dikire, dibe, Usif riya revê digere, lê belê ji destê vê jinikê xelas nabe.[38]. Zelêxe tîne vê carê Usif şikyatî mêrê xwe dike, mêr jî tîne wî dike zîndanê. Ev destana di nav kurdan de gelek belav bûye, gelek şaxên wê yên edebî û folklorîk hene.

Destaneke ko di naveroka wê de babeta namûsê cihekî bingehî digre, destana Mem û Eyşê ye. Kurekî pîrejinekê heye, navê wî Memê ye, diya wî kurê xwe dizewicîne, navê bûka wê jî Eyşê ye. Piştî demekê Memê dibine leşkeriyê, heft salan li leşkeriyê dimîne, çavê vê dayîkê timê li rê ye û li bûka xwe xweyî derdikeve. Ji ber ko bi salan ev mala

bêmêr e, berpirsiyariya mezin dikeve li stoyê vê pîrejinê. Ew li ber mala kurê xwe dimîne, cihê wî digre. Piştî vê leşkeriya dûr û dirêj, êdî çavê wê li rênêrînê diqerime. Rojekê destûra Memê derdikeve, nîvê şevê lêdixe tê mala xwe, ew û dergistiya xwe dikevine nav nivînan, ew diya xwe hişyar nake. Diya wî mêze dike, di oda Eyşê de dengê mêran tê, dinya vê dayîkê tevlihev dibe, nizane ko kurê wê ye, leşkeriyê hatiye. Yekten serobino dibe, bi nezanî lê dixe kurê xwe dikuje.[39]

Him di destanên Zembîlfiroş û him jî di destana Mem û Eyşê de her çiqas bûyerên kuştin û mirinê peyda dibin, lê belê ji bo namûsa xwe biparêzin, yek jina xwe difikire, ya din jî kurê xwe difikire, naxwazin navê wan xirab derkeve, mirinê ji vê yekê çêtir dibînin. Herdu destan jî, li ser hîm û bingehên namûsê ava dibin.

Di salên kevn de ji ber dirêjbûna leşkeriyê, çawa em dibînin ev salên dirêj bûne sedemên parçebûna gelek malbatan, jin û mêr, keç û xortên nûzewicî bi salan ji hev dûr mane. Her çiqas dayîka Memê kurê xwe ji bîr nekirebe jî, ev dayîka bi salan hêviya hatina kurê xwe maye. Ji alîkî de ker û gêş bûye, mirov dikare bibêje wekî ew ji bîr kiriye, hatina kurê wê ji bo bûye micizekê, ev micize çawa em dibînin li bal vê pîrejinê nebawerîk peyda kiriye, wê bawer nekiriye rojekê kurê wê û bûka wê bibin yek, têkevin nav nivînan. Di hişê wê de hertim îmaja bûkeke tenêmayî cîwar bûye, tu car ev tabloya nû ji hişê xwe re derbas nekiriye.

Nefreta kontra-mîlîter

Çawa em dibînin gelek malbatên kurd ji ber leşkeriyê, timê rojên tirş û tal derbas kirine. Ji ber vê yekê jî di folklora kurdî de element û motîvên kontra-mîlîter cihekî bingehî digrin. Li welatên biyanî, li welatên dûr, kirina leşkeriyê ji bo her kurdekî wek cezakî giran hatiye dîtin.

Destaneke ko tê de li dijî hêzên mîlîter protestoke mezin heye, destana Menşa Eliyê Sêlim-Axa ye. Kîkî paşa, paşayê dewletê dixwaze keçeke çardeh salî (Menşê) ji xwe re wek jin bîne. Lê belê dema keçik û heft birayê wê vê yekê qebûl nakin, ev paşa heft birayê Menşê bi darê zorê dixe girtîgeha Diyarbekirê. Heta Menşê nedine wî, ew biryar digre ko van heft birayan di girtîgehê de girtî bihêle, wek lîstikekê, entrîka û santajekê girtina van heft biran li dijî Menşê bi kar tîne. Di

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

destanê de çawa em dibînin Menşê stoyê xwe li dijî vê zordestiyê xar nake, ji bo birayên xwe azad bike, ew dikeve ser rê diçe xelasiya wan. Di dawiyê de ser dikeve, birayên vê Keça Merdînî tên berdanê.[40]

Serpêhatiya Menşê, serpêhatiya Saliho tîne bîra mirovan. Çawa Menşê dixwaze heft birayên xwe ji zîndanê derxe, azad bike, Nûrê jî dixwaze dilketiyê xwe Saliho xelas bike. Dilketiyê wê jî wek heft birayên Menşê di girtîgeha Diyarbekirê de hatiye girtin. Salih hejdeh salî ye, sed sal ceza danê. Nûrê, gelek ber xwe dide wekî Salihê wê bê berdanê, di stranên xwe de gazî Reîsê Cimhuriyetê Kemal Paşa û pêxemberan dike, ji ber dergehê kela Diyarbekirê dûr nakeve, heta ko Salih bê berdanê:

Nûrê divê: Saliho pizmamo, bejna min zirave,
Têlek ji têla vê rihanê,
Hêşîn dike ser xopana Diyarbekir,
Pêşberî hepisxanê... [41]

Jinên kurd di şerê li dijî hêzên dewletê û hevalbendên dewletê de timê li bal mêrên xwe, lawên xwe cih girtine. Bi mêran ve tevayî li dijî neheqî, zordestî û li dijî êrîşên dewletê şer kirine. Di serpêhatiya Bişarê Çeto de, Gozê, çawa em dibînin li bal kurê xwe cih digre. Li dijî Bişarê Çeto derdikeve, ji wan çend kesan dikujin. Wek tê zanîn Bişarê Çeto hêzên dewletê yên leşkerî hildide bal xwe li dijî Emê Gozê şer dike. Hevkariya Bişarê Çeto bi dewletê re wisan pêş da diçe, ew dibe êrîşkarekî navdar. Emê Gozê bi mêrxasî û bi dilsoziya xwe ve tê nas kirin. Bi kurtî ev serpêhatiya wek destanekê bûye nîşana şerê pakî û nepakiyê, heqî û neheqiyê, qencî û xirabiyê. Gozê, di vî şerî de timê qenciyê dixwaze. Dema Gozê li dijî hêzên dewletê kurê xwe diparêze, ew, nefer, leşker û serokên wan yên zabit ji hev cida dike, gunê wê bi van neferan tê, paşê şîretan kurê xwe dike û gazî wî dike: »*Çavê maliya wan li riya wan e*«.[42] Di cihekî mayî de jî awa dibêje: »*De nekuje nefera, nefer kurê xelqê ne, nanxurê dewletê ne*«.[43] Ev mirovheziya Gozê, wek dilpaqijîkê dibe kakilê dinênasîke gelek pêşketî.

Destana ko tê de zordestî, hovîtî û lêdanên li ser jinê zêdetir dibin, destana Mehr û Wefa ye. Hêzên leşkerî di vê destanê de bi darê zorê şahsiyeta wê keça bi navê Wefa pêpes dikin, keçikê wek dîl (hêsîr) digrin. Angorî destanê, kurekî padişahê Muxirzemîn hebûye, navê wî

Mehr bûye, dilê wî dikeve keça berdestiyê padişah, navê wê Wefa bûye. Ew bi hevra diçin dibistanê, di navbera wan de evîna dil roj bi roj zêdetir dibe. Rojekê padişah kurê xwe Mehr dike serleşker, wî dişîne Hîcazê wekî tevî şer be. Mehr û Wefa bi alîkariya mamosteyê xwe bi hevra naman dinivîsin, xeberan ji hev digrin. Rojeke Wefa xewnekê dibîne, wekî Mehr di şer de hatiye birîndar kirin. Dema ew hişyar dibe, tivdarekê xwe dike, diçe hawariya dilketiyê xwe. Ev keça diçe derdikeve hizûra Melikşah, Melikşah vi keçikê bernade, bi xwe re dibe, dike bûka xwe. Di wê demê Mehr jî, jî leşkeriyê vedigere tê mal. Paşê pê dihese ko dilketiya wî çûye hawariya wî. Mehr careke din vedigere, pey Wefayê dikeve. Diçe mala wê pîrejina ko Wefayê xeber li bal hiştibû, paşê fêr dibe ko, Melikşah dilketiya wî Wefa ji kurê xwe re biriye. Mehr dema diçe bajarê Melikşah, mêze dike ko dîlan û dewata Wefayê tê kirin. Ew dilketiya xwe ji nav govendê direvîne. Mirovên Melikşah pey wan dikevin, di rê de wan herduyan jî didin ber gullan, dikujin.

Destana ko, cengawerî, egîtî, welatparêzî û mêrxasiya jinên kurd bi vekirî pêşkêş dike, destana *Dimdim* e. Ev destana bi navekî mayî destana *Xanê Lepzêrîn* an jî destana Xanê Cengzêrîn tê nasîn. Di destanê de li dijî ordiyên Faris di nav kelakê de berxwedana gelê kurd tê zimîn. Ev bûyera wek bûyereke dîrokî li dorberê kela Dimdimê di sala 1608–1610-an de qewimiye. Kurdan li dijî hêzên şah Abbas I şer kirine. Dema ordiyên Faris êrîşê dibine li ser vê kelê, kurd di hundirê kelê de dicivin, bi mehan li ber xwe didin, teslîm nabin, heta ko koka wan tê. Di gelek şaxên vê destanê de em rastî berxwedan û tekoşîna jinên kurd jî tên, ew di vê berxwedanê de bi aktîfî cih digrin. Bi taybetî di dawiya destanê de diya Xanê Lepzêrîn, jin, bûkên wî û jinên mayî bi cengawariya xwe ve çavê dijmin gelek ditirsînin. Ji bo ko ew bi can nekevin destê hêzên neyar, dema dijmin dixwaze dikeve kelê, ew bi destê xwe êgir berî xwe didin, xwe dişewitînin. Di şaxeke vê destanê de, jina Xan bi qîrînan ve gel hişyar dike û dibe pêşeng. Di şaxeke mayî de vê carê diya Xan li mirovan şîretan dike, navê wê Guher Xanim bûye, ew nîşan dide ko mirin ji teslîmbûnê çêtir e.[44] Angorî gotinên Guher Xanimê herkes tivdarekê xwe dike û xwe amade dike. Dîsa di vê şaxê de dema jina Xan mêze dike wekî dijmin hewl dide, bikeve hundirê kelê, ew êgir berdide cebirxana kelê, kela ji nêşkêva diteqe, di nav dumanê de dimîne, navê wê angorî vê şaxê destanê Asîme Xanim bûye.[45] Ji aliyê din bûyera kela Dimdimê derbarê dîroka tevgera jinên Kurdistanê de jî bûy-

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ereke giring e. Ji ber ko ev bûyera him wek berhemeke folklorîk, him jî wek bûyereke dîrokî tê zanîn.

Civata kurd timê bi jinên cengawer û bêtirs ve serbilind bûye. Ew timê hatine pesinandin. Di destana Rustemê Zal de, em rastî çend jinên wisan hêzdar tên. Ji van jinan yek jî ew keça bi navê Rûdeve ye. Tu pelewana pê nikaribû. Ew û bavê Rustem gulaş digrin, ew zora Zal dibe û Zal bi wê re dizewice. Paşê Rûdewe diwelide, Rustem jê dibe. Di şaxeke mayî de, dema Rustemê Zal dinêre, keça wî li pêşberî xulamê wî Gurgîn pozê xwe xar dike, dibêje ezê te bikujim. Keça wî kincê pelewanan xwe dike, diçe dikeve şikeftê serê dêwekî jê dike. Ew dêwê ko berê Rustem bi xwe cesaret nekiriye serê wî jê bike. Piştî vê bêtirsiya keça xwe, ew dibêje »heyfa vê qîzê ez bikujim«, paşê dest ji kuştina keça xwe ber dide. Di destana Rustemê Zal de, jin, bûk û keç hertim bi destê Rustem tên rizgar kirin, dema ew dikevin tengasiyê, cara pêşîn ew xwe davêjin li ber bextê Rustem. Ji ber ko ew pelewan e, kes nikare nêzîkî mala wî bibe. Ew dibe parêzkarê jinên bindest, gelek caran wan xelas dike. Dema dêwê firinde jina yekî direvîne, xarziyê wî Bêjeng, vê jinê ji dest dêw xelas dike, teslîmî mêrê wê dike. Di şaxeke mayî de, Rustemê Zal dibe serdewatiyê kurê Selmiyanî Sind, tivdarekê xwe dike, diçe dewatê, xeber tê ko Dêwê Heftserî (tenê serîkî wî hebûye, serê din bi kincan ve çêkirine) bûk revandiye, ji xwe re biriye. Navê bûkê jê şimikzêr bûye. Ew lêdixe Dêwê Heftserî dikuje, bûkê hildide, vedigere tê dighêje cihê dewatê. Di şaxeke mayî, xortek keçekê direvîne, tîne mala Rustemê Zal. Pismamên keçikê davêjine li ser mala Rustem. Rustem bi wan re dikeve şer, lê belê Rustem zora wan dibe, ji wan gelek şunda direvin. Paşê Rustemê Zal, xort û keçikê di mala xwe de xweyî dike. Di gelek şaxên destana Rustemê Zal de dema Rustem pey dijminê xwe dikeve an jî dixwaze yekî/yekê xelas bike, cara pêşîn ew diçe dibe mêvanê pîrejinekê, bi wan dişêwire, gotinên wan ji xwe re dike şîret. Ew, gelekî alîkarî û piştgirtiya Rustemê Zal dikin.[46]

Welatê şahiyê

Çawa tê xuyan hemû ev destanên kurdî bi mirin û kuştinê ve diqedin. Him destanên evînê yên romantîk, him destanên namûs û helaliyê, him jî destanên cengawariyê li ser van pêwendiyên tirş û tal û bûyerên

tradejîk ava dibin. Jinên kurd jî çawa em dibînin ji van bûyeran nesîbê xwe distînin û zû-zû nagihêjin mirazê xwe. Evîna navbera du kesan ji ber gelek dijwariyan naçe sêrî û sernakeve. Destana ko di naveroka wê de mirov rastî rêça mirin û kuştin û malwêrankirinê nayê, destana Sêva Hecî ye. Di vê destanê de dilê kesî ji tu kesî namîne, kêm û zêde her kes dilşa ye. Warên ko bûyerên destanê tê de derbas dibin wek cenneteke derewîn û welatê xweşiyê, şahiyê timê mirov bi mirazê xwe şa dibin. Piştî sefereke dûr û dirêj bi zehmet, bav Sêva Hecî dide Mîr Mehmûdê Cindî. Ew, dema dilketiya xwe Sêva Hecî dibe welatê xwe, di rê de rastî şivanekî tê, ew şivan, şivanê mala bavê Sêva Hecî bûye. Heft sal şivantiya wan kiriye, angorî gotinên Sêva Hecî bavê wê biryar girtibû wekî piştî salekê keça xwe bide vî şivanî. Bo vê yekê jî gunê Sêva Hecî gelekî li vî şivanî tê, dilê wî jî di Sêva Hecî de hebû ye. Mîr Mehmûdê Cindî ji ber zanebûna êş û jana dilan, dibêje dergistiya xwe wekî ramûsanekê bide şivîn û xatirê xwe jê bixwaze. Demek be jî Sêva Hecî û şivan hev radimûsin. Çend sal derbas dibin, ji Sêva Hecî re keçek dibe, navê wê datînin Sêva Sêvê, ew keç mezin dibe, dibe keçeke xama. Ew şivanê ko demeke berê bibû evîndarê Sêva Hecî, hê Sêva Hecî ji bîr nekiribû. Rojekê diçe Sêva Hecî birevîne. Wê çaxê xeberê hildide ko keçeke wê bûye. Vê carê tînin vê keçikê Sêva Sêva didine vî şivanî, ew jî dighêje mirazê xwe. Di şaxeke mayî ya vê destanê de çawa em dibînin, Mîr Mehmûdê Cindî bi Gulçîçeka Dilan re jî dizewice, wê jî bi xwe re dibe. Gulçîçeka Dilan ji der dîtina qeytana Hemedanê (ji bo çavê bavê Sêva Hecî bibîne, wî nikaribûya bidîta), keçekê jî bavê Sêva Hecî re tîne. Çawa tê xuyan hemû kesên ko di vê destanê de hene, hemû jî dighêjin mirazê xwe, dilşa dibin, dilê tu kesî ji kesî namîne. Bavê Sêva Hecî, Sêva Hecî, keça wê Sêva Sêva, Mîr Mehmûdê Cindî, şivan, Gulçîçeka Dilan hemû bextewar in, destan bi tehrekî dilşa diqede.[47]

Destaneke mayî ko bi şahiyê ve diqede jî, destana Behram û Gulendam e. Dema Behram ji raw û nêçîrê vedigere, di rê de rastî dewrêşekî tê. Navê wî Şah Mensûr bûye. Ew padişahê Helebê bûye. Behram mêze dike, rewşa Mensûr şah qet ne baş e. Di ber dilê wî de tê û sedemên bedhaliya wî jê dipirse, ew dibêje derdê dila ye. Piştî van gotinan ew ji berîka xwe du sûretan derdixe yek Gulendam e, yek jî sûretê Firîdayê bûye. Gulendam û Firîda pismamê hev bûne û gelek bedew bûne. Ji her derê kes dihatine dîtina wan. Dilê Mensûr di

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Firîdayê de hebûye. Dema ew van sûretan nîşanî Behram dide, Behram wê dibîne hişê serê wî diçe û dibe evîndarê Gulendamê. Bi vî tehrî Behram û Mensûr şah dibine heval, pey rêça Gulendam û Firîdayê dikevin. Piştî rêwîtîke dirêj û zehmet, ew digihêjin mirazê xwe. Gulendamê didine Behram, ji ber ko gelek mêrxas bûye. Gotinên wî timê dihatin qebûl kirin, li ser daxwaziya Behram, Firîdayê jî didine Mensûr Şah. Çil rojan û çil şevan dîlan û şahiya dikin.[48]

Serkanî

1) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (destnivîs, xebateke neçapbûyî). Qanadê Kurdo, ev berevoka destanên kurdî berî mirina xwe amade kiriye, di nav vê destnivîsê de heft destanan cih girtiye, ji aliyê din bo vê xebatê pêşgotinek jî nivîsiye. Di nav van destanan de çar destan, ji zaravê soranî wergerandiye zaravê kurmancî. Ev herçar destan cara pêşîn, ji aliyê Qadirî Fettahî Gazî de li Iranê di nav weşanên Unîversîta Tebrîzê de hatine weşandin, wek *Ferx û Astî, Şor Mehmûd û Merzingan, Mehr û Wefa, Behram û Gulendam.* Qanadê Kurdo sê destanên ko newerger in, wek Elî şêr, *Zembîlfiroş, Hespê Reşj* î aniye di nav vê berevoka bi navê *Beytêd Kurdî* de cîwar kiriye. Angorî her destanekê hejmara rûpelan dayê, wek pirtûk hejmar nedane rûpelan.

2) Oskar Mann, *Die Mundart der Mukri Kurden I–II,* Berlin, 1906, 1909. Oskar Mann di cildê yekemîn de çend destanên ko di nav kurdên Iranê de belav bûne, civandiye, bi kurdî, bi tîpên latînî çap kiriye. Di cildê duwemîn de jî, Almaniya van destanan cih girtiye, 302+478 rûpel. Ev xebata, di dema xwe de xebateke here fireh û pêşîn e ko li ser destanên kurdî hatiye amade kirin.

3) Heta niha çend şaxên Leyla û Mecnûnê yên folklorîk hatine berev kirin. Heciyê Cindî, *Kurdskî Epiçeskie Pesni-Skazkî* (Beyt-Serhatiyêd Kurdî Yên Epîkî), Moskova, 1962, rûp. 163–169 (Di vê şaxê de navê destanê *Leylî û Mecrûn* derbas dibe).Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, *Zargotina K'urda,* Erîvan, 1982, rûp. 132–138 (Di vê şaxê de navê destanê *Leyl û Mecrûn* derbas dine). Ji aliyê din çend şaxên vê destanê yên edebî jî hatine nivîsîn. Ji van şaxan yek ji aliyê Xarîs Bîtlîsî de, di sala 1758'an de hatiye nivîsîn. Ev şaxa paşê di di sala 1965'an ji aliyê M. B. Rudenko de ji nû ve li Moskova çap bûye. Paşê şaxeke vê destanê ya edebî bi firehî ji aliyê Şêx Mihemed Can de, li dora sala 1884'an de hatiye nivîsîn û bi tîpên latînî ji nû ve ji aliyê Zeynelabidîn Zinar de hatiye çap

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

kirin: Şêx Mihemed Can, *Leyl û Mecnûn,* Stockholm, 1993.

4) M. B. Rudenko, *Literaturnaya i Folklornie Versii Kurdskoy Poemi »Yusuf i Zelêxe«* (Şaxên Poema Kurdî Usif û Zelêxe Yên Edebî û Folklorîk), Moskova, 1986. Rudenko, di vê lêkolîna xwe de, şaxeke vê destanê ya kevn ko ji aliyê Selîm Sileyman de hatiye nivîsîn bi kurdî û rûsiya wê ve tavayî çap kiriye û çend şaxên folklorîk jî pêva kiriye.

5) Heciyê Cindî, *Şaxêd Eposa »Rustemê Zale« Kurdî, Erîvan,* 1977. Heciyê Cindî, di vê berevokê de 24 şaxên destana Rustemê Zal weşandiye.

6) Destana Ferhat û Şirîn her çiqas di nav kurdan de zêde belav nebûbe jî, wergerên vê destanê yên kurdî hene, binêre Berhem, hejmar 2, 1992 (Ehmed Şerîfî, *Hekîm Şêx Eliyas Nîzamiyê Kurdî).* Ehmed Şerîfî, di vê lêkolîna xwe de çawa diyar dike, Nîzamî – nivîskarê Xusrew û Şirîn ji aliyê dê de kurd bûye. Çawa em ji *Şerefnamê* fêr dibin, mêrxasê vê destanê Ferhat jî Kurd bûye. Ji kurdên kelhur bûye: *Şerefname,* Istanbul, 1971, rûp. 23.

7) Qanadê Kurdo, *Beytêd kurdî* (Destnivîsa wergera Şêx Ferx û Xatûn Astî ji 30 rûpelan pêk tê).

8) Cigerxwîn, *Folklora Kurdî,* Stockholm, 1988, rûpel 118.

9) M. Ararat, *Dengbêj Kerem,* Roja Nû, hejmar 8, 1985.

10) *Destana Memê Alan,* Istenbol, 1978, rûp. 117.

11) Angorî çend şaxên Memê Alan û Zîna Zêdan, Mem ji Yemenê tê ji bo dîtina Zînê hatiye: binêre Oskar Mann, 1909, rûp. 42. Angorî vê şaxê, Mem, kurê padişahê Yemenê – Ibrahîm bûye.

12) Oskar Mann, *Die Mundart der Mukri Kurden II,* rûp. 135–165

13) Qanadê Kurdo, Beytêd kurdî (Destnivîsa wergera destana Şor Mehmûd û Merzinganê ji 27 rûpelan pêk tê).

14) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda,* cild I, rûp. 149.

15) Heciyê Cindî, *Beyt-Serhatiyêd Kurdî Yên Epîkî,* rûp. 153.

16) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda I,* rûp. 171.

17) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (Destnivîsa wergera destana Mehr û Wefa 23 rûpelan pêk tê).

18) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda I,* rûp. 147. Ji der şaxên destana Siyabend û Xecê yên folklorîk, çend şaxên vê destanê yên edebî jî hatine weşandin: Sîabandov Semend, *Siyabend û Xecê,* Erîvan, 1959. Zeynelabidîn Zinar, *Siyabend û*

Xecê, Stockholm, 1993. Koyo Berz, *Siyamed û Xeca* (bi zaravê dimilî), Stockholm, 1993.

19) Heciyê Cindî, *Beyt-Serhatiyêd Kurdî Yên Epîkî,* rûp. 171

20) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (destana Şêx Ferx û Xatûn Astî, rûp. 8).

21) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Stranê Zargotina Kurdaye Tarîqiyê,* Erîvan, 1977, rûp. 271.

22) Eynî berhem, rûp. 249.

23) Ahmet Aras, *Destana Ker û Kulik,* Istanbul, 1993, rûp. 54.

24) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda I,* rûp. 160 (Navê vê Qeytana Hemedanê, di şaxeke mayî ya destanê de wek Qeytana Memûdî derbas dibe, binêre, Heciyê Cindî, 1962, rûp. 154).

25) Oskar Mann, 1909, rûp. 166–205.

26) Eynî berhem, rûp. 404–429.

27) Roger Lescot, *Binevşa Narîn û Cembeliyê Hakkarê,* Hêvî, Hejmar: 2, 1984.

28) Muhsine Helimoğlu Yavuz, *Diyarbakır Efsaneleri II ve Diyarbakır Üzerine Sekiz Bildiri,* Ankara, 1990, rûp 142.

29) J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş-Kurdskaya Poema i ee Folkornie Versii* (Zembîlfiroş – Poema Kurdî û Şaxên Wê Yên Folklorîk), Moskova, 1983, şaxa I.

30) J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş,* şaxa II.

31) J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş,* şaxa IV.

32) J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş,* şaxa VI.

33) J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş,* şaxa VII.

34) J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş,* şaxa IX.

35) Şaxa Emînê Evdal (Di nav pirtûka Musaelyan de cih girtiye).

36) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (Ev destnivîsa şaxa Zembîlfiroş ya ko Qanadê Kurdo xwe berev kiriye ji 16 rûpelan pêk tê).

37) Ev şaxa destana Zembîlfiroş wek şaxeke edebî hatiye amade kirin, di nav pirtûka Musaelyan de cih girtiye. Ji aliyê Mirad-Xanê Beyazidî de hatiye nivîsîn. Li ser vê destanê lêgerînek di kovara Pale de hatiye weşandin, binêre hejmar 3–4, 1979.

38) M. B. Rudenko, *Şaxên Poema Kurdî Usif û Zelêxe Yên Edebî û Folklorîk,* rûp. 297.

39) Heciyê Cindî, *Beyt û Serhatiyêd Kurdî Yên Epîkî,* rûp. 139–146.

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

40) Celîlê Celîl, *Zargotina Kurdên Surîaê,* Erîvan, 1985, rûp. 79–95.
41) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Stranê Zargotina Kurdaye Tarîqiyê,* rûp. 238.
42) R. Dengîr, *Berxwedankarî Gerdenazadiya Emê Gozê û Du gotin li ser Bişarê Çeto,* Rewşen, hejmar 5, 1990.
43) Ordîxanê Celîl, *Stranê Zargotina Kurdaye Tarîqiyê,* rûp. 304.
44) Ordîxanê Celîl, *Kurdskiy Geroyiçeskiy Epos »Zlatorûkiy Xan«* (Eposa Kurdî Ya Mêrxasiyê »Xanê Lepzêrîn«), Moskova, 1967, rûp. 74. Di vê berevokê de çend şaxên destanê hatine weşandin.
45) Eynî berhem, rûp. 119
46) Heciyê Cindî, *Şaxêd Eposa »Rustemê Zale« Kurdî,* Erîvan, 1977.
47) Heciyê Cindî, *Beyt-Serhatiyêd Kurdî Yên Epîkî,* rûp. 156.
48) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî (*Destnivîsa wergera Behram û Gulendamê ji 56 rûpelan pêk tê).

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

— BEŞ IV —

Di stranên kurdî de navçeke erotîk: memik

Di nav sedsalên bihurî da civata kurdî bi çi çavî pirsa jinan nihêriye? Bi alîkariya materiyalên folklora kurdî mirov dikare bersîva vê pirsê jî bide. Jina kurd heta ji destê wê hatiye, ya xwe kiriye, dema xwastiye, bi dilketiyê xwe re reviye, bi vê yekê ve mirov dikare bibêje hemû dijwarî û tengasiyên li pêşiya xwe protesto kiriye. Ev meteloka jêrîn vê dilsoziya jinên kurd gelek baş eşkere û îspat dike: *reva jinê edetê dinê.* Lê belê ew dorgirtina civakî, aborî û polîtîk timê riyên xelasiyê ji wê re girtine û çembera li dor wê her çûye teng bûye. Ji aliyê din jina kurd stoyê xwe li hemberî van êrîşan xar nekiriye. Bi taybetî êrîşên feodalî, nîv-feodalî qet nebe bi saya folklor, stran, destan, gotinên pêşiya û berhemên mayî hatine protesto kirin. Jinan bi kêmanî di folklorê de ji xwe re textek ava kirine, deng û rûmeta xwe bi saya van berheman bilind kirine.

Dema mirov naveroka stranên kurdî raçav dike, mirov dibîne ko tema evînê, temake here xurt e. Di nav vê temayê de, motîva memikên jinan cihekî bi taybetî pêk tîne. Tu beşeke bedena jinê di folklora kurdî de wek memikan motîveke wisan xurt û rengîn nîne. Di çend stranan de em rastî motîva lêvan jî tên. Lê belê lêv wek memikan ewqas ne balkêş in, di planeke duwemîn de dimînin û gelek caran bi peyva ramûsanê ve dikevine zikê hev, gazî hev dikin. Hejmara van stranên ko li ser memikan şax vedane, di zargotina (folklor) kurdî de digihêje dereceke bilind. Kêm û zêde her straneke kurdî ya ko li ser evînê û viyanê hatiye gotin, tê de qala memikan tê kirin. Ev stranan di nav folklora kurdî de bingehên edebiyateke erotîk ya xurt pêk tînin. Bêguman nîşanên pêl û cereyaneke erotik bi tehrekî baştirîn di stranên kurdî de xwe nîşan dide. Di van stranan de hemû motîv û nîgarên derbarê memikan bi zimanekî gelek bilind, folklorîk û giranbiha ve tên pêşkêş kirin, wek misal, keç timê dixwaze dilketiyê xwe wek

»dost« bibîne, keç wî wek »mêvan« bi nav dike û evînê li ser her tiştî re dibîne, malê dinyayê davêje alîkî:

Ha wer delal

Emîno kuro, tu şevkê
Were mala bavê min mêvanî,
Tu were tewafa cotê memikê mi zeriyê,
Ji ter re pir xweştir e, ji axatiya Remaniyê...[1]

Çavê min li rênga te qerimî

Lawiko, were de tu were,
Bira serê min qurbana serê te be,
şevek şevên van payîzan,
Mêvanê sîng û berê dosta xwe be...[2]

Erotîsîzm bi taybetî di stranên kurdî yên evînê de gelek xurt e. Di nav van stranan de mirov nikara rastî şop û rêçên vulgarismê û devjiheviyê bê, ebesor û pêxas, efrandarê van stranan nînin, gel bi xwe ye. Ji aliyê din dema mirov van stranan baş analîz dike, ew ji sînorê motîvên pornografîk dûr dimînin. Çawa tê zanîn armanca »edebiyata pornografîk« qamcîkirina hîsên xwendevanan yên cînsî ne. Lê ev stranên kurdî, bi hêjabûna xwe, ji sînorê vê edebiyata pornografîk gelek dûr ketine. Her çiqas carina sînorê navbera efrandinên erotîk û pornografîk dem dem zirav dibin jî, lê belê çawa em dibînin van stranan hêjatiya xwe ya edebî wek tê xuyan bi dirêjiya salan winda nekirine, ev yeka jî bi serê xwe pîvanek e. Wek misal di nav mîtolojiya kurdî de, mêrxasa destana Mem û Zîn ya jinîn û keça Kurd Zîn, mirov çawa lê dinêre mîna Xwedake wek *Erosa Yunanî* û *Amora Romenî* bûye nîşana evînê û bi salan li ser zar û zimanê kurdan digere, ji rûmeta xwe tu tiştek winda nekiriye.

Dema gilî ji Mem û Zîn hatiye vekirin, di berhema Ahmedê Xanî de em rastî çend îfadeyên li ser memikan jî tên, wek »keçên memikhinar« û »keçên memikgilover«...[3] Ev yeka jî nîşan dide ko, tema memikan ji berê de di nav edebiyata kurdî ya devkî û nivîskî de cih girtiye, bûye babeteke erotîk. Ji aliyê din ev dirûvlêxistinên Ahmedê Xanî, çawa

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

emê paşê jî bibînin, di warê navkirina formên memikan de cihekî bingehî digrin.

Peyveke erotîk: memik

Memik nîşana, zanav, kîtiya (huviyet) jinan e. Bi salan di nav her çiqlê hinerên cida de memik wek nîşana bereket û bedewiyê hatiye hesibandin. Ji der fonksîyona memikan ya mijandina zarokan, fonksîyona memikan ya here mezin bêguman erotîk e. Wek baqe gulên ko dema mirov serê xwe dixe nav, bîn dike, bi bîn û nermikiya wan mest û serxweş dibe, memik wisan di jîyîna mirovî ya cînsî de bandûrhişt in û roleke gelek mezin dilîzin. Bi taybetî memikên keçan wek dewlemendî û zeynetekê hatine hesibandin. Ev bedewiya memikan bûye babeta metelokeke kurdî jî: *memikên qîza zeynet in / kelaxê pîrê robet in.*[4] Di vî warî de bêjebendeke kurdî jî me gelekî ronî dike: *memkê xatûnê.* Bêjebenda »memkê xatûnê« bi taybetî ji bo tiştên xweşik tê bi kar anîn.[5] Dîsa gotineke pêşiya, ev beşê bedenê, hêjayî beşê herî bedew dîtiye, wek pîvan hatiye hesibîn: *dilê tirsonek sîngê gewr nabîne.* Ji bo bal û dêna mêran bikşînin li ser xwe, jinan hertim mezinbûna »taxima memikan«ji xwe re kirine pîvan û nîşaneke jinîn. Bi saya memikên xwe yên mezin, jinan xwastine jîyîna seksuel hin jî seksueltir bikin. Di çîroka pêşketina mirovatiyê de çawa em dibînin nîşandayîna memikan di sedsalên kevn de gelek hêsa bûye û ev rehetiya jinan tu wext nebûye sedemê serêşîke civakî. Heta niha jî carcar çawa em di televîzyon, rojnama û kovaran de dibînin jinên çend êl û eşîrên afrîkî bêtirs û bêşerm memikên xwe dikarin nîşan bidin. Gelo bermayîn û nîşanên vê toleransa berî hezar salan çiqas şop û rêçên xwe di nav stranên kurdî de hiştine? Her çiqas bersîva vê pirsê armanca lêkolîna me nîn be jî, lê belê ev lêkolîna qet nebe bersîvdayîna vê pirsê hêsantir dike an jî dibe referanseke folklorîk.

Di zimanê kurdî de gelek peyvên ko cihê memikan digrin, hene. Bikaranîna van peyvan, angorî fonksîyona memikan li gelek cihên Kurdistanê diguhirin. Peyva *memik* ji peyveke latînî tê: ango ji peyva *mamma.* Di gelek zimanan de ev peyva li cihê dê/dayîk jî tê bikaranîn, dema zarok gazî dayîkên xwe dikin, dibêjin »mama«... Ji ber ko memikên mêran kor bûne, pês da neçûne, piçûk û bêfonksîyon mane, çawa em dibînin pêwendiyên peyva memik û mêran qet tune ne. Di

hin zimanan de xwarinên ko ji bo zarokan amadebûne, tên firotin jî, bi »mama« tên bi nav kirin. Bi kurtî bingehên van hemû peyvan diçin digêjine peyva »mamma«: (dê/dayîk). Di zimanê kurdî de çend peyv hene ko gelek dişibînîn peyva mamma, wek *mak* (zaravê kurmancî), *mad* (zaravê dimilkî). Ji ber ko zimanê kurdî, zimanekî indo-ewropî ye, çawa em dibînin qet nebe koka van hemû peyvan wek hev e. Di zimanê farisî de jî, çawa tê zanin li şuna dê/dayik peyva *mader* tê bi kar anîn, ew jî nêzîkî peyva mamma ye. Ev peyva latînî angorî avahiya zimanê kurdî, bi alîkariya formê diminutif (bi saya parkîta -ik) bûye: *memik*. Di zimanê kurdî de li şuna memik carcar jî ev peyvan tên bi kar anîn: *çiçik, bistan, sîng, pêsîr, paşil, sîngber, guhan, hingil...* Peyvên guhan û hingil zêdetir di zimanê argoyê de, di zimanê ebesor û pêxasan tê bi kar anîn. Ji aliyê din, çawa tê zanîn peyva *guhan* bi taybetî ji bo memikên heywanan tê bi kar anîn, wek guhanên çêlekan. Peyvên pêsîr û paşil her çiqas li şuna memik tên bi kar anîn jî, ev peyvan zêdetir wek beşeke bedenê an jî bona kincên li dorberê memikan, derbas dibe, wek »pêsîra xwe bigre!« (ango bişkokên li dorberê memikan bigre), an jî »perên xwe têxe paşila xwe!« (wek cihekî parastina tiştan)... Di çend stranên kurdî de emê çawa paşê jî bibînin wek misal mirov rastî îfadên wek »paşil tijî xurme ye« û »paşil tijî êmîşe« tên... Li vir peyva »xurme« û »êmîş« bi tehrekî sembolîk memikên jinan îfade dikin. Angorî cih û dema karanîna van peyvan maneyên wan jî tên guhirîn. Bi vî tehrî mirov dikare ji bo mêran jî peyvên pêsîr û paşil bi kar bîne. Li çend cihan misal wek dorberê Qonyayê li şuna zarok dema jîr ji memikên diya xwe dimêje, ew dibêjin »pêsîr dimije«... Di gelek stranên kurdî de em rastî îfada »sîng û ber« tên, ji vê îfadê em jê derdixin ko qala memikan tê kirin. Peyva sîng him ji bo beşê bedenê yê jorîn (ji qirikê heta nava mirovan), him jî, ji bo cotê memikan tê bi kar anîn. Di gelek zimanan de him ji bo vê beşa bedenê, him jî ji bo cotê memikan tenê peyvek tê bi kar anîn, lê belê di kurdî de gelek peyv hene. Çawa em dibînin di zimanê kurdî de carcar ev beşan bi du peyvan ve tên bi nav kirin: *sîng û memik*. Ev peyvan wek du peyven hevnaverok (sînonîm) jî tên bi kar anîn. Bi kurtî bi peyvên memik û sîng wek du peyvên evînê û erotîk di stranên kurdî de zêdetir derbas dibin. Di gelek stranên kurdî de em rastî îfade »sîng û ber« jî tên. Gelo peyva ber ji ko tê? Di zimanê kurdî de peyva ber carcar ji bo fêkiyan û ji bo »pêş« (wek beşê pêşîn yê bedenê!) tê bi kar anîn. Dema mirov

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

maneyên vê peyvê bi memikan ve girê dide, mirov rastî şopên hevgirêdanekê tê, di vê navkirinê de mantiqekê jî dibîne. Di zimanê devkî de her çiqas peyva çiçik li şuna memik tê bi kar anîn jî, di zimanê nivîskî de em ewqasî rastî vê peyvê nayên. Di stranên kurdî qasî memikan, em rastî îfada serê memikan (bi latînî mamillan) jî tên. Serê memikan him ji aliyê tehr, reng, tam, him jî bi fonksîyonên xwe ve di van stranan de cihekî taybetî digrin. Çawa tê zanîn li dora serê memikan beşeke wek baxçekî ji gupik û xalan pêkhatî jî heye, jê re bi latînî dibêjin »areola mammae« (baxçê xalan). Di straneke kurdî de qala vî »baxçê gulan« tê kirin: »Taximê sîng û berê Eyşana min gihiştine / xalên zer û sor ketinê«.[6] Di çend stranan de em rastî îfada »xal û xetê memikan« tên, ev îfada wisan tê xuyanê ko ji bo van gupikên li dora serê memikan cih digrin, hatiye bi kar anîn.

Pêşkêşkirina memikan

Di stranên kurdî de tiştê herî balkêş, piraniya stranên ko li ser memikan hatine gotin, ji devê jinan derketine. Ev yeka derbarê şkandina çend tabûyan, cihê jinan û derbarê aktîfbûna jinan di pêwendiyên cînsî de an jî derbarê rola wan di civatê de, me gelekî ronî dikin. Di çend civatên islamî de li ser memikan peyivîn, stran gotin û besndayîna wan ewqas hêsa nebûye, wek çawa di zimanê tirkî de jî tê xuyan tema memikan, temake ewqas berbiçav, xurt nîne, wek stranên kurdî ewqas bi vekirî ev tema di stranên tirkî de cih nagire. Gelo mirov ji serdemên kevn heta niha vê yekê wek serdestîke jinan dikare bihesibîne an jî nîşan bide? Bersîva vê pirsê babeta vê lêkolîna me nîn be jî, lê belê ev yeka babeteke gelek balkêş û hêjayî lêkolîneke berfireh e.

Dema dilê keç/jineke kurd dikeve yekî, li ser bangîn dibe cara pêşîn di van stranan de, em dibînin ko ev jin memikên xwe pêşkêşî dilketiyên xwe dikin, destûrekê derdixib, hemû tirsê ji ser xwe davêjin û memikên xwe pêşkêşî »helaliyê canê xwe« an jî »xelqê delal« û »xelqê têlî« dikin. Jin van dilketiyan di kategorîke taybetî de (xelqê delal, xelqê telî) cîwar dikin û dilketiyên xwe ji ser her kesî re dibînin:

Dewrêşê Evdî

Minê destmala sor gul-gulî anî,

Çifta zer memika navda girêda
Û ber delalê dilê xwe pêşkêş danî...[7]

Ahmedo ronî

Ahmedo ronî, heyran navê min Besna ye,
Tilî, pêçiyê mine, marmutî al şema ye,
Sîng û berê min evdala xwedê koşk sera û çîma ye,
Serê qiranê pezê xwe serda gêr ke,
Minê hemdê xwe te re destûr daye...[8]

Ji bo ko delaliyên xwe dilşa bikin, jin hemû imkanên xwe pêşkêş dikin, pêşkêşa here giranbiha, bêguman di van stranan de cotê memikan e. Ji ber vê yekê jî gaziyên jinan tehrê xwe diguhirînin, rengekî erotîk werdigrin. Di vê strana jêrîn de de çi ji destê jinê tê pêşkêş dike:

Hey lo lo delal

De lê lo heyran
Wezê delalê malê birêkim,
Wezê taştêkê ji delaliyê malê re çêkim
Wezê temamê rûnê Xinisan jê re lêkim,
Eger qîma delalê malê pê neyê
Wezê cotê memikan jê re pêşkêş kim.
Hey lo lo delal..
De lê lo heyran,
Berîka Mêrdînê berîkî dûz e.
Pozê Qerecdaxa şewitî li serda xûz e.
Nava sîngê mehbûbê min, evdalê
Temam zîv û zêr û altûn e...[9]

Dema kesek mizgîniya hatina lawikê (dilketiyê) keçekê jê re bîne, keçik dikare! ji cotê memikan yekî pêşkêşî kesê ko mizgînî aniye, bike. Ev yeka bêguman xurtbûna evîn û hezkirina dilketiyan nîşan dide, misala kesê mizgîn tîne çawa tê xuyan ne dilketiyê keçikê ye, lê belê ew dikare memikekî xwe pêşkêşî wî kesê xerîb! bike (bêguman tenê bî riya folklorê), ev yeka jî, di realîtê de xurtbûna evîna jinê temsîl dike:

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Lawiko qurba, Girîdaxa berbi welat,
Heçî kesê bibêje -Gede lawikê te hat,
Ezê çevê çepê, memikê rastê
Bidim pêşkêş, xelat...[10]

Di vê strana jêrîn de, vê carê keçik amade ye wekî »ramûsana rûyê rastê« jî pêşkêşî kesê salixdayî bike:

Delalê beriyê

Minê sonda mezin xwariye
Heçî saloxekê ji delalî malê ji me re bîne
Ezê bidim heft aşê mala bavê xwe rebenê
Li ber çemê Nisêbînê.
Eger pê razî nebû, ezê ramûsana rûkê rastê,
Bidim bi mizgînî.
Hey lolo...[11]

Carcar di van stranan de jin bo dilketiyê xwe hertim amade ye da lawkê wê, xwe bigihîne cotê memikan, merc û xoyan bi xwe amade dike, bêsebiriya jinan carcar ji sînoran derbas dibe. Dema ji aliyê dê/bavan de, ji aliyê mêrên xirab de tengasî û dijwarî peyda dibin, jin ji bo dilketiyê wê, xwe bigihîne cotê memikan gelekî serê xwe li ser planên cida diêşîne. Jin naxwaze kes ji vê hevdudîtinê agahdar bibe. Dema mirov rastiyê digere jina kurd evîna du kesan ser her riştî re dîtiye, ev yeka bûye wek hîmekî felsefîk: *Kesê orta du dila û çar çavan xeber dide, bira xêrê-wayê qet nebîne.* Dema mirov li ser van peyvên zêrîn! difikire, mirov dibîne ko jina kurd ji aliyê serbestî û daxwaziyên xwe de çiqas rehet fikiriye. Lê dîsa jin, ji ber çend dijwariyan mecbûr dibîne xwe diparêze, wek misal jin dema »hîv winda bû« dorber tam tarî bû, wê çaxê dilşa ye û êdî »fitara xwe« dike, xwe emîn dihesibîne:

Hîva gundê me derketiye, hîva sava
Hîv xeyidiye, tela bextê min û te re naçe ava,
Lawko qurba, hîv çû ava, paşê were,
De tu were, ser sîngê min evdala xwedê veke,
Forma toyê pêz, mastê medaka şekir ser e.[12]

Herê de mêvan

Mêvan, qurba herkê tu pirsa tamê mala bavê min dikî,
Tamê herî pêşîn e,
Du cêrge dîwarê wî ne
Çargoşe danîne.
Paşiya tewla mala bavê min qul e,
Şev nîveke şevê tê de werê xarê.
Herke dê û bavê min pê hisyan,
Ezê bêjim - ne mêvanê sîng û berê min e,
Qerewilê şevê ye,
Şaş bûye,
Hatiye avê digere, tî ye...[13]

Di çend stranan de hevdudîtina keç/xortan bi saya pêşkêşkirina memikan, dibe edetekî nûjen û hevdem. Çawa tê xuyan, vê carê keç li diya xwe şîretan dike û ya dilê xwe venaşêre:

Were mala bavê min keçikê bi şeve,
Ezê ciya ji xwe û delalê malê re daynim tev li heve,
Heger diyam go: »Çi bû, çi çiriya?«
Ezê bêjim: »Porkurê, edetê xort û keçê vî zemanî yek jî ev e.
Yadê, îro sê ro delalê dilê min xeyîdiye,
Ezê cotê memika bavêm deve«.[14]

Di nav stranên kurdî de pêşkêşkirina memikan hemû şik, dijwarî û nebaweriyên navbera jin/mêran yekten ji ortê radike, ev îfadeyên pêşkêş û xelatan mirov dikare bêje, di van stranan da dibin manîfestoyên evînê. Ji aliyê din çawa em paşê jî bibînin, jin dikarin van manîfestoyan biqelêşin û bavêjin alîkî. Ev yeka jî di folklora kurdî de nîşanên dilsarî, heznekirin û bêdiliyê raberî me dikin. Ev protesto û dijîderketinan dîsa derbarê rola jinan de me gelekî agahdar dikin. Dema jin memikên xwe pêşkêş dike, ne tenê pêşkêşkirin, carcar qala »tapokirin«ê û »tanzîm«ê jî dikin:

Bavê Seyro
Bavê Seyro qurba! çima tu deynakî?

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Her çar malê Aluca li quna diyêr demam nakî?
Sîng û berê min keçikê weke bexçê Zinara Mêrdînê
Ji xwe re tapo nakî...[15]

Di şaxeke vê stranê de ev wekî »tapo û tenzîm« derbas dibe [16].

Barîkatên edebî û memik

Çawa tê xuyan, dema keçekê dil kir, bêtirs dikare bi dilşahî memikên xwe pêşkêşî delaliyê canê xwe bike. Di merc û hoyên zewaca bêdil de, êdî keç vê comerdiyê nîşan nadin, ewqas »sîngvekirî« nînin. Memik para kê ye? Bersîva vê pirsê bi daxwaziya keçê ve gîrêdayî ye. Di serpêhatiya Hecî Mûsa û Gula Ermenî de, Hecî Mûsa tê protesto kirin, Gulê tê rûspî kirin. Ji ber ko Gulê naxwaze bibe jina Hecî Mûsa, dilketîkî wê heye, navê wî Miksî ye. Ev keçka Ermenî enînivîsa xwe ji zûda kivş kiriye: *...heta ez li darê dinyayê sax bim, cotê memikê min, wê ji Miksiyê lawê apê min re be...*

Hecî Mûsa begê ban kir:
Eman Gulê ev sibe ye, xweş sibe ye,
Tu kerem ke ezê biskê werim hinda te ye,
Ezê maç kim cotê memikê te ye.
Mirin heye, qebra tarî mala me ye.
Gulê ban kir: Eman bego wer mebêje,
Ji dînê bavê min re pir xerab e.
Keşê rabû ji ber rahib e,
Heta ez li darê dinyayê sax bim,
Cotê memikê min wê Miksiyê lawê apê min re be...[17]

Di çend stranan de, dema dilketiyê keçekê ji meydanê vedikişe, bar dike an jî diçe dilovaniya xwe, keç sond dixwe wekî êdî sîng û berê xwe veneke, ji bo bîranîna dilketiyê xwe, ew mecbûr dimîne vê gavê davêje: *...Ezê sîngê xwe bikim hepisxane / Destê xelqê neçe nav memikan.*[18] Venekirina memikan di dawiyê de dibe beşeke şînê:

Ez ad dikim, paşî te ez sîng û beran venakim,
Por û guliyan şe nakim,

Bisk guliyan dirêj nakim ji badanê,
Çavan kil nadim ji kildanê...[19]

Di çend stranan de çawa pêş da tê, jin dikarin heta roja mirinê sîng û berê xwe perde kin, veşêrin, çarmedora sîng biparêzin. Ji bo ko kesekî mayî destê xwe dirêjî sîng û beran neke, derî û kulekan digrin. Jin çeperan, heseran dikşînin dora memikan, wek bax û bostanekî. Lê belê dema dil kir, wê çaxê her tişt diguhire:

Kerem ke jorê bibe ezîz mêvane,
Ji seferê hatî, eziyet dîne, ezebê girane,
Emê şermiyê bavêjin ber piyane,
Gerdana min kupî hingivîne,
Şirîn-şirîn bimijîne.
Perda edebê ji ber hilîne,
Bax û bostanê min gihiştîne.
Hesar kirî bo te min hiştine,
Bikeve nave, gul sosinan jê biçîne...[20]

Di van xetan de derbasbûna »perda edebê ji ber hilîne« û »emê şermiyê bavêjin alîkî ber piyane«, wek du nîşanên serbestî û rehetiya jiyana seksuel gelek giring in. Hildana perda edebê mirov dikare wek çend nîşanên jîyîna evîndariyê û jîyîna seksuel yên here bingehî, here radîkal bihesibîne. Dema mirov li ser pêwendiyên jin û mêran yên cînsî difikire, ev rêzan gelek hînkar û perwerdekar in.

Fonksiyonên memikan yên din

Memik wek destxistina hewcedariyên seksuel organeke bingehî e, ji bo ko herdu alî (jin û mêr) di warê seksual de têr bin, xwe rehet bihesibînin, memik roleke mezin dilîzin, ev wek fonsîyona memikan ya yekemîn dikare bê nav kirin. Bi memikan şabûn, maçkirina wan, tevdan, gezkirin, birin û anîn û mizdana wan, rehetîke mezin dide herdu aliyan. Ji der vê fonsiyona memikan, dengbêj çend fonksiyonên mayî jî spartiye memikan an jî memik dibin nîşanên hewcedariyên mayî, wek derman, xarin û vexwarin û mijûlî...

A. Wek Derman: Ji bo qenckirina birînên mêrên xwe, dilketiyên

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xwe, di çend stranan de çawa em dibînin jinan xwastiye memikên xwe bikin derman û melhem têxin devê birînan. Him mêr, him jî jin her yek ji aliyê xwe de gihiştiye bawerîkê: *memik derman e.* Ji bo ko ber dilê birîndar de bê, stranbêja jinîn ji ser cotê memikên xwe re tu tiştekî giranbiha nedîtiye wekî pê bîrînên birîndaran bipêçe:

Bavê Fexro

Ez çûme Bolindê Sebriyê Hecî ne li mal e,
Dibên li şerê tirka, li pira Batmanê birîndar e,
Nizanim çi steqlala Şêx Sehîd, fermana kurdan rabûye,
Berê Sebrî tev birine dane elemane,
Ditirsim birîna Sebriyê Hecî li binya xetê,
Bê hekîm û bê derman e,
Minê cotê zermemikê xwe biqelaşta,
Jê re bikira mîl, melhem û serdermane...[21]

Ev stranan ji alîkî de nêzîkî stranên şînê dibin, her çiqas mirin û kuştin tune be jî, çawa tê xuyan şîn û girîk heye. Di rewşeke awa de qala memikan kirin, ez bawer dikim zêdetir bi daxwaza zû qencbûna birîndar ve girêdayî ye, keçîk dixwaze bi motîva memikan hêviya xelasbûnê li bal birîndar zêdetir bike, bîna wî fireh bigre, bo vê yekê jî diçe bal hekîmê filleh (Erakêl):

Bavê Fexriya

Bavê Fexriya qurba!
Ji înê heta înê,
Îro sê ro bavê Fexro birîndar e,
Di nav nivînê, wey li minê!
Ezê rabim daw û delingê xwe hilgêvim,
Herim Hadhaka xopan, mala Erakêlê hekîm,
Ezê bêjim: Erakêlo qurba! sîng û berê min keçikê,
Bike melhema devê vê birînê... [22]

Di çend stranê mayî de jî, em rastî îfada wek »memik derman in« tên. Bi taybetî kesê ko ji dilketiya xwe dûr dikeve, diçe xerîbistanê, gelek

caran bedhal dikeve, ker û gêj dibe. Keçik ji ber vî derdê dûrketinê, bi stranekê be jî, diçe hawariya wî, di ber dilê wî de tê, dixwaze timê bîna lawikê xwe fireh bigre:

Lawiko
Dilê min li ser dilê min re kale-kale,
Îro cabek ji min re hatiye, dibê lawikê te,
Li welatê xerîbiyê nexwaşe, pir bedhal e.
Li welatê xerîbiyê ne balgî ye, ne doşek, ne perpale,
Ezê îznê ji dê bavê xwe bixwazim,
Herim welatê xerîb, xwe jê re bikim balgî,
Sîngê xwe bikim perpale,
Bila lawkê min bi kêf be, êdî menale...[23]

B. Wek Star: Memik him ji aliyê nermbûna xwe, him jî bi germbûna xwe ve wek stareke giranbiha hatiye hesibandin, wek koşk û serayê hatiye bi nav kirin. Angorî van stranan mirov tenê di nav sîng û beran de dikare bîna xwe derxe, an jî şevên zivistanê xwe di nav de germ bike: *Xwezila şevekê ji şevên çilê kanûna zivistanê / di ber sîng û berê xelka têlî de bibûma mêvan...*[24] Ji aliyê din di çend stranan de memik wek balgî an jî wek mesken hatine bi nav kirin:

Çavêd xwe jê re bikim saqî wextê şerab geranê,
Sîngê xwe jê re bikim balgî wextê palvedanê...[25]

Di straneke mayî de jî keç sîngê xwe dike mesken wek cihekî starê:

Sîngê mi ji te re baxçe ye,
Gul û rihan têda ye,
Meskenê min û te ye...[26]

Hembêzkirin ji aliyê jin û mêr de wek avahîke evînê hatiye dîtin, dema mêr dikeve nav sîng û beran, ev avahî hemû şana xwe di van stranan de nîşan dide:

Heso
Heso, îşev şev e, şev wê bi şilî ye,

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Guhêra hogiçê te av e, avherî ye,
Were têkeve nav dest orxan-doşekê qastûkiye,
Herge qîma te dest orxan-doşekê qastûkî nayê,
Ber serê te cotê zer memika serî sorî, binî spî ye...[27]

C. Wek Ronahiyê: Di çend stranan de memik şemal didin, wek »şemala şevê« [28] hatine dîtin, ronahî û tîrêjên li dorberê memikan peyda dibe, angorî baweriya dengbêj tariya şevê belav dike :

Eyşê

Eyşê qurba, dilê min qîz û bûkê van koçera,
Sîng û berê Eyşa min usa ne,
Nola hîverona van payîza ser bêdera...[29]

Gelo stranbêj çawa ev ronahî û şemala memikan kivş kiriye? Bi baweriya me, ev yeka bi avahiya memikan ve dikare bê şiro vekirin. Ji ber ko di şevên tarî de angorî beşên bedenê yên mayî memik baştir xwe nîşan didin (wek du çiyayên mezin) angorî beşên mayî, memik wek bilindcihekî çêtir xuya dibin an jî bi peyvên stranbêj »şemal didin« wek »hîveronê« ronahiyê dibarînin.

D. Wek Mijûlî: Dema bîna lawik teng dibe, xew nakeve çav an jî li ser rê ye, diçe xerîbiyê an jî şevên dirêj dema wext derbas nabe, keç di gelek stranan de gazî lawikê xwe dike wekî bê têkeve nav sîng û beran, ji xwe re mijûl be, bi memikan şa be, pê bilîze. Bi kurtî memik wek serkanîke bînfirehiyê û çerezê şevbihuriyê di van stranan de derbas dibin:

Şahîno

Şahîno, dîno tu dîn î, tu ne mi distînî, ne direvînî,
Nextikê mi giran e, tê ji kû bînî,
Tu ji xwedê natirsî etfa zîvî li ser sîngê mi dihejînî,
Sîngê mi baxçê gulan û sêvan e, dema bîna te teng bî,
Werê demekê, da tu xemên dilê xwe jê birevînî...[30]

Du zerî

Canê canê,
Du zerî ber derîkê mala bavê min rêze,
Xwîşka mezin ya piçûk re digot:
»Îşev mêvanekî hatiye mala bavê min û te
Rebenê pir ezîz e.
Ezê nizanim jê re çi pêşkêş, çi layîqî, çi cayîz e,
Ezê ji şevekê, nîvê şevanî,
Pêda jê re teslîm bikim cotê zer memikan,
Şevê çilan û kanûnan dûvedirêje,
Rabe, rûnê û pê bilîze«.[31]

Ji aliyê din dema dilketiyê keçekê diçe xerîbiyê, leşkeriyê an jî welatên dûr, wê demê keç memikên xwe pêşkêşî bîntengan dike:

Gondera reşê

Wekî tê carekê mala bavê mi bivî mêvandarî,
Ezê cihê te daynim yalê odê,
Ezê cotê zer memika pêşkêşî nefsa canê tekim,
Xwe re têr şabe, hetanî sibê...[32]

Stranbêj, memik carcar jî wek besteke gerê û seyranê hesibandiye, mirov dikare têda bîna xwe derxe, kêfa xwe binêre: *Sîngê min ji xwe re bike baxe/ nav bigere tax bi taxe.*[33] Ji bo beden mest bibe, rehet bibe, memik wek besteke sportîf dikarin fonksîyoneke mayî jî bilîzin: *...Delalê dilê min hatibû min bibîne/ Xwe di nav bax û bostanê min de bive û bîne.*[34] Ev imkana peydabûna ger, seyran û sporê, bi baweriya me, ji hebûna zêdebûna memikan tê, dilketiyê mêrîn yek çep, yek rast lê dixe, mecbûre e xwe bigevizîne, dema dil bike herdu memikan, navmemikan, serê memikan binêre, ev yeka jî hereket dixwaze, pêwist e xwe bilivîne an jî memikan yek yek bileqîne. Dema dibêjin *»memik derya xorta ne«*, bingehê vê baweriyê, li ser vê rastiya jorîn ava dibe. Dema yek avjenî dike, nikare cihê xwe de bisekine, ew pêwist e xwe bilivîne. Stranbêj hemû ev rûçikên jîyînê û avahiya memikan daye li ber çavan, xwe gihandiye dinya fantaziyan.

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

D. Wek Çerez: Di gelek stranan de memik wek xwarinên cida derbas dibin. Em ji van stranan fam dikin ko tam û xweşiya memikan li ser zarê dengbêj demeke dirêj maye, jê têr nebûye. Çawa emê paşê jî bibînin, di gelek stranan de memik wek fêkiyan hatine nav kirin. Ji der fêkiyan em rastî îfade û xwarinên mayî jî tên wek taştê, firavîn, şîv, paşîv, dimis, çerez, to, kebab, hingiv...Di stranekê de memik wek taştê û firavînê hatine dîtin: *Ezê serê memikê xwe biçilpînim / ji kalan re bikim taştê, ji xortan re bikim firavînê...*[35]

Motîva »mêrên ji heqê memikan dernakevin«

Di çend stranên kurdî û şaxên wan de çawa em dibînin, jin ewqas ji zewaca xwe dilşa nînin, mêrên wan an jî dilketiyên wan: »mêrên ji heqê memikan dernakevin« tên bi nav kirin. Ev mêran ji aliyê jinan de carcar wek mêr nayên hesibandin, navên mayî li wan tên kirin, wek *mêrên çeper, şindo, şindonek, kund, kundo, nemêr, şilek, mêrên kotî, melmelestî, serjinik, pintî, serhevde, mêrên kotî, dewar, mêrên şil û şêt, mirdar...* Sedemên vê dilsariyê gelek in, wek bi darê zorê ve hatin revandin, zewaca bêdil, hewî anîn, çavderiya mêran, ji mêrtiyê ketin û gelek faktorên mayî... Di dawiyê de, ev sartiya malê di pêwendiyên cînsî de digihêje dereceke bilind. Êdî rehetî ji jinan re namîne:

Yadê, navê min keçikê Besna Besnayê,
Weyla min porsorê por belayê,
Teniya Mûşê, heşa Helebê li xwe dayê,
Bavê min xêrê bikî bi çavê serê xwe nebînî.
Çawa nedame xortekî ji mala Hesen Axa apê Behrî,
Simbilsorê ser xaniya, destmala dest lawika,
Roja dawet û eyd û şahiya,
Ez dame Brahîmê Temê, hirçê bûbilanî,
Kerqolanê riya Nisêbînê,
Heq ji sîng û berê min dernayê,
Yadê rebenê, Besê rebenê.[36]

Jin, ji mêrên ko »şevê heta sibê pişta xwe didine jinan« hez nakin. Hemû ev yekan, ji jinan re dîtina imkana dilketiyên nû peyda dikin, wek çawa di stranekê de jî tê xuyan, jin gazî dilketiyê xwe yê nû dike:

Were teresê kuçikê mêrê min bikuje... Di van stranan de çawa tê xuyan jin gelek xemgin û dilsar in:

Deriyê mala bavê min yatamê bi toz û mij e,
De rabe teresê kuçkê mêrê min bikuje,
Tê devê xwe têxe xan û manê gerdenê,
Cotê memika ji xwe re bimije.[37]

Xelîlê Qazî

Ezê Diyarbekira şewitî ketim bi mişmişe,
Toq û beniyê mi rebenê ser bejna zirav xuşexuşe,
Bira bavê min xêrê bike, xêrê nebîne,
Çawa ezê nedam Xelîlê Qazî, lawkê kurmanc,
Ezê dam kum bi qulkî ji vanê bajariya,
Ji êvarê heta sibê li ser sîngê min diponije.[38]

Çawa di van stranan de bi vekirî tê xuyan ko, jin ji mêrê xwe razî nîne. Di strana Xerabo ya ko di nav xetên wê de li dijî mêrê xirab protestoke gelek tûj heye, mirov dikare gelekî bi hêsanî vê nerazîbûnê bibîne. Ev strana ji devê jineke dil bi keser tê strandin, çawa em ji naveroka stranê têdigihên mêrê jinikê kesekî çavder e, jinxapînok e, di nav malan digere. Di stranê de motîva memikan gelek xurt e, jinik bi alîkariya vê motîvê qet nebe li şunda vegerîna mêrê xwe hêvî dike, gazin, lome, şîret di stranê de tevlihev dibin. Jinik bi vî tehrî hundirê xwe dirêje. Stran bi van xetan dest pê dike: *Ruhê bizdonek bi sîngê gewir şa nabe...* Ev îfada di nav salan de bûye gotineke pêşiya û di kurdî de cih girtiye.

De Xerabo

De Xerabo, de xerabo taximê sîng û berê mi kara xezala,
Ji te re nola qesra Pîrota li Mêrdîna şewitî, nû camkirî,
Na welle nola guşiyek tiriyê Çêlikê Eliyê Remo
Di kan û mêwa xwe de nû kemilîn.
...
Xerabo, mal şewitîyo, ez ji te re dibêm tu her şeva Xwedê
Wer tewafa sîng û bera, ramûsanê cotê memikê mi kara xezalan.

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Ji te re nolî sênyek berdîrê yê ter e.
Li Mêrge Mîra jorîn li Qeredaxa şewitî, tu bike parzûnan û torba,
Tu biguvişe av jê here, bi kêrê qelem traşê du dîlim ke,
Damarê geza û şekir ji nav here.
De xerabo, ez ji te re dibêm tu her şeva Xwedê,
Were li ser rûnê bixwe tev megere...[39]

Di çend stranan ji bo sîngtevtanek û destpaşilkekê qala parevekirin û nîvîkirina sîng û beran jî tê kirin:

Kulmalê, bangê Elegezê
Kulmalê, bangê Elegezê tê fîke-fîk e,
De tu were telebextê min re,
Fîno xar ke, qotikê serda sî ke.
Agirê kulê beyta ocaxê bavê ketê,
Were xal û xetê sîng û bera,
Min û dewarê mêrê xwe nîvî ke.[40]

Di straneke mayî de jineke mêrkirî bahsa »kilîta cotê memikan« dike û kilîtê teslîmî dilketiyê nû dike:

Sebrê

Lo lo taxima sîng û berê min ji te re,
Yek gul û yek sosin û yek çîçek e,
Tu tevî sêsed sîwarê me Hesena lê peya be,
Berxo tu guleka xirab neke.
Kotî mîskînê mêrê min, fesad û dewûsê gunda xeberdar neke.
Ezê kilîta cotê zermemika teslîmî te kim, tu li cêba xwe ke,
Bîna te teng dibe, rebeno rojê carekê derî veke.[41]

Formên memikan

Di stranên kurdî de dema dengbêj qala memikan kiriye gelek tiştên mayî anîne ber çavan, wekhebûna memikan û van tiştan li ser binge-hên mantiqî ava kirine. Di nav van pîvanan de tehr, reng û prosesên gihiştina memikan cihekî fireh digrin.

A. Tehrê Memikan: Dengbêj di gelek stranan de memik wek fêkiyan dîtiye û navê fêkiyan li memikan kiriye. Çima fêkî? Ez bawer dikim ji der guloverbûna memika û fêkiyan, zêdetir dengbêj ew tam û lezeta ko demekê di fêkiyan de tam kiriye, di memikan de ji nû ve kivş kiriye an jî dixwaze kivş bike. Ji ber vê yekê jî him guloverbûn û him jî tam û lezeta memik û fêkiyan di van stranan de ketine nav hev. Ew fêkiyên ko di stranên kurdî de wek memikan hatine pejirandin û nîşandin wek misal ev in: sêv, xurme, tirî, porteqal, hêjîr, guz, qawin, hinar, şememok...Peyva here zêdetir hatiye bi kar anîn, şemamok e: *Memkê xezala malxirab sor bûne / mîna şemamokêt deşta Hesîna.*[42] Angorî beşên Kurdistanê yên cida, cihê belavbûna stranan, ev dorberan li ser zêdetir bikaranîna curê fêkiyan jî tesîr kiriye, wek misal di nav kurdên Sûriyê de, di nav stranekê de derbasbûna »porteqalê Yafayê« normal e, ji ber ko, nêzîkbûna van sînoran navdariya porteqalên vê navçê eşkere dike:

Li ser zilfê danî,
Xulamê cotê memikan,
Porteqalê Yafayê,
Devê dikana danî...[43]

Fêkiyên baştirîn li kîjan bajar, navçe an jî li kîjan herêmê digihêjin, stranbêj navê van cihan û memik gihandene hev, bi hevra bi kar anîne:

Elê Meyrê

Ezê sîng û berê Meyrema xwe dibêjim
– Xurmek xurmê vê Bexdayê,
Hêjîrek hêjîrê vê Şengalê,
Tirîk tiriyê Bisindirê,
Qawinek qawinê Diyarbekirê,
Xort nizan be, xwe re bike çerezê şevbihêrê...[44]

Ji der tam û lezeta fêkiyan, ji aliyê din ew bîna xweş ya ko ji fêkiyan tê, vê carê dengbêj çawa kivş dike wekî ji memikan jî bîneke awa xweş tê. Di çend stranan de em rastî îfadeyên derbarê bîna memikan tên, wek misal: *bîna memka em kotin, bîna memka em xwarin...* Ji ber ko memik

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

di bin kincan de zêde dimînin, ew xwey didin, wek hêkan disincirin, germ dibin, di çend stranan de vê carê em rastî îfade »hilma memikan« tên: *hilma memka em xwarin.* Dema ev bîn û hilma memikan tevlihev dibe dinya bûye ya dengbêj.

Dengbêj memik ne tenê wek fêkiyan dîtiye, çawa di çend stranan de tê xuyan navê gelek tiştên mayî jî, li memikan kiriye. Dema memik û ev tişt dane ber hev, rûberî hev kirine, bêşik wekhevbûna van tiştan û memikan daye ber çavan, wek kanî, kulîlk, baxçe û bostan, zêr û zîv, maden, fincan...

Çi ye nêzîkiya di navbera kanî û memikan? Ez bawer dikim bersîva vê pirsê diçe digihêje wekhevbûna şîr û avê, herduyan jî mirov vedixwe, dengbêj memik wek cot kanî dîtiye, kaniyên ko li şuna avê şîr jê dikişin. Ava van kaniyan agir û şewata di dilê stranbêj çiqas dide sekinandin? Bersîva vê pirsê jî dîsa di nav fonksîyonên memikan yên duwemîn de veşartiye:

Hey lê, lê

Hey lê, lê, hey qemerê!
Gundê Dodo du gelî ne,
Cotê zer memika cot kanî ne,
Wey malîno, hûnê qet dey nakin,
Ezê destê çav-birûyê beleka dimirim,
Hûnê bawer nakin.[45]

Lê gewrê

Min serê memika givaşt
Sê fincan av ji hatin xwar,
Min fincanek jê vexwar,
Û ez bûme wek zîveal
Ez bûme wek merekî teyar...[46]

Di çend stranan de memik wek fincanan bi taybetî wek fincanên ferfûrî hatine hesibandin. Ji alîkî de tehrê fincanan (giloverbûna wan, xweşikbûna wan), ji aliyê din fonksîyona (motîva vexwarinê) fincanan û memikan ji hev ne dûr in. Carcar em rastî îfadeyên »fincanên dest

hakiman«[47] û »fincanê dest axeleran«[48] tên. Çawa di van stranan de jî tê xuyan, di salên kevn de fincanên hakim, axa û began giranbiha bûne. Bi saya vê giranbihabûnê stranbêj xwestiye hêjabûna, giranbihatiya memikên dilketiya xwe jî nîşan bide:

Hesreta min

Hesreta min ji mala bavê derket,
Bi min re xeber nade
Nizanim çira?
Bejin zirav e mîna hal-halê nav geniman,
Memik spî ne mînanî fincanê dest hakimam
– Keçê, kulmalbavê,
Te goştê min helandiye
Bi waqî, bi derema
Hestûyê min helandiye
Kiriye şima...[49]

Stranbêj ji bo ko bedewî û xweşiya memikan bi tehrekî baştirîn bîne zimîn, hemû rê û imkanên hinerî ceribanidine. Carcar sîng wek baxçekî, di nav vî baxçeyî de memik jî wek »baqê gulan« bi nav kiriye. Di strana Eyşanê de awa tê gotin :

Eyşanê

Sîngê gewrê baxçe ye, Eyşanê,
Baqê gula di nav da ye, Eyşanê...[50]

Mirov li vir baş têdigihê ko baqê gulan memik in, di çend stranê kurdî de carcar peyvên sîng û memik bi hevra tên bi kar anîn, di van stranan da sîng wek deşt, zozan, bostan û baxçekî fireh tê nexş kirin, memik jî di nav vî erdê fireh de cih digrin. Li vira êdî sîng li şuna memikan derbas nabin, ji ber ko qala memikan xwe tê kirin. Lê belê carina jî dema qala memikan nayê kirin, mirov vê çaxê têdigihê ko peyva sîng memikan îfade dike.

B. Rengê Memikan: Di stranan de rengê memikan ji hev cida dibin. Ji aliyê din beşên memikan (serî, binî, xalên memikan) jî, bi rengên ci-

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

da carina tên nîşan kirin. Di gelek stranan de memik wek berfa spî ne. Sedemên vê yekê angorî beşê bedenê yên mayî, memik zêde hatine parastin, rûyê rojê nedîtine, zêde spî mane. Her çiqas peyva gewr ne wek peyva spî be jî, li şuna peyva spî carcar em rastî peyva gewr jî tên. Zêtir di stranên kurdî de memik bi rengê zer hatine nîşandin. Dema memik digihêjin, vê carê em rastî peyva sor tênê: *Memkê xezala malxirab sor bûne / mîna şememokêt deşta Hesina...* Ev sorbûn ji alîkî de bona serê memikan derbas dibe. Dema memik digihêjin, xalên li dorberê serê memikan çawa tê zanîn reng diguhirînin:

Eyşan

Taximê sîng û berê Eyşana min gihiştine,
Xalê sor û zer ketinê.[51]

Ji aliyê din, di çend stranan de stranbêj rengê serê memikan û binê memikan, koka wan ji hev cida kiriye, serî bi taybetî sor, binî û kok jî, bi taybetî bi rengê zer û spî ve boyax kiriye, ji tonên tarî berbê tonên vekirî çûye. Bi rastî jî, angorî bin û koka memikan, serê wan zêdetir bi tonên tarî ne, sor, qehweyî û qemer in. Stranbêj ji bo ko vê ferqa rengan zelaltir ji hev cida bike, çawa em dibînin ji xwe re motîva siyê peyda kiriye. Çawa tê zanîn cihê ko sî lê dikeve, angorî beşên mayî zêdetir di nav tariyê de dimîne, ev beşa jî serê memikan e:

Kezîzerê kezîzer,
Xulama memkê gulover,
Serî sor e, binî zer,
Mîna berfa newala,
Siya dara tim li ser...[52]

Tiştekî mayî jî heye, dema di stranên kurdî de behsa tehr û rengê memikan tê kirin, memik û tiştên here giranbiha di nav hevda hatine honandin, wek zêr, zîv, maden, fincanê ferfûrî...

Têlî

Têlî heyran, li zozanê Serhedê dilê min bi xem e, bi birîn e,
Îşev serê birînê min girtiye temam av û xune,

Mala Têliyê çûye zozanê tevlê jorîne,
Hespê min rewan bûye, şopa Têliyê digerîne,
Ketim Pîro, Qendîl, Bîngolê, Sîpanê, Şerefdînê,
Berbi Xelatê, Şuşanê, Tekmanê, hatim welatê jorîne,
Mi xwe berda binya Kosedaxê, çend kon vegirtîne,
Sê zerî min dî wê de serê kaniyê rûniştîne,
Min go, gelî heval, ya mezin Têlî ye,
Herdê din jê re xizmetçîne,
Gişta go, derewa meke, çavê te çawa ji dûrve dibîne.
Min go, nîşanê Têliya min bellî ne,
Yeke esmer e xwîn şirîn e,
Çavê reşe kil kirîne,
Tiliyê wê armûrî ne,
Çene top, poz bele tujîne,
Lêv tenik kaxitîne,
Ziman celxê qelemîne,
Diranê hûre sedefîne,
Gerdenê spîne cembelîne.
Memikê Têliyê fincanê ferfûrîne,
Serê memika temamê zîvê çarcarîne,
Koka memika temam zêrê reşadîne,
Têlî, vê sibengê ezê tiştekî bêjim, bila dilê te nemîne,
Qedera ko berê ji bavan de hatiye nivîsandin torelîne,
Çiqa zeriyên mîna Têlî hene, para mêrkê kotîne.[53]

Gihiştina memikan û serhildana wan

Di stranên kurdî de memikên here baştirîn memikên ko bi hemdê xwe digihêjin, memikên ko zêde pê nehatine lîstin, memikên here ciwantir tên hesibandin. Memikên ko dest pê neketine di van stranan de memikên keçên çarde salî ne: »Xweziya min tê li wî xortî / di çarde saliya xwe de dest bavêje cotê zer memikan«. Memikên nûgihiştî, memikên keçên azep û xama angorî memikên jinên mêrkirî û pirzarok gelek hişk in û ji guloverbûna xwe tiştek zêde winda nekirine, timê gilok û gulover mane. Di çend stranan de ji bo ko vê hişkbûn û sertiya memikan bîne zimîn, stranbêj memik wek sêvan dîtine û peyva »ter« bi kar aniye. Çawa tê zanîn tiştên ter gelek hişk in, natewin, formê xwe

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bi carekê winda nakin, wek darên ter:

Tu li kû da diçî yek seriya li min vegere,
Ev herdu memikên min mîna sêvên payîzê,
Serê dara bimîne hê ter e.
Malê me danîne gundê vî quntarî,
Xwazgînçî li mala bavê min rûniştî,
Qelendê min digot, xelatê min dibirî,
Xizêma pozê min mîna çerxa felekê li hev dizvirî.
Lawikê min bona ramûsanekê,
Hate ser singê zeriyê, şîr tune bû, dîsa para zivirî.[54]

Di xeta dawîn ya vê stranê de derbasbûna »şîr tune bû« bêguman tunebûna mercên hevdudîtinê an jî vê rewşa nebaş nîşan dide.

Memikên ko di wextê xwe de digihêjin, di stranên kurdî de wek avahîkê, koşk û serake roj bi roj bilind dibe, hatine hesibandin, ifada »taximê memikan« piçekî jî, mirov dikare bibêje ko li ser vê saziyê hatiye afirandin:

Xerabo
Serê memikê min xatûnê,
Mîna tiriyê Çêlikê Eliyê Remo
Di çax û benga xwe de digihiya,
Û di mêwa xwe de dikemilî,
Mîna qesra Pîrota,
Serê mihela Meşkîna,
Li bajarê Mêrdînê avakirî.[55]

Mezinbûn û gihiştina memikan di stranên kurdî de wek »serhildana memikan« hatiye hesibandin. Memik, çawa tê zanîn di kontakt û nêzîkiya bedenî de tesîreke gelek zû nîşan didin, bi taybetî serê memikan gelek jîndar û nazezîn in: *serê memikê te tûj in / weke serê derziya.*[56]

Gulê Gulê
Destê xwe kir paşilê,
Çi paşilek xweydayî,

Serê memikan hildaye,
Memik para xorta ye...[57]

Ev serhildana memikan çawa em dibînin di çend stranên kurdî de, bi serê xwe wek bûyerekê hatiye hesibandin. Memik silavan didin, deng dikin û bû lez û bez reng diguhirînin, sor û zer dibin...

Eman, eman dotmam

Vî kerî pezê çendî va ye,
Nêriyê nav de notla ga ye,
Lawikê min qesta sîng berê min kiriye,
Cotê memikan jê re silav daye.[58]

Dilber

Cotê memikê mi keçikê, mîna du kewê gozel,
Bi sariya sibehê re,
Li paşilka mi keçikê dikin şêre-şêro.[59]

Memikên keçên nûgihiştî an jî memikên ko zêde nebûne »destmala dest xortan« çawa me li jorê jî gotibû hişk û gulover in, wek sêvan: Memikê dosta min sêvê sor in / Hêdî bidine ber wan gezane.[60] Çawa tê zanîn tiştê hişk û sert tên gezkirinê, ji ber vê yekê jî dengbêj memik û sêv wek hev dîtiye, an jî tiştekî mayî aniye li ber çavên xwe: *Sîngê vê teresbavê hişk bû / Mîna helawa Entabê / Bi çakûç û tevşoyê/ Destê neçaran û merengozan nedikşiya.*[61] Ji aliyê din dengbêj wek fêkiyê ko digihêje û ji çiqlê darê dikeve, dema gihiştina memikan jî tespît kiriye:

Bedewê

Girîdaxa ber bi dunê,
Sûret sor bûne xal ketinê,
Par vî çaxî memkê kewa min tune bû,
Îsal vî çaxî hatine ber ketinê...[181]

Di hin stranan de wek kulîlk, gupikên daran çawa vedibin, memik jî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

wisan dipişkivin an jî dipeqin. Dema memik mezin dibin, ew dikarên angorî dengbêj kirasên keçan jî bidirînin: ...*memkê te li du cî kiras didirî.*[182]

Guhastina formê memikan

Ew bedewî, guloverbûn, hişkbûn û rengîniya memikan çawa em dibînin di çend stranên de winda dibin. Di van stranan de em rastî peyvên mizdan, tevdan, gez kirin, givaştinê tên. Piraniya van stranan ji devê mêran derdikevin. Ev yeka jî nîşan dide, mêr li dijî guhirîna formê memikan nerazîbûna xwe li hemberî jinê nîşan dide: *Memkê vê tolbavê sistbûne ji mizdanê.*[183] An jî çawa di straneke mayî de tê xuyan vê carê mêr ji zêde tevdana memikan gazinê xwe dike: *Ezê orta sîng û berê kawa xwe dinêrim / Gişte xirte-xale bi nîşana tevdanê.*[65] Carcar jî çawa em dibînin ji ber çend sedeman wek ji hev dûr ketin û dilsariyê memikên jinê »bê tîmar« dimînin:

Sêmalo gundo

Ez çûme derê çeman, çemê sar in,
Zozanê bavê te bilind in,
Berf û baran lê dibarin.
Îsal sala hefta ye,
Berî lawkê min ketiye,
Welatê xerîb û xurbetê,
Sîng û berê min fadilê!
Bê mihas û bê timar in.
Yar, yar, yar xopano gundo!...[66]

Ji ber tevdan, mizdan û gezan an jî sedemên mayî çawa tê xuyan di van stranan de memik êdî wek memikên kevnejinan ji hev çûne, wek goştê kelax in, çilmisîne û vê rewşê bala dengbêj gelek kişandiye.

Dizên memikan û micizeya vebûna bişkokan

Di nav stranên ko li ser memikan de hatine gotinê, peyva ko zêdetir li bala mirovan dikşîne, bêguman peyva bişkok e. Çi pêwendiyên

memik û pişkokan hene? Di serdemên kevn de jinên kurd memikên xwe bi pêsîrdank (berpêsîr, çiçikbend) ne diparastin, tenê memikên xwe di bin kincên bişkokkirî de vedişartin, lê belê dîsa jî rîskê xuyabûna memikan hertim zêdetir bû. Ji ber van sedaman di gelek stranan de motîva bişkokan wek motîveke şer û dew derbas dibe. Ji aliyê mêran de kêmbûn an jî tunebûna bişkokan şahîke here mezin! hatiye hesibîn. Di stranan de em rastî vekirina bişkokan (bi destê mêran) nayên. Ev yeka jî nîşan dide ko tenê îrada mêran roleke ewqas mezin nalîze. Daxwaza jinê zêdetir giringtir e. Ji ber hevdu famkirin û hevdu hizkirinê çawa em dibînin pişkokên pêsîran carina bi xwe jî vedibin! Dema bişkok vedibin, memik bi xwe difirin derva. Di bin vebûna van bişkokan de bêguman daxwaz û evîna jinê roleke mezin dilîze. Ji ber vê yekê jî dizên memikan hertim nagihêjin armanc û xwaziyên xwe.

Jina kurd hebûna memikên xwe angorî memikên mêran (yên korbûyî, şundamayî) hertim wek serdestîke mezin dîtiye. Bo vê yekê jî parastina memikên xwe û pirsa pêşkêşkirina wan, di van stranên lîrîkî de cihekî fireh digre.

Angorî daxwazî an jî bêdiliya jinê demên vebûn / pevxistina bişkokan ji hev cida dibin. Biryar dîsa di destê jinan de ye. Ji ber vê yekê jî dizê memikan hertim bi hêsanî nagihêjin armancên xwe: *Ezê dikim herim diziya cotê zer memikan / Destê min kete moriyê lingan.*[67] Dizên memikan her rê û imkanan diceribînin wekî xwe bigihînin cotê memikan :

Ay ay li min, kubarê dinê!
Derê Meşkîna xopan bi şewitî, ne tu der e,
Pozê kela Mêrdînê bişewitî, tim rasere.
Xweziya ez bibûma zêrekî mehmûdî,
Ji xanboxaza qirikê xwe berda,
Nava cotê sîng û bera!
Sîng û berê xelka têlî kaleboze spî ne,
Mîna baxçekê Siltan Evdilhemîd,
Bi şev û rojê qereqol û newbet tim li ber tê!
De ay ax li min, of of li min!
De ax ax li min, tengezar im Xwedêwo.[68]

Lê dema jinekê dil kir, wê çaxê bişkok êdî xwe vedibin. Çima xwe ved-

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ibin? Ji naveroka stranan em fam dikin ko, êdî her tişt bi hemdî xwe, bi qamê xwe dimeşe, du dil bûne yek. Dema du kesan hev hez kir, bêguman bişkok êdî xwe vedibin, kes pişkokan venake. Di van stranan de bişkok ya diqetin, ya difilitin..! Avahiya lêkeran (verb) timê pasîf in. Ev hilbijartina gramatîkî, ji alîkî de rola zorê ji ortê radike. Çawa di stranekê de tê diyar kirin êdî »sî û şeşbişkokên zîvîn« hatine vekirinê, kê vekirine? Ev yek nayê zanîn, wek micizekê evînê tê xuyan:

Delalo, mi bêrî kir, te bêrî kir,
Riya Mendara şewitî li newalê me li hev hêvî kir
Bişkokê mi rebenê xwedê filitî, sînga gewr spî kir.[69]
...
Vî zinarî li me sî kir
Bişkok qetiya, sîng spî kir,
Emrê minî sed salî hebû,
Minê te re tev nîvî kir.[70]

Di stranên Zerî domamê û Merdînê de çawa em dibînin di navbera lawik û keçikekê de li ser memikan tê deng dikin, şer û dewek heye, dîtinên cida davêjin ber hev. Angorî naveroka van strananên dirêj, misal wek strana Zerî domamê, dema keç pey miyên xwe diçe, erdê dikeve »sêsed û şêst şeş bişkokên« keçikê diqetin, lawik wê çaxê memikên keçikê dibîne. Lê belê cara pêşîn keçik van bawerî û dîtinên lawik qebûl nake, xwe li dijî van »îftîran« û »bêbextiyan« diparêze û ji lawik dipirse:

Zerî domamê

— Kuro kulmalo, ya bêbextî serda hato,
Te wextê serê zer memikê dîne,
Nav û nîşanê wan çiye, çi nîne ?
...
— Kuro kulmalo, te wexta çifte zer memikê mine zer dîbûn
şede, şudê te kî, kî bûn ?

Paşê di navbera keç û xort de ev diyaloga jêrîn derbas dibe. Keçik di dawiyê de têdighê ko bi rastî lawik memikê wê dîtine, kesekî nas e:

Keçê, kulmalê, wextê min çifte zer memikê te zer dîbûn,
Neh hebe li wêderê hezire sekinîbûn:
Sê heve Celalî bûn,
Sê heve Rojikî bûn,
Sisêye Sîpikî bûn.

— Kuro, kulmalo, hersêkê Celalî qaçaxê çiya bûn,
Hersêkê Rojkiye vireke derewîn bûn,
Hersêke Sîpikî razgone, cînarê mala bavê min bûn,
Usa ne te çifte zer memikê mine zer dîne...[71]

Him di strana Zerî domamê de, him jî di strana Merdînê de çawa tê xuyan bi rastî lawikan memikên van keçikan dîtine. Ji ber vê yekê jî keçik cotê zer memikan xwe pêşkêşî »helaliyê canê xwe« dike. Çawa di straneke mayî de jî tê xuyan, hertim kilît di destê jinê da ye: *Heger tu pirsa kilîta cihê memikan dikî / qifil û mifte destê min e.*[72] Di gelek stranan de berî ko bişkok vebin, cara pêşîn dest li ser morî û zêrên li sto û gerdenê tên û diçin. Her çiqas fonksîyona morî û mircan û zêran cida be jî, di her sîngtevdanekê de ew tên qetandin. Di stranên kurdî yên evînê de morî û mircan, zêr û zîvên gerdenê û bişkok wek motîv, bedewîke mezin pêk tînin, xemleke bêhempa didin van stranan.

Dema jinek dil nake yek dest bavêje cotê memikan êdî derge tên girtin. Jina kurd di vî warî de gelek serhişk e, gavekê paş da navêje. Dema Zîn ji ser Memê re tu kesekî nahebîne, heft dergê mala bavê wê yên pola timê girtî dimînin:

Memê û Zînê

Zînê got:
— Heft dergê mala bavê min, heft jî pola ne,
Temam qerebaşî pelewan e,
Heqê bavê kê heye,
Vê êvarê devê xwe bigihîne xala sîng û berane...[73]

Hertim ne tenê mêr li pey jinan in, carina jî jin pey mêran in, qayde û qanûnan davêjin alîkî. Angorî erf û edetên kurdan ev jinan,

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

xortxapînok in. Gelek caran ev jinan wek »jinên nav malan« tên bi nav kirin. Di destana Zembîlfiroş de, dema Xatûn dil dike wekî Zembîlfiroş bibe dostê wê, Zembîlfiroş vê yekê naxwaze. Lê dîsa jî ev xatûna dewlemend, xortxapînok û provakatîf sîng û berê xwe vedike, dixwaze wî ji rê derxe: ... *Derî dadaye / Ser sîng û berê xwe vedeya.*[74] Dema jinek sîng û berê xwe yekten, nêşkêva li pêşberî mêrekî veke, bêguman ev tabloya nûpêkhatî dikare hiş û mêjûyê stranbêj tevlîhev bike, çokên stranbêj bilerzîne, wan welat welat bigerîne:

Sînem delalê çaxê min û te,
Li çemê mîra li hev seyran kir,
Min serê xwe danî bû li ser çoka,
Jêlil temaşeyî xalan û biskan kir.
Dema çavê min li sîng û berê Sînema min diketin,
Misir, Beyrût û Şamê tê ra xuya kir.[75]

Cenga li ser memikan

Di çend stranan de jina kurd zêdebûna hejmarên dilketiyan wek telukeke li dijî memikên xwe dîtiye û li dijî van êrîşan parastina memikên xwe di hin stranan de dike pirseke sereke. Li ser memikan cengê mêran, wek êrîşên polîtîk bi nav kiriye, carcar jî rewşa Kurdistanê û ev êrîşên li dijî memikan rûberî hev kiriye. Cengê li ser Kurdistanê wek cengê li ser memikên xwe dîtiye. Ev motîvên polîtîk û evînê di van stranan de ketine zikê hev:

Bejna min

Bejna min, nazik e, ta rihana şeng e,
Sûretê min usa ne, notla hermûşê peng e,
Sîng û berê min usa nin,
Notla text û payê Kurdistanê,
Îsal heft sal e, danzdeh qirala li ser qal û ceng e.[76]

Di straneke mayî de, dema li ser memikan tê sekinîn, em rastî îfadeke wek vê îfadê tên: ...*na welleh nola Siltan Reşîd, şert û qayîşê heft duwelê ecnebî li ser e...* Di van stranan de derbasbûna van îfadeyên polîtîk û

dîrokî rengekî gelek hinerî tevî van stranan dike. Ji alîkî de jî, jinê him hebûna xwe ya jinîn û him jî telukeyên li dijî hebûna welatê xwe xwastiye bîne zimîn. Di straneke mayî de, stranbêja jinîn hêjabûna memikên xwe wek »paytextê mîrê Kurdistanê« dibîne:

Derdo

Kuro mi j'te re ne go,
Zimanê te qelem e, sîngê mi defter e,
Serê sibehê, mînakî melayê diwanzde elîm,
Tu dixwînî li ezbere.
Sîng û berê mi etîma Xwedê,
Mînanî paytextê Kurdistanê,
Salê diwanzde meh,
Şer û qewxeyê diwanzde,
Dewletê ecnebî, daîm li ser.[77]

Çend motîfên dînî û memik

Ji der motîvên polîtîk, di çend stranan de hin motîvên dînî (olî) jî, bi tema memikan ve tevayî derbas dibin. Jina kurd di van stranan de zêdetir pesnê memikên xwe dide, bi alîkariya îfadeyên dînî »edebiyateke memikan« diafrîne. Di van stranan de wek misal em rastî îfadeyên fitir, zekat, melek, xwedê, rojî, paşîv, hec, teberik, şêx û mele tên. Ji ber ko di nav her civatekê de bîr û bawerî, motîv û nexşên olperestî (dînî) timê bi rûmet bûne, stranbêj xwastiye ji vê rûmetê behrekê girê bide, jê îstîfade bike. Lê belê çawa em dibînin, stranbêj hêjabûn û giranbihabûna memikan li ser van xemlên olperestî re girtiye, cihekî hin jî rûmettir daye memikan. Di van stranan de memik bûne zêr û zîv, maden û wek bihuşteke derewîn, rengîn û şengeşox:

Wele sîng û berê min evdala xwedê,
Mînanî baxçekî Zinara Mêrdînê,
Serê salê sê cara zekatê mala Xwedê lê dikeve, lo!...[78]

Di straneke mayî de ya ko evîna li ser keçeke tirk têda derbas dibe, memik wek fitara êvarê hatiye bi nav kirin:

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Keçêdînê

Lê gewrê, lê xezalê,
Kanî rinda nav malê,
Weyla mi memik xwarê,
Memik fıtara êvarê.
Keçê dînê tu zanî,
Te ez kuştim, te ez helandim,
Tu b'kurmancî nizanî,
Asker oldum peyade,
Te'lîm bilmem ne çare...[79]

Di strana din de jî, çawa em dibînin vê carê li ser memikê Eyşê »cotek melek« dixwînin.[80] Dema memik tên xuyanê micizeyên nedîtî, bûyerên nehêvîkirî dikarin peyda bibin, wek »Eger vekim bişkokê sîng û berokê memikane / Heciyê vegerin ji riya Mekane«[81], »Eger hûn bişkokêd sîng û berokan vekin/ Wê miriyên gora zêndî bikin«.[82] Dema memik vedibin, stranbêj ji Xwedê re hurmetan dişîne û şikiran dike: »Sîng û berê wê gulbarane/ Ezê bîhn kim, ji xuda bikim şikirane.«[83] Di straneke mayî de, motîvên olperestî û tema memikan bi temamî ketine zikê hev:

Were mala bavê min derî veke, bê bismila,
Gava tu ketî cem min, te lihêf bilind kir,
Bê yarebî, sed maşalla,
De gava devê xwe avêt xebxeba çînaxî, qirika minî poşnaqî,
Te devê xwe qirika min deranî, bê yarebbî, hemdulla,
Sîng û berê min te re bozî-beyazî,
Mîna beyaz kaxita destê xoce û mella.[84]

Çawa di straneke mayî de jî em dibînin, vê carê cotê memikan ji bo xêr û xweşiyê bîne, bona dergekî xêrê li pêşiya xêrxwazan veke, wek teberik tê pêşkêşkirin:

De gidyano
De gidyano! De gidyano!
Navbeyna min û bejna zirav bi dîwar e,

Alî kils, yek nikar e.
Cotê memkê min xanim xatûnê,
Yek sêv, yek porteqal e.
Keçikê gazî dikir digo: Lo...lo lawiko,
şevkê ji nîvbenda şeva û pê ve,
Were tewafa sîng û berê min keçikê,
Ji te re xweştir e,
Ji teberika mala şêxê Kal e.
Ji girêdana piştê ber jor de,
Tu çi dixwazî ez minêkarim,
Ji girêdana piştê û ber jêr de,
Ez mirîda şêxê Kal im,
Çi bixwazî ez nikarim.[85]

Di dawiya vê stranê de, tiştekî gelek balkêj jî, keçik bedana xwe ji piştê (navê) ve dike du beşa: beşa jor, beşa jêr. Di navbera herdu beşan de besa girêdanekê jî dike, beşa jor sîng û ber tev de pêşkêşî lawikê xwe dike, beşa jêr bi tehrekî gelek nazik perde dike. Ev yeka jî nîşan dide ko, di stranên kurdî de navça here erotîk memik in, ji navê berbi jor. Motîvên li ser beşên bedenê yên mayî (ji navê berbi jêr) wek navçên erotîk ewqas balkêş nînin.

Peydabûna temaya »jinên memikfiroş«

Tema »Jinên memikfiroş« zêdetir di nav stranên ko ji devê mêran derketî, cih digre. Mêrên ko evîndar bûne, hertim çawa di van stranan de tê xuyan, negihiştine daxwazên xwe, hêviyên wan nehatine cih. Ji ber vê yekê jî, van mêran di hembêza xem û xeyalan de ji xwe re imkan û mecalên nû peyda kirine, wan di zerya xewnerojan de bi tehrekî hinerî avjenî kirine, çûne û hatine, bona ko ji xwe re cote memik dest bixin. Em di çend stranan de rastî peyvên dikan, suk û bazar, mişterî, kirîn û firotin... tên. Ji ber çend dijwarî, bêgavî û bêmecaliyên jîyînê, stranbêj xwe avîtiye ber bextê xem û xeyalan. Di van stranan de keç hertim di rola memikfiroşek, xort jî di rola mişterîkî de ye:

Helîmcanê
De bi can be, Helîmcanê,

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Ê lê Helîmcanê,
Heyran ez ne tî me,
Û ez ne birçî me.
Ez li ber sîhka Bitlîsa xopan rûniştîme.
Ê lê Helîmcanê,
Heke tu avkişênî, ez gelek tî me,
Heke tu nanpêj î, ez gelek birçî me,
Heke tu sîngfiroşî, ez mişterî me,
Heke tu nafroşî,
Roj hizura heq,
Ezê li ser pela selatê,
Destê min û dewa te
Ezê li Helîmcana xwe de'weçî me...[86]

Di van stranan de derbasbûna peyvên *sîngfiroş û mişterî,* ji alîkî de evîndariya mêr çiqas bi şewat e, gelek baş eşkere dike. Bêguman ev peyvan ji kirîna memikan zêdetir, destxistina memikan îfade dikin. Bi gotineke mayî hêviyên hevdudîtinê, evînê eşkere dikin. Li vir mirov nikare pêwendiyên ekonomîk û bazirganî bîne bîra xwe, wek misal: – *kawa min meşiya dikanê / memik birin firotinê.* [87] Di vê stranê de tiştê ko mirov jê derdixe ne kirîn û firotina memikan e, mebest hêviya destxistina memikan e, ev yeka tenê di nav sînorê daxwazekê de dimîne.

Çawa me berê jî gotibû, dengbêj di navbera fêkî û êmîş û memikan de tu cidadîk nedîtiye, wek *»paşil tijî êmîş e«*.[88] Li vir peyva êmîş li şuna memik hatiye bi kar anîn, ciyê ko fêkî û êmîş li tê kirîn û firotinê. Angorî dengbêjê mêrîn û fantaziyên wî, li wir mirov dikare memikan jî, ji xwe re peyda bike. Ji ber vê yekê jî pey riya sûkê (pazarê) ketiye û ji keçikê pirs kiriye: *Zer memika nafroşî?*[89]

Ji bo kirîna memikan çi ji destê mêr tê dide, yek û du nabêje, timatî û çikûsiyê davê alîkî:

Seyran

Seyranê, min xulama te li wî devî,
Gundo, lo malîno, ezê bextê we ketime,
Gazin-loma ji min nekin,

Ezê terka çav-birûyê Seyrana Mele Mûsa nakim.
Hetanî serê Qereşdaxa xopan,
Ranebe mêrg û zevî.
Seyranê minê sond xariye
Gere sûretê te sor bidim ber vî devî.
Seyranê, min xulamê te wî devî, xeberdanê,
Gundo, lo malîno, ezê bextê we ketime,
Hûnê gazin-loma min nekin,
Memikê Seyrana min wisan in:
Serî sor in kokê wan spî ne,
Notilî sêvêd Xelatî ne,
Notilî xurmê Herebî ne,
Na wele, notilî tiriyê Rewanê sincirîne,
Wê anîne hefa mala firotinê,
Herke xelqê rabe bide mal-halê dinê,
Ez sêfîlê xadê rabim bidim,
Herçar mîngê xwe tên ber dotinê,
De bavê, Seyran xeyidiye bi min re nayê...[90]

Gelek caran memik di stranan de wek sêvên firotinê hatine nîşandan. Çawa me li jor jî gotibû, ji aliyê tehr, tam û lezet û hişkiya xwe ve, dirûvê memikan angorî dengbêj gelek li sêvan ketiye, wek hev hatine hesibîn. Ew bedhalê ko cotê memikan wek derman dîtiye, çawa di stranekê tê xuyan, dîsa riya dikanê digere: ....*Memik sêv e li dikanê.*[91]

Bi kurtî mirov dikare bibêje ko di hemû van stranan de ev motîvên li dora tema memikan berev dibin, nîşan didin ko, memik bi salan wek nîşaneke mezin ya şaxsiyeta jinan hatiye pejirandin. Bi kêmanî materiyalên folklorîk vê rastiyê ji me re pêşkêş dikin. Ji aliyê din li ser jîyîna seksuel ya jinên kurd, di paşerojê de, ev stranan wek referans dikarin gelek zaniyariyên kêrhatî raberî me bikin.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Serkanî

1) Roja Nû, hejmar: 27. Ev kovara ko bi kurdî û bi fransî du zimanan hatiye weşandin û di navbera salên 1943–1946 li Beyrûtê derketiye, çapa nû: Uppsala, 1986.
2) Heciyê Cindî, *Kilamêd Cimaeta Kurdaye Lîrîkiyê,* Erîvan, 1972, rûp. 39.
3) Ehmedê Xanî, *Mem Zîn,* Istenbol (werger: M. E. Bozarslan) 1975, rûp. 193, 108.
4) Heciyê Cindî, *Mesele û Xeberokêd Cimaeta Kurd, Erîvan,* 1985, rûp. 344.
5) M. U. Xamoyan, *Ferhenga kurdî-Rusiye Frazêologî,* Erîvan,1979, rûp. 160.
6) Nura Cewarî, *Stranê Kurdaye Cimaetiyê,* Erîvan, 1983, rûp. 128.
7) Nura Cewarî, rûp. 166.
8) Nura Cewarî, rûp. 137.
9) *Kürt Halk Türküleri (Kilam û Stranên Kurd),* Ankara, 1991, rûp. 178. Amadekar: Mehmet Bayrak).
10) Heciyê Cindî, rûp. 71.
11) Cigerxwîn, *Folklora Kurdî,* Stockholm, 1988, rûp. 133.
12) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, Zargotina Kurda, Moskov, 1978, cîlt : I, rûp. 373.
13) Heciyê Cindî, rûp. 110.
14) Celîlê Celîl, *Zargotina Kurdê Suriyê,* Erîvan, 1985, rûp. 241.
15) Cigerxwîn, rûp. 112.
16) Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe V,* rûp. 48.
17) Roja Nû, hejmar:18.
18) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (ev xebata Qanadê Kurdo berî mirina wî wek destnivîs hatiye amade kirin, hin çap nebûye.
19) Qanadê Kurdo, Beytêd Kurdî. Di nav vê xebata neçapbûyî de, Qanadê Kurdo çend destanên ko di nav Kurdên Îranê de belav bûne, qulibandiye zaravê kurmancî. Ji aliyê din çend destanên

zaravê kurmancî jî, yên wî xwe berev kirine, di nav vê destnivîsê de cih girtine).

20) Qanadê Kurdo, Beytêd Kurdî (destnivîs).
21) Mehmet Bayrak, rûp. 101.
22) Celîlê Celîl, rûp. 223.
23) Cigerxwîn, rûp. 116.
24) Cigerxwîn, rûp. 164.
25) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (destnivîs).
26) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (destnivîs)
27) Heciyê Cindî, rûp. 73.
28) Ferhat, *Govend – Kürtleri Türkülerinden Ö renmek,* Köln, 1990, rûp. 13.
29) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, *Zargotina Kurda,* cîlt I, rûp. 411.
30) Hawar, hejmar: 37.
31) Heciyê Cindî, rûp. 33.
32) Nura Cewarî, rûp. 145.
33) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (destnivîs).
34) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (destnivîs)
35) Hawar, hejmar: 38.
36) Cigerwxîn, 151.
37) Celîlê Celîl, rûp. 245.
38) Celîlê Celîl, rûp. 216.
39) Roja Nû, hejmar: 36.
40) Heciyê Cindî, rûp. 71.
41) Ji arşîva M. Ararat.
42) Segvan Abdulhekîm, *Mehmed Arîfê Cizirî kewê ribad e,* Stockholm, 1990, rûp. 30.
43) Roja Nû, hejmar: 56.
44) Nura Cewarî, rûp. 149.
45) Heciyê Cindî, rûp. 122.
46) Roja Nû, hejmar: 6.
47) Heciyê Cindî, rûp. 201.
48) Heciyê Cindî, rûp. 198.
49) Heciyê Cindî, rûp. 201.
50) Celîlê Celîl, rûp. 270.
51) Nura Cewarî, rûp. 128.
52) Roja Nû, hejmar: 55.

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

53) Ji arşîva M. Ararat.
54) Ji arşîva M. Ararat.
55) Roja Nû, hejmar: 27.
56) Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe III,* Stockholm, 1991, rûp. 45.
57) Roja Nû, hejmar: 55.
58) Heciyê Cindî, rûp. 115.
59) Roja Nû, hejmar: 45.
60) Heciyê Cindî, rûp. 115.
61) Zeynelabîdîn Zinar, *Xwençe II,* Stockholm, 1990, rûp. 109.
62) Heciyê Cindî, rûp. 30.
63) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (destnivîs)
64) Heciyê Cindî, rûp. 76
65) Heciyê Cindî, rûp. 47.
66) Hawar, hejmar: 6.
67) Heciyê Cindî, rûp. 108.
68) Cigerwxîn, rûp. 146.
69) Celîlê Celîl, rûp. 245.
70) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, cîlt I, rûp. 353.
71) Heciyê Cindî, rûp. 88.
72) Hawar, hejmar: 28.
73) Nura Cewarî, rûp. 162.
74) J. S. Musaelyan, *Zembîlfiroş – Destana Kurdî û Şaxên Wê,* Moskov, 1983, rûp. 138.
75) Mele Mehmûd Dêrşewî, *Mîştaxa Çiya – Ji Gotinên Pêşiya,* Stockholm,1989, rûp137.
76) Heciyê Cindî, rûp. 163.
77) Roja Nû, hejmar: 11.
78) Cigerxwîn, rûp. 147.
79) Roja Nû, hejmar: 57.
80) Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl, rûp. 411.
81) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (destnivîs)
82) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (destnivîs)
83) Qanadê Kurdo, *Beytêd Kurdî* (destnivîs)
84) Celîlê Celîl, rûp. 250.
85) Roja Nû, hejmar: 8.
86) Roja Nû, hejmar: 22.
87) Heciyê Cindî, rûp. 145.

88) Nura Cewarî, *Kilamêd Cimaeta Kurdaye Govendê,* Erîvan, 1964, rûp. 64.
89) Cemîla Celîl, *Stranê Cimaeta Kurda,* Erîvan, 1977, rûp. 34.
90) Heciyê Cindî, rûp. 41.
91) Celîlê Celîl, rûp. 255.

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Bîbliyografiyaya folklora kurdî

Di vê bîbliyografiyayê da 125 serkaniyên ko li ser folklora kurdî hatine weşandin, cih girtine.

— Abbas, Hilmi, *Altkurdiche Kampf und Liebeslieder,* München, 1964.
— Abdulhekîm, Segvan, *Mehmed Arifê Cizirî kewê ribad e,* Stockholm, 1990.
— Akreyî, Ezîz Reşîd, *Çîrok û Serhatiyên kurdî,* Den Haag, 1982.
— Aras, Ahmet, *Ker û Kulik -Mîtolojiya kurdî de Destanek,* Istenbol, 1993.
— Aras, Ahmet, *Siyabend û Xecê-Mîtolojiya Kurdî de Destaneke Evînî,* Izmîr,1993.
— Balî, A., *Gotinên Pêşiyan Ên Kurdî,* Istenbol,1993.
— Bayrak, Mehmet, *Kürt Halk Türküleri,* (Kilam û Stranên Kurdî), Ankara, 1991.
— Berz, Koyo, *Na Xumxum a,* Uppsala, 1989.
— Berz, Koyo, *Siyamend û Xecê* (şaxeke edebî), Stockholm, 1993.
— Blau, Joyce & Hakem, Helkewt, *Perles d'un collier,* Paris, 1981.
— Blau, Joyce, *Mémoire du Kurdistan,* Paris, 1984. (Rûpelên 15-100 ji nimûneyên folklora kurdî pêk hatiye.)
— Blau, Joyce, *Contes Kurdes,* Paris, 1986.
— Bois,Tomas, *Kurdische Volksdichtung,* Bonn, 1985.
— Bozarslan, M. Emîn, *Mîr Zoro-Meselokêd Lawiran I,* Borås, 1981.
— Bozarslan, M. Emîn, *Gurê Bilurvan-Meselokên Lawiran II,* Borås, 1982.
— Bozarslan, M. Emîn, *Kêz Xatûn-Meselokên Lawiran III,* Borås, 1982.
— Bozarslan, M. Emîn, *Serketina Mişkan-Meslokên Lawiran IV,* Uppsala, 1984.
— Bozarslan, M. Emîn, *Pepûk-Meselokên Lawiran V,* Uppsala, 1985.

— Bozarslan, M. Emîn, *Melayê Meşhûr -Pêkenokên Melayê Meşhûr,* Uppsala, 1986.
— Bozarslan, M. Emîn, *Masiyên Bejî* - Pêkenokên Gelî I, Uppsala, 1987.
— Bozarslan, M. Emîn, *Ji Dîna Dîntir* - Pêkenokên Gelî II, Uppsala, 1988.
— Bozarslan, M. Emîn, *Ilmê Tûrik* - Pêkenokên Gelî III, Uppsala, 1989
— Bozarslan, M. Emîn, B*ûka Gulsûn* - Pêkenokên Gelî IV, Uppsala, 1990.
— Bozarslan, M. Emîn, *Mela Kulî-Pêkenokên Gelî V,* Uppsala, 1991.
— Brunel, A., Gulusar, *Contes et legendes du Kurdistan,* Paris,1946.
— Cankurt, *Zembîlfiroş-Hozana Çîrokî Ya Bi Nav Deng Bi Derxistineke Nû,* Bonn, 1987.
— Celîl, Celîlê, *Zargotina Kurdê Surîaê,* Erîvan, 1985.
— Celîl, Cemîla, *Kilamêd Cimaeta Kurda,* Erîvan, 1964.
— Celîl, Cemîla, *Kilam û Miqamêd Cimeta Kurda I,* Moskov, 1973.
— Celîl, Cemîla, *Stranê Cimaeta Kurda,* Erîvan, 1977.
— Celîl, Cemîla, *Kilam û Miqamêd Cimeta Kurda II,* Moskov, 1986
— Celîl, Ordîxanê, *Dilokêd Cimaeta Kurda,* Erîvan, 1964.
— Celîl, Ordîxanê, *Destana kurdî Ya Mêrxasiyê »Xanê Lepzêrîn«,* Moskov, 1967.
— Celîl, Ordîxanê, *Mesele û Metelokêd Cimaeta Kurda I,* Erîvan, 1969.
— Celîl, Ordîxanê, *Mesele û Metelokêd Cimaeta Kurda II,* Erîvan, 1971.
— Celîl, Ordîxanê, *Stranê Zargotina Kurdaye Tarîqiyê,* Erîvan, 1975.
— Celîl, Ordîxanê & Celîl, Celîlê, *Mesele û Metelokêd Cimeta Kurda* (bi Rûsî), Moskov, 1972
— Celîl, Ordîxanê & Celîl, Celîlê, *Çîrokê Cimaeta Kurda,* Erîvan, 1974
— Celîl, Ordîxanê & Celîl, Celîlê, *Zargotina Kurda I–II,* Moskov, 1978.
— Celîl, Ordîxanê & Celîl, Celîlê, *Gulançikzêrîn* (Nimûneyên folklora Kurda), Erîvan, 1984.
— Celîl, Ordîxanê & Celîlê, Celîl & Celîl, Zîna, *Çîrok, Efsane û Rîvayetên Kurdî* (bi Rûsî), Moskov, 1989

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

— Celîl, Zîna & Alenis, A., *Çîrokên Kurdî Yên Gelî (bi zimanê Lîtvanî),* Bîlnus, 1977.
— Cewarî, Nura, *Kilamêd Kurdaye Govendê,* Erîvan, 1964.
— Cewarî, Nura, *Afirandariya Kurda Ya Stranên Gelî (bi Rûsî),* Erîvan, 1971.
— Cewarî, Nura, *Stranê Kurdaye Cimetiyê,* Erîvan, 1983.
— Chaliand, Gerard, *Poesie Populaire des Turcs et des Kurdes,* Paris, 1961.
— Cigerxwîn, *Folklora Kurdî,* Stockholm, 1988.
— Cigerxwîn, *Gotinê Pêşiya,* Şam, 1957.
— Cindî, Heciyê & Evdal, Emînê, *Folklora Kurmanca,* Erîvan, 1936.
— Cindî, Heciyê, *Hikyatêd Cimaeta Kurdîê,* kitêba I, Erîvan, 1961.
— Cindî, Heciyê, *Hikyatêd Cimaeta Kurdîê,* kitêba II, Erîvan, 1962.
— Cindî, Heciyê, *Stran û Çîrokêd kurdî Yên Epîkî,* Moskov, 1962.
— Cindî, Heciyê, *Hikyatêd Cimaeta Kurdîê,* kitêba III, Erîvan, 1969.
— Cindî, Heciyê, *Kilamêd Cimaeta Kurdaye Lîrîkiyê,* Erîvan, 1972.
— Cindî, Heciyê, *Şaxêd Eposa »Rostemê Zale« Kurdî* (bi Rûsî), Erîvan, 1977.
— Cindî, Heciyê, *Hikyatêd Cimaeta Kurdîê,* kitêba IV, Erîvan, 1980.
— Cindî, Heciyê, *Mesele û Xeberokêd Cimaeta Kurda,* Erîvan, 1985.
— Cindî, Heciyê, *Hikyatêd Cimaeta Kurdiê,* kitêba V, Erîvan, 1986.
— Çem, Mûnzûr, *Tayê Kìlamê Dêrsimi,* Stockholm, 1993.
— Deniz, Huseyin, *Gotnê Pêşyê Kurda,* Istenbol, 1991.
— *Der Löwe des Daroghas und andere kurdische Fabeln* (Ji aliyê Kurdê Awusturyê bi Almanî hatiye weşandin), St.Polten & Wîen, 1992.
— Dêrşewî, *Mele Mehmûd, Mîştaxa Çiya ji Gotinên Pêşiya,* Stockholm, 1989.
— *Destana Memê Alan,* Istenbol, 1978.
— Dijwar, Egîd, *Yekitiya Çûkan- Çîrokên kurdî,* Stockholm, 1990.
— Düzgün, Mustafa, *Dersim Türküleri,* Enqere, 1992.
— Erdem, Hüseyin, *Siyabend û Xecê* (Almanî û Tirkî), Essen, 1985.
— Evdal, Emînê, *Memê û Zînê,* Erîvan, 1958.
— Farizof, I. & Rudenko, M., *Çîroken Kurdî* (bi Rûsî), Moskov, 1959.
— Ferhat, *Govend - Kürtleri Türkülerinden Öğrenmek* (bi Tirkî û Almanî), Köln, 1990.

— Fettahî Qazî, Qadirî, *Mehr û Wefa,* Tebrîz, 1966.
— Fettahî Qazî, Qadirî, *Şêx Senan,* Tebrîz, 1967.
— Fettahî Qazî, Qadirî, *Behram û Gulendam,* Tebrîz, 1968.
— Fettahî Qazî, Qadirî, *Şor Mehmûd û Merzingan,* Tebrîz, 1969.
— Fettahî Qazî, Qadirî, *Şêx Ferx û Xatûn Astî,* Tebrîz, 1972.
— Fattahî Qazî, Qadirî, *Seid û Mîr Seyfuddin Beg,* Tebrîz, 1976.
— Fattahî Qazî, Qadirî, *Amsal va Hekam-e Kurdî,* Tebrîz, 1985.
— Helimoğlu, Muhsine, *Cigaramın Üstünde Bir Topal Karınca,* Ankara, 1992. (Piraniya van çîrokan li gelek herêm û deverên Kurdistanê hatine berev kirin).
— Heqî şeweys, Ismail, *Qise-î Pêşînan,* Bexda, 1933.
— Hugo, Makas, *Kurdische Texte im Kurmanci- Dialekte aus der Gegend von Mardin,* Leningrad, 1926.
— Kurdo, Qanadê, *Beytêd Kurdî* (destnivîs e).
— Lerx, Peter, *Forschungen über die Kurden und die iranischen Nordchaldäer I-II,* St.Petersburg, 1857-1858.
— Le Coq, *Albert von, Kurdische Texte,* Berlin, 1903
— Lescot, Roger, *Textes Kurdes I-II,* Paris-Beyrut, 1940-1942.
— Lescot, Roger, *Çîrokên Kurdî,* Stockholm, 1987.
— Levendî, Mahmûd, *Mala Xwedê* (Pêkenîn), Stockholm, 1992.
— Mackenzie, D. N., *Kurdish Dialect Studies II (tekstên folklorîk),* London, 1962.
— Malmîsanij, *Folklorê Ma Ra Çend Numûney,* Uppsala, 1991.
— *Mam und Zin* - Kurdiches Volksepos in der Fassung von Roger Lescot und L. Ch.Wentzel, Zurich, 1980.
— Mann, Oskar, *Kurdische-persische Forschungen,* Abt. IV: Die Mundart der Mukri Kurden I-II, Berlin, 1906-1909.
— *Mem and Zin, Kurdistan's national epic,* Amsterdam, 1968.
— *Mem och Zin,* Helsingfors, 1980.
— Metê, Hesenê, *Ardû* (kurteçîrokên gelêrî), Stockholm, 1990.
— Mihotulî, Selahaddîn, *Çîrokên Kurdan,* Istenbol, 1991.
— Mokri, Mohammed, *Guranî ya Taranahaya Kordî,* Tehran, 1951.
— Mokrî, Mohammed, *La Legende de Bizan-û Manija,* Paris, 1966.
— Musaelyan, J. S., *Stranên Kurdî Yên Gelerî* (bi Rûsî), Moskov, 1985.
— Musaelyan, J. S., *Zembîlfiroş-Poema kurdî û şaxên wê Yên Edebî û Folklorîk,* Moskov, 1983.

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

— Nebez, Cemal, *Sprichwörter und Redensarten aus Kurdistan,* München, 1970.
— Nebez, Cemal, *Kurdishe Märchen und Volkserzählungen,* München, 1972.
— Orbelî, I. A., *Li Muksiyê Jîyîn û Folklor* (bi rûsî), Moskov, 1982.
— Paul-Marguerite, Lucy & Bedirxan, Kamuran, *Proverbes Kurdes,* Paris, 1936.
— Pîremerd, *Diwanzde Siyarê Meriwan,* Suleymaniye,1935.
— Prym, E. & Socin, A., *Kurdische Sammlungen,* St. Petersburg I-II, 1887-1890.
— Resûl, Îzettîn Mustafa, *Edeb-î Folklorî Kurdî,* Bexda,1970.
— Resûl Îbrahîm, Şukriye, *Pendî Pêşîniyan û Qisey Nesteqî Kurdî Nawerokî Fikrî-w-Edebî,* Bexda,1984.
— Reş, Konê, *Ji Zargotina Kurdî- Serpêhatiyên Mîran,* Beyrût, 1991.
— Rudenko, M. B., *Çîrokên Kurdî Yên Gelî* (bi Rûsî), Moskov, 1970.
— Rudenko, M. B., *Poeziya Kurdî Ya şînê (bi Rûsî),* Moskov, 1982.
— Rudenko, M. B., *Şaxên Edebî û Folklorîk Yên Poema kurdî »Yusif û Zelêxa«* (bi Rûsî), Moskov, 1986.
— Sabar, Yona, *The Folk Literature of the Kurdistani Jews,* Michigan, 1992
— Sarbajêrî, U., *Gewherê Goraniyekanî Hesen Zîrek*, Bexda, 1981.
— Secadî, Aladîn, *Riştey Mirwarî I-XIII,* Bexda, 1956–1983.
— Soane, E. & Nikitin, B., *Çîroka Suto û Tato* (çapeke teze, bi kurdî û Ingîlîzî), London, 1988 .
— Şemo, Erebê, *Die drei Glatzköpfe-Kurdische Volks-märchen,* Berlin, 1977.
— Tîgrîs, Amed & Motkî, Roman, *Ken û Girîn* (Pêkenîn), Stockholm, 1989.
— Xal, M., *Pend-î Pêşînan,* Bexda,1957.
— Yavuz, Muhsine Helimoğlu, *Diyarbakır Efsaneleri,* Istanbul, 1993. Herdu cild bi hevra (cild I:1989, cild II: 1990).
— Wentzel, Luise Charlotte, *Kurdische Märchen,* Düsseldorf, 1978.
— Wikander, Stik, *Recueil de textes kourmandji,* Uppsala, 1958.
— Zaza, Nureddine, *Contes et poemes Kurdes,* 1974.
— Zinar, Zeynelabidîn, *Xwençe I* (Gotinên Pêşiyan, Kilam-Dilok û Çîrok), Stockholm, 1989.

— Zinar, Zeynelabidîn, *Xwençe II* (Kilam-Dilok û Çîrok),
— Stockholm, 1990.
— Zinar, Zeynelabidîn, *Xwençe III* (Kilam, Meselok û Çîrok),Stockholm, 1991.
— Zinar, Zeynelabidîn, *Xwençe IV* (Kilam, Lawija Mesîh, Meselok û Çîrok), Stockholm, 1990.
— Zinar, Zeynelabidîn, *Xwençe V* (Kilam, Serpêhatî, Meselok û Çîrok), Stockholm, 1991.
— Zinar, Zeynelabidîn, *Xecê û Siyabend* (şaxeke edebî), Stockholm, 1992.
— Zinar, Zeynelabidîn, *Xwençe VI* (Kilam, Serpêhatî, Meselok û çîrok), Stockholm, 1993.

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**